



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Beşezanista Bingehîn a Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

ROJNAMEYA KURDISTANÊ 1898-1902

ANALÎZA NAVEROKÊ

AHMET KAN

10711018

Mardîn 2018

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Beşezanista Bingehîn a Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

ROJNAMEYA KURDISTANÊ 1898-1902

ANALÎZA NAVEROKÊ

AHMET KAN

10711018

Şêwirmend:

Endamê Hindekarîyê Dr. MUSTAFA ASLAN

Mardîn 2018

TEAHUDNAME

JI RÊVEBERÎYA ENSTÎTUYA ZIMANÊNZINDÎ YÊN TIRKÎYEYÊ RE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Rojnameya Kurdistanê 1898-1902 Analîza Naverokê” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☐ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

☐ Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

....../....../.....

Ahmet KAN

KABUL VE ONAY

Ahmet KAN tarafından hazırlanan “**Rojnameya Kurdistanê 1892-1902: Analîza Naverokê**” adındaki çalışma 05/10/2018 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Bilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

[Doç. Dr. Hayrullah ACAR] (Başkan)

[Dr. Öğretim Üyesi Osman ASLANOĞLU] (Üye)

[Dr. Öğretim Üyesi Mustafa ASLAN] (Üye)

PÊŞGOTIN

Di dîroka civatan de rola perwede û zanîne ciheke girîng digire. Perwerde û zanîna civakî bi gelemperî di dibistanan de tê dayîn. Di hin deman de zanîna ji dibistanan hatiye bi dest xistin bi rêya çapemeniyê bo civatê tê pêşkêş kirin. Bo vê rolê li Ewropayê meriv kare mînakî ronesansa ku di sedsalên 15-16. de pêk hatiye bide. Ev rewşenbîrî pêl bi pêl li hemû cîhanê belav bûye.

Di sedsala 19. de rêveberên Împaratoriya Osmanî hewil didin ku ji metodên nûjen bo birêvebirina civatê sûd werbigirin. Lê li aliyê dinê bo entegrasyona mîrekîtiyê herêmî bêtir bi otorîteya navendî ve girê bidin û vê otorîteyê xurttir bikin hewildidin. Di vê sedsalê de Mîr Bedîrxan û malbata wî sirgûnê Girîdê dikan. Damezranerê Rojnameya Kurdistanê Mîqdad Mîdhet Bedîrxan li wirê tê dinê. Piştî perwedeheke xurt a wê serdemê ew dest bi weşandina Rojnameya Kurdistanê dike.

Rojnameya Kurdistanê rojnameya yekem bi zimanê kurdî ye. Dema meriv li ser rojnamegerîya kurdî xebatek bike divê ji vê rojnameyê dest bi xebata xwe bike. Bêyî liberçavangirtina vê rojnameyê dê her xebat kêr bimîne. Me jî bi vê ferasetê dest bi xebata li ser rojnameya Kurdistanê kir.

Rojnameya Kurdistanê li derveyê welat dest bi weşanê kiriye. Bi tevayî 31 hejmar weşîyaye. Siltan Evdilhemîd û rêveberên wê serdemê astengiyên mezin li hember rojnameyê derxistine, nehîştine were nava welat. Ji ber van astengiyan di nava çar salan de bes 31 hejmar karîbiye were weşandin. Ew jî ji ber van astengiyan ketiye destê kêr kesan.

Heta 1972yan ku di wê salê de 26 hejmarên wê li Bexdayê wek çapa duyem têne çapkirin, xwendevanên kurd jê mehrûm mane. Paşê çar hejmarên wê jî li cihên cuda cuda hatine peyda kirin. Bi tevî gelek lêgerînan jî hê hejmara 19. wendaye. Me di serdema xebata xwe de gelek hewil da ku em vê hejmarê jî peyda bikin, lê em bi ser neketin. Em hêvî dikin ku rojek ev hejmar jî bê dîtin.

Me çapa van sih hejmarên wê yên li ber destê me ne, li mala Sinemxana keça Celadet Bedîrxan dît. Me vê çapa sêyem a ku di 2006an de li Tehranê, ji aliyê Dezgeha Çap û Belavkirinê ya Bedîrxaniyan ve hatibû çapkirin, peyda kir.

Em ji ber ku teza me xwend û pêşniyazên xwe bi me re parvekirin ji şêwirmendê xwe Dr. Mustafa Aslanî re, bo xwendin, nirxandina wan ji Doç. Dr. Osman Aslanoglu û Mamoste Mamlmîsanijî re û bo keda Dr. Mehmed Rêzan Ekinciî ya di transkrîbsîyona beşa tirkîya osmanî de spas dîkin.

Ahmet KAN

Mardîn 2018



KURTE

Rojnameya Kurdistanê, di 22ê Nîsana 1898an de, li Misrê, ji aliyê Mîqdad Mîdhet Bedirxan ve hatiye amadekirin û weşandin. Ev rojname yekemîn rojnameya bi zimanê kurdî ye; xwedî û weşangerê wê jî yekem rojnamegerê kurdî ye. Ji ber vê taybetmendîya rojnameyê, him bala rayedarên osmanî, him jî bala xwendevanên kurdî kişandiye.

Pênc hejmarên ku Mîqdad Mîdhet diweşîne, ji bilî du daxwaznameyên ku di jimarên 4 û 5an de ne, hemû bi zimanê kurdî ne. Ji hejmara 6an heta 31an, 26 hejmar ji aliyê Evdirehman Bedirxan ve hatine amadekirin û weşandin. Ev hejmarên ku Evdirehman Bedirxan weşandîne, bêtir bi mijarên sîyasî yên serdemê re eleqedar in. Ji ber vê taybetîyê jî her ku diçe di rojnameyê de zimanê tirkî ji kurdî zêdetir dibe.

Ev rojname bûye destpêka çapemenîya kurdî. Heta vê serdemê hemû nivîsên kurdî, çi helbest çi pexşan bi destxetan dihatin amadekirin. Wek mînak cara pêşîn beş bi beş Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî têne weşandin. Bi rêya rojnameya Kurdistanê pexşanên çapkirî yên dîrok û edebiyata kurdî digihîjin ber destê kurdan. Ji ber van taybetîyan em ê li ser şêkl û naverok û girîngîya rojnameyê bisekinin.

Me di beşa yekem de, armanca xebatê û girîngîya lêkolîna li ser rojnameyê; rêbaza lêkolînê û çavkaniyên hatine bikaranîn; çarçoveya lêkolînê û pirsgrêkên ku em pê re rûbirû bûne nivîsî. Di beşa duyem de jî me xebatên ku heta niha hatine kirin nirxand.

Di beşa sêyem de em li ser dîroka rojnameyê û kurtejiyana Mîqdad Midhet Bedirxan û Evdirehman Bedirxan rawestîyan. Me di beşa çarem de hewilda ku em yek bi yek hemû hejmarên rojnameyê li ser hev bi tevayî binirxînin, daku pêvajoya rojnameyê ji serî heta dawîyê di kîjan şert û mercan de bihurîye û guherîye baştir bê

dîtin. Di beşa pêncem de jî me bi hurgilî mijarên sereke yê ku rojnameyê hilbijartîye, analîz kir.

Peyvên Sereke:

Rojname, Kurdistan, M. Mîdhet Bedirxan, Evdîrehman Bedirxan, çapemenî, zimanê kurdî, tirkîya Osmanî.



ÖZET

Kürdistan Gazetesi, 22 Nisan 1898’de, Mısır’ın başkenti Kahire’de yayın hayatına başladı. Gazete Mikdat Mithet Bedirhan tarafından hazırlanıp yayınlanmıştır. Bu gazete, Kürtçe olarak çıkan ilk gazete olduğundan sahibi ve yayına hazırlayan olarak Mikdat Mithet Bedirhan ilk Kürt gazetecisi olmuştur. Gazete bu ilk olma özelliğiyle hem olumlu hem olumsuz tepkiler almıştır. Olumlu tepkileri Kürt okurlarından, olumsuz tepkileri de Osmanlı Yönetiminden almıştır. Mikdat Midhet Bedirhan’ın çıkardığı ilk beş sayı, dördüncü ve beşinci sayıda Sultan Abdülhamit’e yazılan iki dilekçenin dışında, tamamen Kürtçe olarak yayınlanmıştır.

Gazetenin altıncı sayısından otuz birinci sayısına kadar olan 26 sayısı da Abdürrahman Bedirhan tarafından hazırlanıp yayınlanmıştır. Abdürrahman Bedirhan’ın hazırlayıp yayınladığı gazetenin bu sayılarında, daha çok dönemin siyasi konularına yer verilmiştir. Siyasi dilin Osmanlı Türkçesi olmasından dolayı, Kürdistan Gazetesi Kürtçe dilinden çok Osmanlı Türkçesiyle çıkmıştır.

Kürdistan Gazetesi, Kürt basını için başlangıç noktası olmuştur. Bu tarihe kadar Kürtçe yazılar, ister şiir ister düz yazı olsun hep elle yazılırdı. Örneğin Ehmedê Xanî’nin Mem û Zîn’i ve Şerefhanê Bedlîsî’nin Şerefnamesi ilk defa bölümler halinde bu gazetede yayınlanmıştır. Kürdistan Gazetesi sayesinde Kürt edebiyatının ve Kürt tarihinin basılı eserleri Kürt Okurlarıyla buluşuyor. Bu özelliklerinden dolayı gazeteyi biçim, içerik ve arzettiği önem açısından inceleyeceğiz.

Çalışmamızın ilk bölümünde, araştırmanın amacı ve önemi, araştırmamızın teknikleri ve kullanılan kaynaklar ile araştırma çerçevesi ve karşılaşılan sorunlar ele alınmıştır. İkinci bölümde ise, bugüne kadar Kürdistan Gazetesi üzerine yapılan çalışmalar değerlendirilmiştir

Üçüncü bölümde ise, Kürdistan Gazetesinin tarihçesiyle Mikdat Mithat Bedirhan ile Abdürrahman Bedirhan'ın yaşamöyküleri çok yönlü olarak ele alınmıştır. Dördüncü bölümde, gazetenin bütün sayılarını, yaşanan süreci ve meydana gelen değişiklikleri daha iyi tahlil etmek için tek tek ele aldık. Beşinci bölümde de gazetenin ele aldığı önemli konuları detaylı bir şekilde analiz ettik.

Anahtar Kelimeler:

Kürdistan, gazete, Kürt, Kürtçe, Mikdat Midhet Bedirhan, Abdürrahman Bedirhan, Osmanlı Türkçesi, basın



ABSTRACT

The Kurdistan Newspaper was launched on April 22, 1898, in Cairo, the capital of Egypt. The newspaper was prepared and published by Mikdat Mithet Bedirhan. As this newspaper is the first newspaper to be published in Kurdish, Mikdat Mithet Bedirhan is the first Kurdish journalist to be the owner and publisher. The newspaper has received both positive and negative reactions with this first feature. It received positive reactions from Kurdish readers and negative reactions from Ottoman rule. The first five issues of Mikdat Midhet Bedirhan were published in Kurdish, except for the two petitions written to Sultan Abdulhamit on the fourth and fifth issues.

26 issues from the sixth one to the thirty-first one were prepared and published by Abdurrahman Bedirhan. Those issues published by Abdurrahman Bedirhan included mostly political issues of the period. Since the political language was Ottoman Turkish, the Kurdistan Newspaper was published in Ottoman Turkish rather than Kurdish.

Kurdistan Newspaper became the starting point for the Kurdish press. Until this date, Kurdish writings, whether poetry or prose text, were always written by hand. Ehmedê Xanî's *Mem û Zîn* of and Şerefxanê Bedlîsî's *Şerefname* have been published in this newspaper for the first time. Thanks to the Kurdistan Newspaper, Kurdish literature and Kurdish printed works of Kurdish history met Kurdish readers. Due to these characteristics, we will examine the newspaper in terms of form, content and importance.

In the first part of our study, the aim and the importance of the research, the techniques of our research and the resources used, the research framework and the

problems encountered were discussed. In the second chapter, the studies on the Kurdistan newspaper were evaluated.

In the third chapter Mikdat Mithat Bedirhan and Abdurrahman Bedirhan's biographies were examined in a few aspects. In the fourth chapter, I discussed all the issues of the newspaper one by one in order to better analyze the process and the changes took place. In the fifth chapter, I analyzed in detail the important issues discussed by the newspaper.

Key Words:

Kurdistan, newspaper, Kurd, Kurdish, Mikdat Midhet Bedirhan, Abdurrahman Bedirhan, Ottoman Turkish, press

NAVEROK

TEAHUDNAME.....	ii
KABUL VE ONAY	iii
PÊŞGOTIN	iv
KURTE.....	vi
ÖZET.....	viii
ABSTRACT	x
LÎSTEYA TABLOYAN	xv
LÎSTEYA ŞEKILAN	xvi
KURTEBÊJE	xvii
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM: MIJAR, ARMANC, RÊBAZ, ÇARÇOVE	7
1. MIJARA LÊKOLÎNÊ	7
2. ARMANCA LÊKOLÎNÊ:.....	7
3. RÊBAZA LÊKOLÎNÊ	8
4. ÇARÇOVE Û PIRSGIRÊKÊN LÊKOLÎNÊ	9
BEŞA DUYEM XEBATÊN LI SER ROJNAMEYA KURDISTANÊ	10
BEŞA SÊYEM DÎROKA ROJNAMEYÊ	14
1. KURTEJYANA MÎQDAD MÎDHET BEDIRXAN (1858-1915).....	15
2. KURTEJYANA EVDIREHMAN BEDIRXAN (1868-1936).....	19
BEŞA ÇAREM ANALÎZA HEMÛ HEJMARAN.....	22
1. TEORIYA ANALÎZÊ	22
2. NAVEROKA HEJMARA YEKEM	24
3. NAVEROKA HEJMARA DUYEM	27

4. NAVEROKA HEJMARA SÊYEM	29
5. NAVEROKA HEJMARA ÇAREM	32
6. NAVEROKA HEJMARA PÊNCÊMÎN	35
7. NAVEROKA HEJMARA ŞEŞEM.....	36
8. NAVEROKA HEJMARA HEFTEM.....	38
9. NAVEROKA HEJMARA HEŞTEM.....	39
10.NAVEROKA HEJMARA NEHEM	40
11.NAVEROKA HEJMARA DEHEM	41
12. NAVEROKA HEJMARA YAZDEHEM	43
13.NAVEROKA HEJMARA DIWAZDEHEM	45
14.NAVEROKA HEJMARA SÊZDEHEM	47
15.NAVEROKA HEJMARA ÇARDEHEM	48
16.NAVEROKA HEJMARA PAZDEHEM	50
17.NAVEROKA HEJMARA ŞAZDEHEM	51
18.NAVEROKA HEJMARA HEVDEHEM	52
19.NAVEROKA HEJMARA HEJDEHEM.....	54
20.NAVEROKA HEJMARA NOZDEHAN	55
21.NAVEROKA HEJMARA BÎSTEM.....	55
22.NAVEROKA HEJMARA BÎST Û YEKEM	58
23.NAVEROKA HEJMARA BÎST Û DUYEM	59
24.NAVEROKA HEJMARA BÎST Û SÊYEM.....	61
25.NAVEROKA HEJMARA BÎST Û ÇAREM	61
26.NAVEROKA HEJMARA BÎST Û PÊNCÊM	63
27. NAVEROKA HEJMARA BÎST Û ŞEŞEM	66
28.NAVEROKA HEJMARA BÎST Û HEFTEM	69
29. NAVEROKA HEJMARA BÎST Û HEŞTEM	72

30. NAVEROKA HEJMARA BÎST Û NEHEM	74
31. NAVEROKA HEJMARA SIHEM	76
32. NAVEROKA HEJMARA SIH Û YEKEM	78
BEŞA PÊNCHE MIJARÊN SEREKE YÊN ROJNAMEYÊ	82
1. ZIMAN Û WÊJE	82
2. PERWERDE	83
3. TÊGIHÎŞTINA KURDISTANÊ	85
4. DÎROKA KURDISTANÊ	86
5. DAXWAZÊN JI SILTAN EVDILHEMÎDÊ DUYEM	88
6. TÊKILIYÊN KURD Û ERMEYAN DI ROJNAMEYA KURDISTANÊ DE	90
7. TÊKILIYÊN EVDIREHMAN BEDIRXANÊ XWEDIYÊ ROJNAMEYÊ Û CEMİYETA ÎTÎHAD Û TERAKIYÊ	97
ENCAM	100
ÇAVKANÎ	102
PÊVEK-I	108
PÊVEK-II	110
PÊVEK-III	121
ÎNTÎHAL RAPORU	129

LÎSTEYA TABLOYAN

I. Agahîyên Weşana Rojnameyê	108
------------------------------------	-----



LÎSTEYA ŞEKILAN

I. Tirkîya Osmanî bi tîpên ‘erebî	111
---	-----



KURTEBÊJE

K.T.	Komara Tirkiyeyê
Bnr.	Binêre
CÎT	Cemîyeta Îttîhad û Terakîyê
h.b.	Heman berhem
r.	Rûpel



DESTPÊK

Xebata me li ser rojnameya pêşîn a bi kurdî ye. Wek hemû rojnameyên cîhanê, Rojnameya Kurdistanê jî piştî pêvajoyek dûr û dirêj a di qada çapemeniyê de karibîye der keve pêşberî xwendevanan. Bo ku baştir mijar bê famkirinê pêwîst e em bi gelemperî li ser dîroka çapxane, çapemenî û rojnamegerîyê hin agahiyan bidin.

Gelo dema ku Mîqdad Mîdhet Bedixan dest bi weşana rojnameyê dike, atmosfera welêt û ya cîhanê çawa ye? Li gor rewşa ku em li virê dibînin, em dikarin bibêjin ku rojnameya kurdî bi sed salan piştî rojnameyên cîhanê derketîye holê.¹ Bi kurtî meriv kare bibêje ku derengmayîna derketina rojnameya kurdî girêdayê bi gelek mercan ve ye.² Wek pêşketina teknîkî û hin îcadan. Her îcadek jî ji hin pêwîstîyan derdikeve holê. Wek mînak heta îcada nivîsê çênebûya dê rojname jî derneketana. Nivîs di destpêkê de ji bo pêwîstîya hev agahdarkirinê wek wêne li Misrê dertê holê. Piştê nivîsê kaxiz, piştê îcada kaxiz îcada çapxaneyê jî çênebûya dîsa rojname dernediket. Çapxane di 1440an de li Almanyayê ji aliyê Johann Gutenberg ve hat îcad kirin.³ Rojnameya pêşîn jî nêzî du sed salan piştî îcada çapxaneyê li Almanyayê di sala 1609an de bi navê *Avisa, Relation oder Zeitung* derket.⁴ Dîsa li Almanyayê li bajarê Kolnê, di 1610an de bi navê *Wurdige Zeitung* rojnameyek derket. Piştî Almanyayê li Holandayê, di 1619an de bi navê *Nieuwe Tijdinghe* rojnameyek derket.

Li Birîtanyayê (London) rojnameya pêşîn bi Îngilîzî di sala 1622yan de bi navê *The Weekly News From Italy and Germany* derket. Li Fransayê di sala 1631an de, rojnameyek bi navê *La Gazette* ji aliyê Théophraste Renaudot ve tê derxistin ku wek rojnameya pêşîn a xwedî taybetîyên rojnameyên îroyîn tê qebûl kirin. Li Îtalyayê (Roma) rojnameya pêşîn di sala 1640an de, bi navê *Gazeta Pubblica*

¹ Fetullah Kaya, Kürt Basını/Çapemeniya Kurd, Hivda, Stenbol Sibet 2010 (r.13)

² Amir Hasanpour, Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil, Avesta 2005 (r. 275)

³ Li gor Emîr Hasanpour cara pêşîn di sedsala duyem de, li Çînê çapxane hatiye îcadkirin. Bnr (r. 276)

⁴ Felat Dilgeş, Rojnameya Kurdî ya Herî Pêşîn KURDISTAN, Weşana Nûbiharê, Çapa 2. Stenbol 2017 (r.14)

derketîye. Li Polonyayê jî di sala 1661an de rojnameya pêşîn dertê. Li Amerîkayê rojnameya pêşîn nêzikê sed sal piştî Almanyayê di sala 1704an de dest bi weşanê kir.

Împaratorîya Osmanî wek gelek kar û barên nûjen yên din li hember bikaranîna çapxaneyê jî gelek astengiyan derxistiye. Cara pêşîn rojnameyek bi navê *Takwîm-î Waqayî* di 1831an de, wek rojnameyek fermî ji aliyê dewletê ve hatiye derxistin. Piştî wê di sala 1840an de, ji aliyê William Churcîlê (?-1864) ku hemwelatîyê Birîtanyayê ye, ve *Cerîde-î Hawadîs* tê derxistin û di şerê Kirimê (1854) de ku di navbera Dewleta Osmanî û Dewleta Rûsî de ye, cara pêşîn rojnamevaniya qada şer pêk tîne. Di sala 1860an de, ji aliyê Agah Efendî (1832-1885) ve *Tercuman-î Ahwal* hatiye derxistin ku wek rojnameya pêşîn a ji aliyê kesên ne fermî, bi tirkî hatiye weşandin, tê qebûlkirin. Meriv kare bibêje ku Ermenîyan berî tirkî dest bi weşandina rojnameyan kirine. Wek mînak di sala 1839an de, li Îzmîrê rojnameyek bi navê *Şafak* bi zimanê ermenî derdixin.⁵ Rûman di sala 1866an de bi navê *Anatolî* û Cihûyan jî bi navê *Şerqîye* di sala 1867an de rojname derxistine.

Lê belê kurdan ji aliyê bi cihkirina zanîn û berhemên wek rojnameyan ji van kêmteweyên xeyrêmislim derengtir dest bi derxistina rojnameyê kirine. Rola Mamoste û zanayê kurd Hecî Qadirê Koyî (1815-1897) di derxistina rojnameya Kurdistanê de girîng e. Ji ber vê divê em bi kurtahî hin agahîyan li ser jîyana wî bidin.

Di serdema ku Rojnameya Kurdistanê dest bi weşanê dike de rûmeta rojnameyan gelek zêde dibe. Hecî Qadirê Koyî yê ku di gelek çavkanîyan⁶ de wek mamosteyê zarokên malbata Bedirxaniyan⁷ yên wek Mîqdad Mîdhet Bedirxan û Evdirehman Bedirxan û hwd. tê nîşandan, zêde li ser girîngiya rojnameyan rawestiyaye.

⁵ Çavkanîya ku Felat Dilgeş nîşan daye ev e: “Sonyel, Salahi R., Minorities And The Destruction Of The Ottoman Empire. Turkish Historical Printing House Ankara 1993. r. 204” Kurdistan (r.16)

⁶ 1-Abbas Vali, Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri/Kokên Neteweperwerîya Kurd, werger: Fahriye Adsay, Ümit Aydoğmuş, Sema Kılıç, Avesta, Stenbol 2005 (r.71-74-75); 2-Dîwana Hecî Qadirê Koyî amadekar: Serdar Hemîd û Kerîm Mistefa Şareza, Întîşaratê Kurdistan, Senendic 1390(1974) (r.23); 3-Kadri Yıldırım, Xaniyê Duyem Hecî Qadirê Koyî, Weşanxaneya Avesta, Stenbol 2016 (r.10-16-55-56-62), Kemal Burkay, Kürtler ve Kürdistan, Weşanên Dengê, Çapa 5. Stenbol 2011 (r 210)

⁷ Ömer Faruk Yekdeş ve Servet Erdem, *Tanzimat ve Edebiyat, Osmanlı İstanbulu'nda Modern Edebi Kültür*, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul 2014 (r. 348)

Meriv kare bibêje bandora Hecî Qadirê Koyî li ser derxistina rojnameya Kurdistanê çê bûye. Ji gelek çavkaniyan û ji dîwana wî em fam dikin ku gelek mînakên rojnameyê ku pesnê zanîn û xwendinê didin ji ber fikrên Koyî hatine girtin.

Hecî Qadirê Koyî⁸ di sala 1815an de li Başûrê Kurdistanê, li gundê Gorqerecê yê bajarê Koyê hatiye dinê. Li medreseyan Kurdistanê perwerde dibîne. Ji ber ku Hecî zêde li pey zanînê geriyaye di dawîyê de, sala 1864an berê xwe dide Stenbola ku bûye navenda zanyarên serdema Osmanî. Li wê derê Mem û Zîna Ehmedê Xanî û berhemên wî yên bi ramanên neteweyî dagirtî dixwîne.

Di hejmara sêyem a Rojnameya Kurdistanê de behsa mirina wî ya salek berê (1897) tê kirin. Heft malikên ku Koyî ji helbestek xwe li ser destxeta Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi destê xwe nivîsiye hatine weşandin. Di kovara Hawarê de, hejmara 33yan de, di bin sernavê “Klasîkên Me” de Celadet Bedirxan, vê helbestê nivîsiye û gotîye ku ev li ser ‘Memozîna bavê min’ a destxetê ji aliyê Koyî ve hatibû nivîsîn.⁹ Ji xwe em dibînin ku di hejmara duyem a Rojnameya Kurdistanê de, hin bi hin dest bi çapkirina Mem û Zîna Ehmedê Xanî tê kirin.

Di dema ku Rojnameya Kurdistanê der ketiye de, hemû cihan di bin bandora ramanên nû de ye. Li welatên wek Kurdistanê ku bi piranî di bin desthilatdariya Dewleta Osmanî de bûn, hêdî hêdî hestên neteweperwer û welatperweriyê bi pêş dikevin. Rojnameya Kurdistanê jî ji aliyê kurdên ku xwediye van hestan e ve dihête weşandin. Rojnameya Kurdistanê, di sala 1898an de roja 22yê Nîsanê li paytexta Misirê, li Qahîreyê, ji aliyê Mîqdad Mîdhet Bedirxan ve tê amadekirin û dest bi weşanê dike. Rojnameya Kurdistanê di çanda nivîskî ya kurdî de wek nîşana destpêka rojnamegeriya kurdî hatîye nîrxandin.¹⁰

Rojnameya Kurdistanê, li gor pîvanên îroyîn ne wek rojnameyeke rojane ye, ji hêla dirêjîya demê ve bêtir dişibe demeke dirêj a derxistina kovarek ku ji panzdeh

⁸ Hacı Qadirî Koyî, Dîwan, edt. Arif Zêrevan, weş. Nefel, Sweden, 2004, (r. 85), çapa dijital: http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/haci_qadire_koyi_diwan_02.pdf?NR:79, 16.12.2013.

⁹ Hawar berg 2. Weşanên Nûdem, Stockholm 1998 (r.817)

¹⁰ Malmîsanij, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan'ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, Vate, İstanbul 2011 (r. 11)

rojan carekî dertê. Rojnameyên wê serdemê bi piranî rojane derneketine. Di serdema Osmanî de bêjeya “cerîde” bi maneya rojname hatîye bikaranîn. Wek mînak di wê serdemê de ji aliyê Cemîyeta Îtîhada Osmanî ve bi rêveberîya du kurdan, Dr. Îshak Sikûtî û Dr. Evdîla Cewdet, bi navê cerîdeya Osmanî rojnameyek (1897-1904)¹¹ dihat weşandin. Ew jî wek Kurdistanê rojane dernediket lê xwe bi navê “Cerîdeya Osmanî” bi nav dikir. Peywendîya vê rojnameyê bi rojnameya Kurdistanê re hebû.

Ev dema dîyarkirî ku wek pazde rojan hatibû nivîsîn jî pirê caran têk çûye, hin caran ji şeş mehan zêdetir dem ketiye navbera du hejmarên li pey hev. Wek mînak hejmara 23yem di 24ê Sibatê de, ya 24em di 1ê Îlonê de derketiye.

Di bin navê rojnameya Kurdistanê de, bi tirkî wiha dinivîse: “Kürdleri ikaz ve tahsil-i sınıyî’ye teşvik için şimdilik on beş günde bir neşrolunur Kürdçe gazetedir/ Rojnameyek kurdî ye ku niha ji panzdeh rojan carekî têtê weşandin bo kurdan hişyar bike û wan teşwîqê hînkirina pîşeyan bike.”

Di hejmara yekem de, Mîqdad Mîdhet berî ku bi kurtî armanca rojnameyê binivîse, dibêje ku li dinyayê çiqas Misilman hene di hemû gund û bajarên wan de, dibistan û rojname hene ku li dinyayê çî bibe di rojnameyên wan de tê nivîsîn.¹² Piştî vê hinek pesnê kurdan dide û dibêje mixabin heta niha ti rojnameyek kurdan tune ye, ji ber vê ez ê rojnameyek bi navê Kurdistanê biweşînim. Balê dikişîne ser kêmanîya tiştên nû dertên û daxwazê ji kesên kêmanîyên rojnameyê bibînin dike ku jê re binivîsin. Di hejmara yekem de wiha nivîsîye:

¹¹ Şükrü Hanioğlu, *Bir Siyasal Düşünür Olarak Doktor Abdullah Cevdet ve Dönemi*, üçdal Neşriyat, Stenbol 1981 (r.34-35)// Tütengil, C. Orhan: “Yeni Osmanlılar”dan Bu Yana İngiltere’de Türk Gazeteciliği 1897-1967, T.İş Bankası Yayınları, İstanbul 2008 (r. 90-94), Teza masterê ya Gülser OĞUZ bi navê “Osmanlı Gazetesi (1897-1904)” ku di sala 2006an de li Zanîngeha Hacettepeyê amade kiriye, di malpera YÖKê de heye.

¹² *Kurdistan Yekemîn Rojnameya Kurdî*, Tehran 2006 hejmar: 1, r. 1

“Heta niha kesek rojnameyeka weha nenivîsîye; ev rojnama min a ha, ya pêşîn e. Loma dê gelek kêmayî hebin. Ez hêvî dikim kêmayîya rojnamê ji min ra binivîsin. Hemî tişt dema nû çêdibin kê in, paşê hingê diçe dikeve rê de.”¹³

Wek li jorê jî xuya dike ev rojname wek mînak û hedef bajar û gundên kurd û Misilmanan digire. Di wê serdemê de rojname û dibistan hev temam dikin, bi awakî din rojname jî xwedî rola dibistanê ne. Ji ber ku di bin navê wê de dinivîse ku dixwaze kurdan hişyar bike û teşwîqê hînkirina pîşeyan bike. Bi referansên ayet û hedîsan¹⁴ tim û tim qala qenciya zanînê dike, dixwaze nîşanê kurdan bide ku li kuderê xwendîgeh û dibistanên qenc hene.

Beriya analiz û nirxandina mijarê di beşa yekem de em ê mijar a xebata xwe ligel armanc û girîngîya wê pêşkêş bikin. Paşê jî em ê rêbaz û naveroka xebata xwe pêşkêş bikin. Di beşa duyem de jî em ê nirxandinek derbarê xebatên li ser rojnameya Kurdistanê hatine kirin bikin. Li ku hatin dîtin, kê ew dîtin; ev mijar bi xwe jî hêja ye bê vegotin.

Di beşa sêyem de jî em ê behsa derketina rojnameyê bikin. Kîjan hejmara Rojnameya Kurdistanê li ku û kîjan tarîxê de derket, em ê agahî bidin. Di vê beşê de em ê li ser sedemên cih guherînê rawestin. Kurtejiyana berpirsiyar, xwedî û kedkarê pênc hejmarên ewil Mîqdad Mîdhet Bedirxan, paşê jî ya Evdîrehman Bedirxanê ku 26 hejmarên rojnameyê derxistiye, em ê binivîsin, ji ber ku jiyan wan û derxistina rojnameyê bi hev re pêwendîdar in. Wek li jorê hat gotin em dixwazin di beşa çarem de bi tevahî li ser naveroka rojnameya Kurdistanê rawestim. Yanî di rojnameyê de çend nivîs hene, çend ji vanan bi kurdî, çend jê bi tirkî ne. Behsa çi dikin û mijara wan çi ye. Yanî bi her awayî ev beş dê aliyê meyla rojnameyê pêşkêş bike. Herwiha ji aliyê dîrokî ve têkiliyên rojnameyê û edîtorê wê Evdîrehman Bedirxan ên bi tevgera Jon turkan re jî bi min muhîm e. Ji bo piştraskirina van çavkanî gelek in.

Di beşa pêncem de em ê rojnameya Kurdistanê ji hêla ziman, wêje û hinek mijarên balkêş ve analîz bikin. Di vê çarçovê de em ê li ser mijarên sereke yên wek Ziman, Wêje û Perwerde; Têgehîştina Welêt/Kurdistan; Daxwazên ji Padîşahê

¹³ M. Emin, Bozarslan: Kurdistan Rojnameya Kurdî ya Pêşîn/İlk Kürd Gazetesi (1898-1902), Cild 1, Weşanxana Deng, Çirîya Paşîn, Upsala 1991 (r.7)

¹⁴ Di beşa pêşkêşa naverokê de ev mijar berfireh hatiye nivîsin.

Osmanî (Arzihal 8 aded); Têkiliyên Kurd-Ermenî, Alayên Hemîdî; Nivîsandina Dîroka Kurdî (Dîroka Mîrektiya Botan); Têkiliyên Siyasî (Ahrar-i Osmaniye Kongresi) rawestin û nirxandina wan bikin.



BEŞA YEKEM: MIJAR, ARMANC, RÊBAZ, ÇARÇOVE

1. MIJARA LÊKOLÎNÊ

Mijara vê lêkolînê ew e ku naveroka 31 hejmarên rojnameya Kurdistanê, xebatên li ser wan hatine kirin û mijarên sereke yên rojnameyê bi hûrgilê bêne nirxandin. Ji ber ku rojnameya Kurdistanê rojnameya yekem bi kurdî ye, ev mijar gelek girîng e. Me jî bo vê girîngiyê ev mijar hîlbijart.

2. ARMANCA LÊKOLÎNÊ:

Berî ku rojnameya Kurdistanê derkeve, di sed sala 19. de, Împaratoriya Osmanî bi çend awayan dixwest ku pêşiya neteweyên doza mafê netewî dikirin, bigire. Di nîvê pêşîn ê vê sedsalê de, bi taybetî mîrekiyên kurdan ji holê hatine rakirin. Herî dawî di sala 1847an de, Mîrê Botan Bedirxan û malbata wî jî bi zorê dibin Stenbolê.¹⁵ Mîqdad Mîdhet Bedirxanê ku Rojnameya Kurdistanê derxistiye, di sala 1858an de, li Girîdê hatiye dinê. Li Stenbolê perwerde bûye. Di Îlona sala 1898an de wî bi Emîn Elî Bedirxan re hewil daye ku biçe Cizîrê, lê ew tene girtin. Ev bûyer¹⁶, piştî fişarên zêde yên li ser malbata wî ku dev ji weşanadina Rojnameya Kurdistanê berdaye û vegeriyaye Stenbolê, diqewime. Di her pênc hejmarên ku wî derxistiye de, bi zimanê kurdî balê kişandiye ser girîngiya zanîn û perwerdeyê.

Piştî ku Evdirehman Bedirxan dest bi weşana Rojnameya Kurdistanê dike, cihê derketina wê diguhere. Li çapxaneyê cerîdeya Osmanî ku ya Cemîyeta Îtîhad û Teraqîyê ye çap dibe. Bêtir zimanê sîyasî, tirkîya osmanî tê bikar anîn. 26 hejmar jî ji

¹⁵ Bülent Tekin, *Kürt Sorunu ve Sayılmayan İsyamlar 1514-1919*, Weşanên Dara, Dîyarbekir 2017 (r. 110-130)

¹⁶ Di gelek çavkanîyan de, dîroka vê bûyerê 1889 e. Di jimara 7an a rojnameya Kurdistanê de ku di Mijdara 1898an de derketîye behsa vê bûyerê tê kirin.

alîyê wî ve têne derxistin. Ev cidahîyên di navbera dewra Mîqdad Mîdhet Bedirxan û Evdirehman Bedirxan de, di beşa çarem a nîrxandinê de hatiye pêşkêş kirin.

Armanca vê lêkolînê ew e ku bi awayek rêkûpêk naveroka vê rojnameyê li gor angaştê me ya ku em dibêjin ‘ji hejmara yekê ya Rojnameya Kurdistanê heta hejdehan, zimanê kurdî bo xizmeta kurdan hatîye bikar anîn. Lê ji hejmara bîstan bi şûn de êdî bi piranî zimanê tirkîya osmanî hatiye bikaranîn. Ev ziman jî zimanê sîyasetê yê wê serdemê ye. Ev jî rojnameyê ji wezîfeya wê ya esasî bidûr xistîye.’ li ber çavan bê raxistin. Bi vî awayî jî em ê angaştê xwe bidin îsbatkirin.

Ev rojname wek rojnameya yekem a bi zimanê kurdî ye. Ji ber vê girîngiya wê, roja derketina wê (22ê Nîsanê) wek roja rojnamegerîya kurd tê pîroz kirin. Girîngiya rojnameyê him ji hêla demê ve him jî ji hêla naveroka wê tê. Dema ku cara ewil hewil tê dayîn bo rasterast bi rêya çapemenîyê banga kurdan bê kirin bi bal xwendin û zanînê ve, ji bo miletekî ev dem pir girîng e.

3. RÊBAZA LÊKOLÎNÊ

Ji ber ku di lêkolînên civakî de rastî **nesabît e**, bi destxistina rastîya mutleq an jî bêqisûr ne pêkan e. Lewra fikra ku lêkolîner herî zêde jê ewle ye jî dikare bê pûçkirin. Wê demê riya herî ewle ya ku lêkolîner karibe xwe bispêrê jî divê çavkanîyên cur bi cur bin û lêkolîner heta karibe bi çavkanîyên baştir riya xwe ronî bike.

Angaştê me ew e ku rojnameya Kurdistanê di hejmarên pêşîn de rojnameyek xwerû bi kurdî ye. Bo bala kurdan bikişîne ser girîngiya xwendin û zanînê der tê. Ev rengê rojnameya Kurdistanê jî di hejmarên ji yekê heta hijdehan de, bi ziman û naveroka xwe, xuya dike. Ji hejmara bîstan bi şûn de, (ji ber ku hejmara nozdehan hê nehatiye dîtin em behsa wê nakin), êdî zimanê rojnameya Kurdistanê bi giranî zimanê tirkîya osmanî ye. Di serdema Osmanî de ev zimanê tirkîya osmanî jî yê sîyasetê bû. Ev guherîn jî nîşan dide ku rojnameya Kurdistanê êdî bêtir sîyasî ye. Bi taybetî jî xwedîyê wê Evdirehman Bedirxan ketîye nava cemîyeta Îtîhad û Teraqîyê. Vê angaştê xwe em ê bi rêjeya cihgirtina zimanê kurdî û tirkî di rojnameyê de, îsbat bikin. Heta roja îro 26 hejmarên rojnameyê ji alîyê M. Emîn Bozarslan ve, du hejmar jî ji alîyê Malmîsanîj ve hatine latînîzekirin û şîrovekirin, lê kesî wek tezek master an doktorayê sih hejmarên li ber destê me ne, pêşkêş nekiriye. Dr. Hogir Tahir Tewfîq

hinek di teza xwe ya masterê ya bi navê “Rola Rojnamegeriya Kurdî Di Pêşvebirina Hizra Neteweyî ya Kurdî da 1898-1918” de û hinek jî di teza xwe ya doktorayê ya bi navê “Kurd û Kêşeya Ermenîyan 1877-1920” de behsa vê rojnameyê dike.

4. ÇARÇOVE Î PIRSGIRÊKÊN LÊKOLÎNÊ

Çarçoveya lêkolînê bi analîza rojnameya ku ji 22yê Nîsana 1898an heta 14ê Nîsana 1902yan hatîye weşandin, ew jî 31 hejmar in, sînorkirîye. Pirgirêka me ya herî girîng peydanekirina hejmara 19an a wenda ye. Me gelek hewl da bo dîtina vê hejmarê. Lê mixabin, bi tevî ku li gelek welatên Ewropa û Amerîkayê ji alîyê pîspor û dostan ve lêkolîn hatin kirin jî ev hejmar nehat dîtinê. Ji ber ku ev hejmara wenda di serdema veguhastina rojnameyê ji Cenevê bi bal Qahîreya Misrê ve de hatîye çapkirin loma nayê dîtin. Bi qasî ku M. Şukru Hanîoğlu (z.1955-) di pirtûka xwe ya bi navê ‘*Bir Siyasal Düşünür Olarak Doktor Abdullah Cevdet ve Dönemi*’yê de dîyar kiriye, ev dem xwedîyê Rojnameya Kurdistanê Abdurrahman Bedirhan û xwarziyê wî Teymen Fevzî di nava Jon turkan de gelek çalak in.¹⁷ Meriv kare bibêje ku astengiyên zêde, li ber belavkirina rojnameyên muxalîfê Siltan Evdilhemîdê Duyem, hebûn. Lê li hember Rojnameya Kurdistanê bêtir astengî hebûne. Wek mînak, di nava hefteyek piştî derketina Rojnameya Kurdistanê de, fermana qedexekirina vê rojnameyê derketibû.¹⁸ Ji ber van astengîyan Rojnameya Kurdistanê, nêzîkî sed salî, ji 1898an heta 1972yan di quncikê tarî yê pirtûkxaneyan de mabû.

¹⁷ Hanioglu, M. Şükrü, *Bir Siyasal Düşünür Olarak Doktor Abdullah Cevdet ve DÖNEMİ*, üçdal NEŞRİYAT, Stenbol 1981 (r. 41)

¹⁸ Malmîsanij, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan'ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan 1868-1936*, Weşanên Vate, Çapa 2. Stenbol 2011 (r. 121-122)

BEŞA DUYEM XEBATÊN LI SER ROJNAMEYA KURDISTANÊ

Em difikirin ku xebatên latînîzekirinê yên M. Emîn Bozaslan (26 hejmar), Malmisaniy(du hejmar/17-18) ji aliyê angaştî xwe ve binirxînin. Wek mînak ger wan vî karî nekiribana dê kurdên ku bi tîpên erebî nizanin nikaribana sûd ji vê rojnameya ewil bi kurdî bigirtana. Ji vê hêlê ve karek girîng kirine. Li virê dikare bê pirsîn madem ew qasî xebatên girîng li ser Rojnameya Kurdistanê hatine kirin çi pêwîstî bi vê xebatê heye? Ji du hêla ve ev xebat pêwîst e: Yek, di hinek tezan de li gora xwe hinek behsa rojnameya Kurdistanê hatibe kirin jî tu tez bi vê rojnameyê nehatiye sînor kirin. Mebesta me ji vê ew e ku ev sih hejmarên rojnameya Kurdistanê bi tenê nehatine analîzkirin. Du, hejmarên 10 û 12an bi awakî besît¹⁹ ji aliyê Kerem Soylu ve bi tevî gelek çewtiyan bes hatine latînîzekirinê û di Kovara Zendê ya bihara 2007an de hatine weşandin. Bi vê xebatê hewil tê dayîn ku transkrîbek birêkûpêk ya Tîrkiya Osmanî bê kirin û bo tîrkiya îroyîn bê wergerandin da ku di beşa nirxandinan de bê bikaranîn.

Taybetmendiya rojnameya Kurdistanê ew e ku rojnameya pêşîn a bi kurdî ye. Jiber vê taybetmendiye gelek balê kişandîye. Lê mixabin ku rayedarên Împaratoriya Osmanî nehîştine bi hêsanî li Kurdistanê bê belavkirin. Ji ber vê qedexe û astengkirinê lêkolînerên kurdan dereng gihîştine rojnameya Kurdistanê. Bi vî awayî xebatên li ser rojnameyê jî dereng dest pê kirine. Em ê li virê hewil bidin ku behsa hemû xebatên berî me hatine kirinê bikin. Bi qasî ku me lêkolîn kiriye, em negihîştin tezek ku sih hejmarên li ber destê me xebitîbe. Wek mînak teza masterê ya Hogir Tahir Tewfîq bi navê “Rola Rojnamegerîya Kurdî di pêşvebirina hizra neteweyî ya kurdî da(1898-1918)” ye. Hinek jî di teza xwe ya doktorayê ya bi navê “Kurd û Kêşeya Ermenîyan 1877-1920” de behsa vê rojnameyê dike. Lê ev her du tez jî bi zimanê ‘erebî hatine pêşkêş kirin.

¹⁹ ZEND Bihar 2007, mînak, di cihê “sanî” de “şanî” hatiye nivîsîn (r.108)

Dema em xebatên li ser rojnameya Kurdistanê digrin ber çavan dibînin ku bi çend awayan hatine kirin. Yek jê xebata bi heman awayî (wek wêne/kopî/faksîmîle) çapkirina rojnameyê ye. Cara ewil 26 hejmarên rojnameyê ji aliyê Dr. Kemal Fuad ve têne dîtin û li Bexdayê tîn çapkirin. Xebata duyem jî latînzekirina van hejmarên hatine dîtin e. Rojname di serdema Osmanî de bi tîpên erebî hatiye weşandin. Di encama Şerê Yekem ê Cîhanî de, Welatê kurdan beşa di bin destê osmanîyan de jî bû sê par. Yanî Tirkîye, Iraq û Sûrîye. Tirkîye ku piranîya kurdan li wirê bûn, derbasê alfabeya latînî bû û pêwendîya kurdan bi berhemên alfabeya erebî ra nema. Lewma cara ewil 26 hejmarên rojnameya Kurdistanê li Bexdayê hatin çapkirin û paşê ji aliyê kurdên alfabeya ‘erebînas ve hatin latînzekirin.

Li gor agahiyên ku heta niha gihîştine ber destê me, ji ber astengkirina hatina welêt Rojnameya Kurdistanê demeke dirêj ji aliyê xwendevanên kurd ve nedihat zanîn. Wek mînak di kovara Hawarê de meriv rast li agahiyên di derbarê wê de nayê.²⁰

Heftê sal piştî derketina wê, sala 1972yan, li Almanyayê, li bajarê Marburgê, Dr Kemal Fuad, di xebata xwe ya doktorayê ya li ser destxetên kurdî de, di pirtûkxaneyê dewletê de li 26 hejmarên wê rast tê û di sala 1972yan de 26 hejmarên (10,12,17,18 û 19 ne tê de) rojnameya Kurdistanê, ji aliyê Dr. Kemal Fuad ve, li Bexdayê wek eslê xwe (wek wêne/kopî) têne çapkirin. Di sala 1992yan de hejmarên 17 û 18an jî ji aliyê Malmisanij ve, bi navê “Evdirehman Bedirxan û Kurdistan, Rojnameya Kurdî ya Pêşîn, Hejmar: 17 û 18” hatibûn çapkirin. Di sala 2004an de, Celîlê Celîl, hejmarên 10 û 12an li Duhokê di Festîwala Malbata Bedirxaniyan de diyarî dike. Ev 30 hejmar bi heman awayî (bi tîpên erebî) li Qahîreyê di 2005an de, li Tehranê di 2006an de hatin çapkirin. Em ê çapa Tehranê bi kar bînin.

Xebata nîrxandina 26 hejmarên ku hatibûn dîtin ji aliyê M. Emin Bozarslanî ve di sala 1991an de hatiye kirin. Ev xebat bi tîpên latînî ji aliyê Weşanxaneyê Dengê ve wek du cild hatiye çapkirin. Ev xebata Bozarslanî bi mezaxtina kedeke pir

²⁰ Lê di rojnameya Roja Nû, hejmara 3. de, bi sernivîsa “1898-1943 Roja Me A Nû”yê Celade Bedirxan agahiyên ber fireh dide.

hatiye amadekirin. Piştî latînîzekirinê nivîsên bi tirkîya osmanî bo tirkîya nû hatine sadekirin. Piraniya bêjeyên ne zelal bi nîşegirtinan hatine zelalkirin.

Paşê du hejmarên din, hejmara 17an di Kitêbxaneya Neteweyî de li Parisê ji aliyê Malmisanij ve bi rêya Haydar Erdogan hat dîtin û hejmara 18an jî dîsa ji aliyê Malmisanij ve bi alîkariya hevalek wî li Enqereyê di Kitêbxaneya Neteweyî de hat dîtin û di Çiriya Paşîn a sala 1992yan de, bi pêşgotin û agahiyên berfireh ên bi tirkî, ji bo her nivîsê jî li binê rûpelê bi kurdî ravekirina bêjeyan pê re hatin çapkirin. Her du hejmarên (10 û 12) ku Celîlê Celîl dîtibûn, di bihara sala 2007an de, ji aliyê Kovara Zendê ve têne latînîzekirin. Ev her du hejmar ne weka xebatên M.E. Bozarslan û Malmisanij berfireh in. Em ê li ser hejmarên 10 û 12an bo latînîzekirina beşên kurdî û transkirîba tirkîya osmanî bixebitîm û wek pêvek di dawiya teza xwe de pêşkêş bikin.

Piştî van xebatan Felat Dilgeş (Abdullah Kîran), bi navê “Rojnameya Kurdî ya Herî Pêşîn **Kurdistan**” nîrxandinek wek pirtûk amade kiriye. Wek ku wî di pêşgotina pirtûkê de nivîsiye ev xebat bi minasebeta sed salîya derketina Rojnameya Kurdistanê wek teblîxek hatiye amadekirin û paşê jî ji aliyê nivîskar ve hatiye berfirehkirin bûye pirtûkek piçûk ku ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve di sala 1998an de li Stenbolê hatîye çapkirin. Di vê pirtûkê de 28 hejmarên Rojnameya Kurdistanê (xebatên M. E. Bozarslan û Malmîsanij) li ber çavan hatine girtin. Di çapa duyem de ku ji aliyê Nûbiharê ve hatîye weşandin, hejmarên 10 û 12an jî ku latînîzekirina me wek bingeş girtîye, dinirxîne.²¹

Pirtûk ji şeş beşan pêk hatîye: Di beşa yekem de nivîskar li ser dîrokçeya çapemeniyê radiweste. Di beşa duyem de li ser karê çapxane û çapemeniya Împaratoriya Osmanî, xebatên Mîqdad û Evdirehman Bedirxan radiweste. Di beşa sêyem de li ser dengvedana rojnameya Kurdistanê di çapemeniyê de û nivîskarên rojnameya Kurdistanê radiweste. Di beşa çarem de li ser peywendiyên Evdirehman Bedixan û Cemîyeta Îtîhad Terakîyê (CÎTê) radiweste.

²¹ Felat Dilgeş, *Rojnameya Kurdî ya Herî Pêşîn Kurdistan*, çapa 2. Weşanên Nûbihar, Stenbolê 2017 (r. 128)

Nirxandina herî pir ya M. Emîn Bozarslan e ku li ser 26 hejmaran hatîye kirin. M. Emîn Bozarslanê ku di warê zanîna tirkîya osmanî û erebî de gelek şareza ye, lê hemû şîroveyan xwe bi tenê sipartîye vê zanîna xwe. Lê di warê zanîna civakî de pêwîstî bi referansên cuda cuda heye. Taybetîya xebatên tezan ew e ku xwe dispêrin referansên cuda cuda.

Wek mînak dema em li bûyera hewildana Emîn Ali Bedirxan û Mîqdad Mîdhet Bedirxan ya ku xwestine di ser Trabzonê re herin Cizîra Botan, dinêrin dibînin ku bi hindikî sê dîrokên cuda 1889-1898-1899 hatine dayîn.

Lê di hejmara 7an a Rojnameya Kurdistanê de ku dîroka weşana wê Mîjdara 1898an e, Evdirehman Bedirxan nivîsîye ku birayê wî ji ber hewildana çûna welatê xwe hatine girtin. Mahmut Çetinê ku parastvanê îdeolojiya fermî ye jî di pirtûka xwe ya bi navê “*İsyancı Bedirhan Bey’in Yaramaz Çocukları ve Bir Kardeşlik Poetikası kart-kurt sesleri*” de, bo vê hewildanê palpiştiya dîroka Îlona 1898an dike.²² Ev referans û agahîyên Rojnameya Kurdistanê bêtir nêzîkê hev dixuyên.

Mebesta me li virê ew e ku di lêkolînên civakî de zanînek mutleq tune ye û divê lêkolînên wiha li ser rojnameyek ewqas girîng berdewam bin. Her xebata ku li ser rojnameya Kurdistanê hatiye kirin wek ya M. E. Bozarslan, Malmîsanîj, Celîlê Celîl û A. Kiran valahiyek dagirtiye.

²² Bnr. Beşa Sêyem, kurtejiyana Mîqdad Mîdhet Bedirxan.

BEŞA SÊYEM DÎROKA ROJNAMEYÊ

Wek me di destpêkê de jî amaje pê kir, rojnameya Kurdistanê piştî pêvajoyeka dûr û dirêj a pêşketina ramanên neteweyî li welat û li cîhanê; di 22ê Nîsana 1898an de li Qahîreya Misrê dest bi weşanê kir. Cara ewil bû ku pexşana kurdî wek Rojnameya Kurdistanê dihat çap kirin. Berî vê, pexşanên kurdî bi destxetan dihatin belavkirin. Ji ber vê dîroka weşana rojnameya Kurdistanê girîng e.

Her pênc jimarên pêşîn wek ku di destpêkê de hatibû nivîsîn ji pazdeh rojan carek derketin. Wek ku di tabloya agahîyên weşana rojnameyê de jî dê bê dîtin, jimara duyem di 6ê Gulanê de, ya sêyem di 20ê Gulanê de, ya çarem di 30ê Gulanê de û ya pêncem jî di 17ê Hezîrana 1898an de derketin.

Sê jimarên pêşîn li çapxaneya El-Hîlalê, di dema xwe de hatin çapkirin. Jimarên çar û pêncan li çapxaneya Rojnameya Kurdistanê hatin çapkirin. Zor û zexta ku ji hejmara yekê de li ser Mîqdad Mîdhed Bedirxanî dihat meşandin, encam da û wî dest ji weşana rojnameya Kurdistanê kişand.

Piştî wî birayê wî Evdirehman Bedirxan li Cenevê nêzîkî çar meh piştî jimara pêncan, di 11.10.1898an de, jimara 6an weşnad. Ji vê hejmarê heta hejmara 18an ku di 4ê Tebaxa 1899an de weşîyaye, sêzdeh hejmar li Cenevê, li çapxaneya Cem'îyeta Tifaq û Qencîya Misilmanan hatine çapkirin. Bi navê xwe yê 'eslî ev çapxane ya Cemîyeta Îtîhad û Terakkîyê ye.

Di heqê jimara 19an a wendabûyî de tu agahî heta roja me jî tune ye. Lê li gorî ku di jimarên piştî wê de hatiye nivîsîn, di vê jimarê de, nivîsek bi navê “Şîrketa Neheqîyê” li hember Wezîrê Behrîyeyê hatiye nivîsîn. Pêkane ku ev jimar di çapxaneyê de ji alîyê dewleta Osmanî ve hatibe desteser kirin. Lewma ku heta îro nehatîye dîtin. Ev zext û zora li ser rojnameyê dibe sedem ku ji hejmara 20î bi şûn

de, rojname li gelek cihan digere. Ev wek ku ji hejmara wenda ya 19an jî dixuyê belbî ji ber fişarên li ser rojnameyê, ew cihên xwe diguhêrin. Bi guhertinan re çapxane jî diguherin.

Di jimarên 20-21ê de navê çapxaneyê nehatîye nivîsîn. Lê bi tevî hejmarên 22-23yên ku li çapxaneya Hindiye çap bûne; ev çar hejmar li bajarê Qahîreyê derketine û dîrokên derketinê jî ev in: jimara 20an di 29.12.1899an de, jimara 21an di 11.01.1900î de, jimara 22yan di 02.02.1900î de, jimara 23yan di 24.02.1900î de derketîye.

Jimara 24an bi tenê li Londonê, di 01.09.1900î de derketîye û çapxaneya lê hatiye çapkirin jî nehatîye nivîsîn.

Piştî 24an pênc jimar (25, 26, 27, 28, 29) li ser hev, li bajarê Folkstonê yê Brîtanyayê derketine. Çapxaneya jimarên 25-26-27an nehatîye nivîsîn. Jimarên 28-29an li çapxaneya Întîqamê hatine çapkirin.

Dîroka derketina van pênc jimarên ev in: Jimara 25an di 01.10.1900î de, jimara 26an di 14.12.1900î de, jimara 27an di 13.03.1901ê de, jimara 28an di 14.09.1901ê de, jimara 29an di 14.10.1901ê de derketîye.

Her du jimarên dawîn dîsa li Cenevyê û dîsa di çapxaneya Întîqamê²³ de derketine. Dîroka jimara 30an 14.03.1902 ye, ya 31ê jî 14.04.1902 ye. Em ê van agahîyan wek pêvekek tabloyî di dawîya teza xwe de jî bidin.

1. KURTEJİYANA MÎQDAD MÎDHET BEDIRXAN (1858-1915)

Em dixwazin kurtejiyana Mîqdad Mîdhet Bedirxan binivîsin, ji ber ku Mîqdad damezrîner û berpirsiyarê vê rojnameya pêşîn bi kurdî ye ew wek rojnamegerê pêşîn ê kurdî jî tê hesibandin. Jiyan wî bo rojnamegerîya kurdî û serkeftin an têkçûna rojnameya Kurdîstanê jî girîng e. Di gelek pirtûkên xwedî angaşt de agahîyên şaş di derheqê jîyana wî de tene dayîn. Wek mînak Hakan Ozoglu di pirtûka xwe de, wî dike damezrînerî Cemîyeta Tealî ya Kurdistanê ku sê sal piştî

²³ “Întîqam” navê rojnameya ku ji aliyê Întîqamcî Yeni Osmanlılar Cemiyeti/Komeleya Tolhildêr a Osmanîyên Nû ve dihat weşandinê ye. Çapxane jî ya vê Komeleyê ye. Felat Dilgeş, Kurdistan (r. 57)

mirina wî hatîye damezrandin.²⁴ Dîsa Pirtûka Muslum Yucel a bi navê “Kürt Basın Tarihi-tekzip/Dîroka Çapemeniya Kurd-tekzîb” de, di beşa destpêkê de dîroka derketina rojnameya Kurdistanê wek 1892yan dinivîse.²⁵

Mîqdad Mîdhet Bedirxan, di sala 1858an de, li girava Girîdê ji dayîk bûye. Salên destpêka zaroktiya xwe li vê giravê dijî. Dema malbata wî bi efûya Siltan Evdilhemîdê Duyem li Stenbolê bi cih dibe, di Mekteb-î Rîştîye-î Eskeriye û Mekteb-î Siltaniye de dixwîne.

Mîqdad û birayê xwe yê mezin Emîn Alî Bedirxan, piştî weşana pênc jimarên Rojnameya Kurdistanê di sala 1898an²⁶ de (li gor hin çavkaniyan di sala 1889an de²⁷, di hin çavkaniyan de ji di sala 1899an²⁸ de ku piştî weşana Rojnameya Kurdistanê ye, li gor dîtina me 1898 rastir dixuyê, ji ber ku di her pênc hejmarên Rojnameyê yên ku Mîqdad Mîdhet Bedirxan weşandiye behsek wiha nanivîsîye, lê Evdirehman Bedirxan di daxwaznameya ku di hejmara heftan a ku 5ê Mijdara 1898an weşandiye de, behsa hewldana çûna welêt ya birayên xwe dike.) dikevin nava hewldaneke wisa ku derbasê Cizîra Botan bibin û dest bi raperînê bikin lê bi ser nakevin.

Wek me li jorê pirsî bû em niha jî bo dema ku Mîqdad Mîdhet dest bi weşana rojnameyê dike, konjonktura welêt û cîhanê çawa ye, dipirsin. Rewşa kurdan çi ye? Berî her tiştî polîtîkaya dewleta Osmanî li hember kurdan çi ye?

²⁴ Hakan Ozoglu, *Osmali'da Kürt Miliyetçiliği- Kimlik, Evrim, Sadakat*, İletişim Yayınları, Stenbol 2017 (r. 186)

²⁵ Muslum Yucel, *Kürt Basın Tarihi-tekzip* Weşanên Aram, Stenbol 1998 bnr. r. 17-25

²⁶ Malmîsanij, Abdurrahman Bedirhan Ve İlk Kürt Gazetesi Kürdistan Sayı:17 ve 18/Evdirehman Bedirhan û Rojnameya Pêşî ya Kurd Kurdistan, Hejmarên 17 û 18an (r. 30)

²⁷ Li gor Mahmut Çetin ev hewildan di îlona 1898an de pêk hatiye. Bnr. Mahmut Çetin, *İsyancı Bedirhan Bey'in Yaramaz Çocukları ve Bir Kardeşlik Poetikası* **kart-kurt sesleri**, biyografi.net Yayınları, İstanbul 2005 (r. 65)

²⁸ Robert Surieu, “Kurdistan-V”, Roja Nû, Beyrut, Hejmar:44 (3 Nîsan 1944), (r. 3); (Malmîsanij, İlk Kürt Gazetesi... (r. 32)/ Di nivîseke bi Fransî ya ku wek rêzenivîs di Rojnameya Roja Nû de tê çapkirin, 1899 tê nivîsîn. Binêre, Roja Nû, 3 Nîsan 1944, hej. 44,(r. 3) Di kitêba Sureya Bedirxan a bi navê ‘The Case of Kurdistan against Turkey’ de jî, gava tarîxa serhildanên Kurdan tê rêzkirin, 1889 dinivîse. Binêre, The Case of Kurdistan against Turkey, r.29, jêrenot.

Di vê serdemê de, bi bandora şoreşa Fransayê fikrên netewî li hember dewletên împaratorî pêl bi pêl berfireh dibin. Di serî de dinivîse ku ev rojnameya ewil e, dê kêmaniyên wê hebin. Yanî heta wê demê alfabeyek bi kurdî, hevpar tune ye. Wek ku Hogir Tahir Tewfîq di kitêba xwe ya bi navê *Elîfba Kurdî, Bi Tîpên Erebi û Tîpên Latînî Peydabûn û Werar, 1898-1932*²⁹ de gotiye: “Rojnameya Kurdistanê bi tîpên erebî û rênivîsa farisî ye.” Mebest, ji rênivîsa farisî ew e ku herfên di alfabeya ‘erebî de tunene (چ ژ پ ف گ û hwd) di alfabeya farisî de hene lewma bi wê rênivîsê derketiye.

Rojnameya Kurdistanê, di serî de, çend hejmarên pêşîn (1, 2, 3, 8, 9, 11, 12, 14, 15, 16), bes bi kurdî bûne. Yanî bi kurdiya kurmancî bûne. Kurdiya ku hatiye bikaranîn jî bi devoka botan hatiye nivîsîn. Wek her nivîsa wê demê “Kurdistan” jî bi “Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm”ê dest pê dike. Ku ev bi zimanê ‘erebî ye. Paşê, wek şîroveya vê ‘erebiyê, hevoka pêşîn wiha ye: “Sed hezar şikir û hemd ji Xwedê (Xwedayê) teala re, em Misilman xelq kirin û zanîna îlm û marîfetê re hiş û zeka da me.”³⁰

Di hejmara yekem a rojnameyê de ku 22yê Nîsana 1898an dertê, Mîqdad Mîdhet behsa gera xwe ya li cîhanê dike û dibêje ez niha jî li Misrê me. Behsa netewên wek çerkez, arnawud û ‘ereban dike ku zarokên xwe dişînin dibistanan. Li Misrê, di Camî’a Ezher de rastê kurdên Soran tê ku ji Kerkûk û Silêmaniyeyê hatine, lê dibêje ku “ez tu cara li ti dera rastê mirovên Bota, Xerzan, Şêrwan û Hekaryan nehatime û tu mekteban rastê mirovên eşîretên kurda nehatime, ez çi qas rastê mirovên van eşîra tîm hemî jî rencber in, jar û reben in, sin’etekî hunerekê nizanin.”³¹

Li ser sedema hatina xwe ya Misrê jî wiha dibêje: “Berî şeş heyva (22 Çiriya Pêşî 1897) ez nesax bîm, lewra vê zivistanê ez hatim Misrê.”³² Bi rastî dema meriv li vê daxuyaniyê dinêre wek ku sedema hatina Mîqdad Mîdhet Bedirxan a bo Misrê ji

²⁹ Hogir Tahir Tewfîq: *ELÎFBA KURDÎ-Bi Tîpên Erebi û Latînî, Peydabûn û Werar, 1898-1932*, werger: Muhsin Ebdulrehman, Weşanên Spîrêzê, Duhok, 2008

³⁰ *Kurdistan Yekemîn Rojnameya bi Kurdî*, çapa sêyem, Tehran 2006 (r. 11)

³¹ *Kurdistan*, (r. 13)

³² *Kurdistan*, (r. 13)

ber nesaxiya wî ye. Gelo ew qas jî derketina Rojnameya Kurdistanê tesadufek e, ku derketina Mîqdad Mîdhet ji Stenbolê û mirina mamosteyê wî Hecî Qadirê Koyî heman dem e? Di hejmara sêyem a Kurdistanê de, helbesta Koyî ya pesnê rojnameyan û edebiyata nûjen wek romanê dide, tê weşandin:

Le dewrî ême roman û cerîde

Eger çi meqsed e zanînî baw e

Ji vê malika Hecî Qadirê Koyî yê mamosteyê Mîqdad Mîdhet Bedirxanî tê famkirinê ku ev ne tesadufek e, heta meriv kare bibêje ku dema li Stenbolê ye, bo derxistina Rojnameya Kurdistanê serî li rayedaran dixê lê xuyaye destûr jê re nayê dayîn; piştî li derveyê welat derdikeve jî di cih de tê qedexekirin.

Piştî ew qas xebatên hêja, wek derxistina rojnameya pêşîn bi kurdî, tê Stenbolê û di karê fermî de dibe karmend. Di sala 1906an de ew jî bi malbata xwe re tê nefîkirin. Piştî meşrûtiyeta II. (1908) ew jî vedigere Stenbolê. Ew yek ji damezrênerê Cemiyeta Neşr-î Me'arif a Kurd (1910) e. Ji serê sala 1912an ku Firqeya Huriyet û Îtîlafê dibe desthilatdar³³, heta serê sala 1913an Miteserîfê Dêrsîmê bû. Piştî hêrişê Bab-ê 'Alî ji vî karî tê dûrxistin.

Di Rojî Kurd hejmara yekem de, sala 1913an nivîsek bi tirkî bi ser navê

“Hükümetin Genel Kuvetleri Açığa Çıkması, Ayrılık ve Eşitliğinin Gerekliliği, Bu Husustaki Fikir Ayrılıkları ve Bu Konudaki Görüşler”

Li ser navê Midhet tê weşandin.³⁴ Bo ku dîtinên wî yên sîyasî di vê nivîsê de hene me balê kişand ser vê nivîsê. Di dawiya nivîsê de “dê bidome” heye lê mixabin di her çar hejmarên ku me dîtin de, dewama nivîsê tunebû. Di sala 1915an de diçe ser dîlovaniya xwe.

³³ Dersimi, Dr. Vet. M. Nuri, Kürdistan Tarihinde Dersim, Weşanên DAMê, Stenbol Adar 2014 (r.85); Dr. Vet. M. Nûrî Dêrsîmî, Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsîm, Çapxaneyê Anî, Halep, 1952, (r. 93) Malmîsanîj neqilkiriye, Kurdistan hejmarên 17-18an (r.32)

³⁴ Rojî Kurd, Weşanên War, 2002, Stenbol (r. 26-29)

Mixabin ku gelek nivîsên li ser jiyana wî agahiyên çewt dane. Wek mînak Mehmûd Lewendî di nivîsa xwe ya bi sernivîsa “Kurdistan” Gazetesi/Rojnameya Kurdistanê (1898-1902) de dinivîse³⁵ ku Mîqdad Mîdhet Bedirxan piştî weşana hejmara pêncan miriye³⁶ loma Evdîrehman Bedirxan weşana rojnameyê domandîye. Felat Dilgeş jî li ser jiyana Mîqdad Mîdhet Bedirxan agahîyek çewt wiha dide : “Mîqdad Mîdhet yek ji endamên Kurdistan Tealî Cemiyetî (Komela Pêşveçûnî ya Kurdistanê) û avakarekî Kurd Tamîmî Maarîf û Neşriyat Cemiyetî (Komela Belavkirina Zanîne û Weşanî ya Kurd) ye jî. Kurdistan Tealî Cemiyetî di sala 1918an de, Kurd Tamîmî Maarîf û Neşriyat Cemiyetî jî di sala 1919an de hatiye avakirin. Navenda herdu komelan jî li Stenbolê bûye.”³⁷

2. KURTEJİYANA EVDİREHMAN BEDİRXAN (1868-1936)³⁸

Evdîrehman Bedirxan di sala 1868an de ji dayîk bûye û salek paşê bavê wî Mîr Bedirxan diçe ser dîlovaniya xwe. Di temenekî piçûk de dest bi xwendina Mekteb-î Sultanî ku îro bi navê Galatasaray Lisesi tê nasîn, dike. Piştî vê Îdareya Siyasî xelas dike û şeş salan wek serkatîb li Îdareya Mekteb-î Îdadiye ya Wezareta Perwerdeyê dixebite.

Piştî ku Mîqdad Mîdhet Bedirxan ji ber zîlm û zora Dewleta Osmanî dev ji weşana rojnameya Kurdistanê berdide, ew jî dev ji karmendiya dewletê ber dide û di 1898an de diçe Swîsreyê, bajarê Cenevê û weşana rojnameya Kurdistanê didomîne.

Di nava koma Îttîhad û Terakîyê de bi Dr. Evdîla Cewdet û Îshak Sukûtî re, herdu jî kurd in, dixebite û di 11ê Çiriya pêşîn a 1898an de hejmara 6an ya rojnameya Kurdistanê diweşîne. Pêwendiyên wî yên bi Jontirkan re piştî Kongreya Parisê (4ê Sibata 1902) ku ew hevalên xwe rêveberiya CÎTê wenda dîkin, lawaz

³⁵ Lewendî, Mehmûd, Rojnameya Kurdistan Press, Hejmar 16 (r. 13)

³⁶ Heman çewtîyê Bulent Tekin jî di kitêba xwe ya bi navê “Kürt Sorunu ve Sayılmayan İsyanlar 1514-1919” kiriyê. Çapa 2. Weşanên Dara, Amed 2017 (r. 166)

³⁷ Felat Dilgeş, *Rojnameya Kurdî ya Herî Pêşîn Kurdistan*, Weşana Nûbiharê, Çapa duyem, Stenbol 2017 (r. 25)

³⁸ Malmîsanîj, İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayınlayan Abdurrahman Bedirhan 1868-1936 /Evdîrehman Bedirxanê ku Rojnameya pêşîn Kurdistanê Weşandiye, Weşanê Vate, Stenbol 2011 (r. 13-99)

dibin. Di 14.04.1902yan de hejmara 31ê ya rojnameyê diweşîne. Wek dixuyê rojnameya Osmanî jî di 16.04.1902yan de, bi jimara 104. re bûye organa Firqeya Huriyetperweran.³⁹

Di dema ku li Swîsreyê ye, bi keçeke Cenevî, bi navê Elisabeth Eugénie van Muyden (1881-1963) re dibe heval. Bavê Elisabethê endazyarek bi navê Charles Franchois David van Muyden bû. Kalê wê jî wênesazek navdar bû. Malbata van Muydenan ji xanedanên/arîstokratên Swîsreyê bû. Di sala 1903yan de, Evdirehman gustîlka nîşaniyê dike pêçiya Elisabethê, lê jiber ku penaber e, zewaca wan heta Îlona 1904an paş ve dikeve. Meriv kare bibêje ku dema li kongreya Parisê ew hevalên xwe ji rêveberîya CÎTê dûr dikevin û derfetên çapemenîyê, wek rojnameya Osmanî dikevin destê Firqeya Xuriyetperweran lewma êdî nikaribîye rojnameya Kurdistanê biweşîne.

Evdirehman Bedîrxan, dostaniya kurd û ermenan parastiye. Di gelek hejmarên (7, 11, 13, 14, 25, 26, 27) rojnameya Kurdistanê de vê mijarê aniye rojevê. Em ê bi berfirehî di beşa têkiliyên kurd û ermenan de li ser vê mijarê rawestin. Evdirehman Bedîrxan, namilkek bi navê “Kürdistan Kıyamı” di sala 1900î de weşandiye.⁴⁰ Di wê serdemê de, ev helwesta belavkirina namilkek bo parastina mafê ermenan ji aliyê Misilmanekî ve, meriv kare bibêje ku gelek wêrekîyê dixwaze.

Ji agahiyên ku Malmîsanij dide, dihê zanîn ku Evdirehman Bedîrxan li ser serlêdanên birayên wî ji aliyê Siltan ve tê efûkirin.⁴¹ Di Îlona 1905an de, bi hevser û keça xwe Leylaxa şêş mehî ve dihê li Stenbolê, Erenkoyê, bi cih dibe. Çend meh paşê, di Adara 1906an de, bi hinceta bûyera Ridvan Paşayê Şaredarê Uskudara Stenbolê wek hemû mêrên malbata Bedîrxaniyan ew jî bi Mîqdad Mîdhet re bi keştiya Mekkeyê ber bi Trablûsxebê ve tê sirgûnkirin. Hevsera wî Elisabeth jî di bin çavdêriya memûrên Dewleta Osmanî de dimîne. Bi awakî telgrafek ji bavê xwe re

³⁹ Cavit Orhan Tütengil, “Yeni Osmanlılar”dan Bu Yana İngiltere’de Türk Gazeteciliği 1867-1967, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, Stenbol 2011 (r. 92)

⁴⁰ Malmîsanij, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, Weşana Vate, Çapa 2. Stenbol 2011 (r.30)

⁴¹ Malmîsanij, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, Weşana Vate, Çapa 2. Stenbol 2011 (r.37-38)

dişîne û bavê wê jî piştî gelek hewldanên mezin wê ji Stenbolê dibe Swîsreyê. Piştî îlana Meşrûtiyeta Duyem Evdîrehman Bedîrxan ji zîndana Trablûsêrbê tê berdan û bi birayê xwe Mîqdad Mîdhet re vedigere Stenbolê. Sê sal piştî vegeerê (1911), em wî wek gelek Bedîrxaniyan, di nava damezranerên “Kürt Meşrûtiyet Mektebi” de dibînin.

Di sala 1911an de xwendîngehek bi navê “Kürd Meşrûtiyet Mektebi” vedibe. Evdîrehman Bedîrxan jî dibe midurê vê xwendîngehê. Di dîroka Dewleta Osmanî û Tirkiyeyê de ev xwendîngeha pêşîn û dawîn e ku bi navê kurdan vebûye û Wezareta Perwerdehiyê alîkarî kiriye. Wek ku ji agahiyên Malmîsanîj dide, tê zanîn ev xwendîngeh jî di dema ku Îsmâîl Heqî Baban ê ji bajarê Silêmaniyê Wezîrê Perwerdehiyê ye de hatiye vekirin û alîkariya Wezaretê girtiye.⁴²

Di dema Şerê Cihanî yê Yekem de Evdîrehman Bedîrxan mîteserîfê “Büyük Ada”yê ye. Di dema şer de, bi daxwaza dewletê ji ber ku hespên Necmedîn Molayê ku bi meqamên payebilind, di karên Dewleta Osmanî de xebitîye, radestê artêşê kiriye, bi awakî Evdîrehman Bedîrxan sirgûnê mîteserîfiya bajarê Aydinê dike. Piştî demek kurt Yunanistan bajarê Aydinê dagir dike û Evdîrehman Bedîrxan jî digre li Îzmîrê davêje hebsê.

Di Gulana 1920an de, li Stenbolê Evdîrehman Bedîrxan di nava damezranerên Komeleya Malbata Bedîrxaniyan de cih digire. Li gor agahiyên ku Malmîsanîj dide, di Nîsana 1921an de, Evdîrehman bo bi fransîzan re, li Beyrûdê, li ser herêma ku dê Kurdistan lê ava bibe, hevdiştinan pêk bîne, hewldanek bê encam dike.⁴³

Di serdema Komara Tirkiyeyê de, êdî Evdîrehman memûrek teqawîdbûyî ye û paşnavê “Çinar” girtiye. Di nava tengasiya aborî de dijî. Jiber vê tengasiyê hevjiîna wî di Koleja Keçan a Amerîkayê de dersên Fransîzî û pîyanoyê dide. Di sala 1936an de, diçe ser dilovaniya xwe û gora wî li goristana Karacaahmedê ye.⁴⁴

⁴² Malmîsanîj, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan*, (r.77-85)

⁴³ Malmîsanîj, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan*, (r. 98)

⁴⁴h.b. (r. 99)

BEŞA ÇAREM ANALÎZA HEMÛ HEJMARAN

Em ê di vê beşê de wek monografiyek⁴⁵ yek bi yek sih hejmarên Rojnameya Kurdistanê bigrin dest. Di her hejmarê de çi heye, bo palpiştiya çi hatiye nivîsîn, çi nivîsên xwedîyên rojnameyê bin, çi jî nameyên ji xwendevanên rojnameyê bin... dê bi awayê rêza jîmaran bîne pêşkêş kirin. Bo ku ev analîz li gor teorîya analîzan dê bîne kirinê, em ê bi kurtî li ser teorîya analîzê rawestin.

1. TEORIYA ANALÎZÊ

Gelo dema ku Mîqdad Mîdhet dest bi weşana rojnameyê dike, şertûmercên welat û cîhanê çawa ne? Rewşa kurdan çi ye? Berî her tiştî polîtîkaya dewleta Osmanî li hember kurdan çi ye?

Em ê di naveroka rojnameyê de li bersiva van pirsan bigerin. Analîzên tekstê çawa tênê kirin, tekst çi ye? Divê hinek li ser vê mijarê bê rawestin. Tekst bi xwe binyadek e. Di vê binyadê de ne tenê honandina binyadî, belbî realîteya derve ya ku wê dorpêç kiriye jî, yanî wek me li jorê jî nivîsî rewşa welêt û cîhanê jî divê li ber çavan bête girtin. Yanî di rêbaza analîza tekstê de, bi taybetî jî di metoda analîza wateyê û hevoksaziya tekstê de divê bi qasî naveroka tekstê, li ser mercên ku ew tekst tê de hatiye avakirin jî bê rawestin.⁴⁶ Wek mînak, di serdema ku rojnameya Kurdistanê dest bi weşanê dike de, hemû xebatên nivîskî bi herfên ‘erebî ne û tu kes nikare alfabayek din bikar bîne. Lewma Rojnameya Kurdistanê jî bi tîpên ‘erebî hatiye çapkirin. Di her pênc hejmarên ku Mîqdad Mîdhet Bedirxan weşandiye de bi pîranî pesnê xwendin û hînbûna sin’etê tê dayîn. Referansên wî jî hedîsên Peyxember

⁴⁵ Ji bêjeya monographie ya fransî hatiye, bi wateya lêkolînên ku li ser mijarek an problemek taybet di qadên zanistî de tê nivîsînê ye. bnr. *Türkçe Sözlük*, TDK. Yayınları, çapa 9. cild 2, Ankara 1998 (r. 1576)

⁴⁶ Yasemin G. İnceoğlu-Nebahat A. Çomak, *Metin Çözümlemeleri*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul 2009 (r. 19)

û ayetên Qu‘anê ne. Ger em li gor şert û mercên wê demê li vê rojnameyê nenêrin, em ê bibêjin qey ev rojname rojnameyek bo propagandaya dîn e. Lê bi rastî rojname bo xizmeta çand û zimanê kurdî bike ji dîn referans digire.

Di pirtûka “Analîza Tekstan” de, di beşa “Teun A. van Dijk û Analîzên Vegotina Rexneyî” de, hatiye nivîsîn ku van Dijk bi referansa Pierre Bourdieuyî dema balê dikişîne ser cihê girîng ê bijarteyên sembolîk (rojnameger, nivîskar, hunermend, derhêner û akademîsyen) di tebeqeyên civata newekhev de, dibêje ku ew diyarkerê sernivîs, stîl û pêşkêşa vegotinan in. Nûçeyan jî wek berhemek vegotina serdest dibîne.⁴⁷ Hedîsên ku li jêrê hatine pêşkêş kirin jî wek palpiştîya vegotin û şîretan bo giregir û mezinên kurdan têne bikar anîn. Em dikarin bibêjin ku hema hemû hedîs û ayetên têne pêşkêşkirin vegotinên di nava tekstê de ne, bo hişyarkirin û perwerdekirina kurda ne.

Li virê pirsar “di nava kurdan de paşxaneyê fikra rojnameyê çi ye?” derdikeve pêş. Mesela çend malikên Hacı Qadirê Koyî (1815-1897) hene ku balê dikişînin ser girîngîya rojname û edebiyata nûjen:

“Le dewrî ême roman û cerîde

Egerçî meqsed e, zanînî baw e”⁴⁸

“Sed qa’îme û qesîde kes naykirre be pûlê

Rozname û cerîde û(?) kewtote qîmet û şan”⁴⁹

Li virê em dibînin ku Koyî girîngîya rojnamegerîyê derxistiye pêş. Ev jî nîşan dide ku ji Koyî ve fikra rojnamegerîyê bi kurdan re heye, wek me di destpêkê de jî balê bikişandibû serê, jixwe em dizanin Koyî mamosteyê zarokên malbata Bedirxaniyan e. Bandora Koyî li ser Mîqdad Mîdhet Bedirxanî çê bûye ku vê rojnameyê derxistîye. Di hejmara sêyem a rojnameyê de gelek pesnê wî tê dayîn, bi

⁴⁷ *Metin Çözümlemeleri* hb. (r. 30)

⁴⁸ *Dîwana Hecî Qadirê Koyî*, Weşanên Nefel, Stockholm 2004 (r.21)

⁴⁹ *Dîwana Hecî Qadirê Koyî*, (r.85)

vî awayî em dikarin bibêjin ji aliyê fikrî ve bandoreke Koyî li ser Mîqdad Mîdhet û Evdirehman Bedirxan heye.

2. NAVEROKA HEJMARA YEKEM

Em ê hewil bidin ku yek bi yek rojnameyan bixwînin û naverokên wan pêşkêş bikin da ku guherîna di navbera jimarên pêşîn ên bi giranî kurdî li pêş e û jimarên dawîn ên ku hêdî hêdî zimanê tirkî zêdetir di wan de cih digire, bê dîtin.

Wek me berê jî nivîsî, di vê serdemê de piraniya nivîsan bi “Bîsmîllah”ê dest pê dikir. Yanî bandora dîn li ser rojnameyê bêtir e ji bandora hestên neteweyî. Di destpêka rojnameya Kurdistanê de, dinivîse ku derheqê hînkirina îlmê de gelek ayet û hedîs hene. Bala xwendekrên kurd dikişîne ser rewşa misilmanên dinyayê ku li gund û bajarên wan hemûyan mekteb, medrese, rojname hene.

Di hejmara yekem de ev hedîs hene:

a- “El‘ulemau weresetul‘enbîyâi” angî ulema warisên enbiya ne. Piştî vê destpêkê êdî bi vê hedîsê pesnê aliman dide û bang li alimên kurdan dike û dibêje “gelî alimên kurdan, çawa hûn bo nimêjê wa‘z û nesîhet didin, divê hûn wisa jî bo hînkirina îlm û me‘rîfetê; mîr, axa, kurmanc ên ku dinasin teşwîq bikin. Ger hûn vê wezîfeya xwe nekin gunehê hemûyan di stûyê we de ye.”⁵⁰ Ev hişyarî li gor serdema xwe di cih de ye, çunkî alimên wê demê dikarin rêberîya milletê kurd bikin.

b- “El-ilmu ilman, ilmu-ebedan we ilmu-edyan”, angî ilm didu ne, yek jê îlmê bedena ye, yek jî îlmê dîn û îmanê ye.⁵¹ Bi vê hedîsê jî bala mîr û axayan dikişîne ser girîngiya çêkirina mekteban û şandina zarok, bira û merivên xwe bo van mekteban. Di dawîya vê vegotinê de, dibêje ku meriv bi xwendina rojnameyan jî bûyerên li dinyayê diqewimin agahdar dibe. Dixwaze balê bikişîne ser perwerdeya milletê kurd.

c- “el-kasîbu hebîbullah”, angî mirovê kesb û karî bike, Xwedê teala ji wan hez dike.”⁵² Bi vê hedîsê jî balê dikişîne ser kesên ku rojnameya dixwînin karê wan jî baş

⁵⁰ *Kurdistan Yekemîn Rojnameya Kurdî*, çapa sêyem, Tehran 2006, jimar 1, rûpel 1

⁵¹ *Kurdistan* (r. 2)

⁵² *Kurdistan* (r. 2)

dibe ji ber ku ew dizanin tîcaret li ku baştir dibe, lewra rojname di heqê her tiştî de agahî didin. Li virê behsa “Mekteba Eşîra” dike û pesnê wê dide. Her çiqas ev mekteb wek nîyet bi taybet bo xwendevanên ‘ereban hatibe amadekirin jî paşê zarokên kurdan jî lê xwendine. Em ê di mijara perwerdeyê de li ser “Mekteba Eşîran” rawestin.

d- “el-herbu xid’etun”, angî şer xapandin e.”⁵³ Bi vê hedîsê banga mîr, axa û kurmancan dike, pesnê kurdan, bi camêrbûna wan dide û dide zanîn ku di vê demê de, serkeftina şer bi camêriyê tenê nabe. Balê dikişîne ser çekên wek top û tîfîngên ku ji dûr ve merivan dîkujin, bê ku meriv dengên wan bibihîse. Dide zanîn ku ev top û tîfîng bê xwendina mekteb û medreseyê ne meriv kare çêke ne jî kare bikar bîne.

e- “utlubul’l-ilme welew fi’s-Sîn”, angî ilm Çînê bitin, herin wêderê bixwazin, bielimîn.⁵⁴ Li virê Çîn weke cihekî pir dûr hatiye hesibandin yanî cihê xwendinê çiqas dûr be jî divê hûn herin wan deran û bixwînin. Wek nimûneya wan cihên dûr navê Bexda, Şam û Stenbolê dide û ji mezinên kurdan dipirse ka kî ji we heta niha zarok û birayên xwe bo xwendinê şandine van cihan ku mektebên hikûmetê lê hene û bêmesref in.

Ayetên ku di hejmara yekem de ne:

1- “Cahîdû fi sebîlillaf” angî rîya Xwedê de şerî bikin, dijminên dîn re cîhadê bikin.⁵⁵ Ev ayet jî bo balê kişandina ser şerê navbera dewleta Osmanî û dewleta Rûsî ku wek Moskof binav dike, ye. Di vê vegotinê de jî bala kurdan dikişîne ser girîngiya xwendinê û dibêje ger hûn nexwînin hûn ê nikaribin xwe biparêzin. Wê dewleta Rûsan (Moskof) welatê we Kurdistanê dagir bike, divê hûn bixwînin xwe û welatê xwe ji dijminan biparêzin. Li virê mînaka “eceman” wek cîranê kurdan dide ku berê wan jî ne dixwend lê niha dixwînin û zarokên xwe dişînin cihên dûr bo xwendinê, lewma niha serkeftî ne. Paşê jî dibêje ku xelqê gotiye ger kurd bixwînin ew ê ji alemê xurtir û dewlementir bibin.

⁵³ *Kurdistan* (r. 2)

⁵⁴ *Kurdistan* (r. 2)

⁵⁵ *Kurdistan* (r. 2)

Kurte agahiyek li ser şerê du-sê sal berî wê demê ku di navbera Çîn û Japonyayê de pêk hatiye dide û dibêje ku her çiqas leşkerê Çîn pir bûye jî jiber xwendin û zanînê Japonyayê Çînê mexlûb kiriye.⁵⁶ Paşê behsa gera xwe ya li cîhanê dike û dibêje berî şeş mehan ez nesax bûm, ji ber vê ez niha jî li Misrê me li vir rastê çerkez, arawud û ereban tîm ku bav û birayên wan ew şandine bo xwendinê. Dîsa dibêje, ez li Camia Ezher rastî kurdên Sora hatim ku ji Kerkûk, Silêmaniyê bo xwendin hatine lê tu car rastî merivên eşîretên kurda nehatime. Ez çî qas rastê van eşîretên kurdan tîm dibînim ku hemû jî rencber, jar û reben in. Balê dikişîne ser rewşa baş a misriyan û ji mîr û axayên kurdan dipirse, çiyê me ji misriyên ku wek kurdan necamêr û bîaqil in, kême? Bes mekteb û xwendina kurdan kême dibîne. Dîsa bang li alimên kurdan dike û ji wan dixwaze ku di mizgeftan de pesnê zanînê bidin û nebaşîya nezanînê jî ji mîr û axayên kurdan re bibêjin da ku zarokên xwe bişînin mizgeftan wan fêrî xwendina Qur'ana pîroz bikin ku karibin rojnameyan bixwînin. Pir bi kurtî behsa şerê Misrê û Sûdanê dike û dibêje di hejmara hatî de ez ê bi berfirehî li ser vî şerî rawestim. Paşê pesnê Dewleta Osmanî (ku jê re dibêje dewleta me) ji ber şerê di navbera wê û yunaniyan de dide. Ji kurdan jî dixwaze ku piştgiriya dewletê bikin.

Di dawiya vê hejmarê de bang li hemû kurdan dike ku ji rojnameyê re binivîsin, nameyan verêkin ku ew jî di rojnameyê de biweşîne.

Bang li mîr, axa û alimên kurda dike û dibêje hûn hemû eslê min dizanin ku ez neviyê Xalid Bin Welîd im. Navê eşîra xwe wek Botan a ku bi Ezîzan navdar in dinivîse. Ev xebata xwe ya derxistina rojnameyê wek xizmetek di rêya Xwedê de bi nav dike. Armanca xwe jî bo qenciya kurdan nîşan dide û bang li kurdan dike, dibêje hûn jî desthilînin ji bo xêra Xwedê zarokên xwe bidin xwendin, hîne pîşeyan bikin; merivên misilman divê xwenda bin û hîne dîne xwe bibin.

⁵⁶ Di vê mijarê de helbesteke Hecî Qadirê Koyê heye: Abbas Vali, Miliyetçiliğin Kökenleri (r. 166) Loma me li jorê behsa mamostetî û bandora Hecî Qadirê Koyî ya li ser Mîqdad Mîdhet Bedirxan kiribû.

3. NAVEROKA HEJMARA DUYEM

Ev hejmar jî wek ya yekem bi “Bîsmîllah”ê dest pê dike û dibêje ku min di hejmara yekem de hinek behsa başiya zanîn û perwerdeyê kiribû. Dinivîse ku vê rojnameyê bo kurdan hînê xwendinê bike û bi wan bide zanîn ku sûda xwendinê çiqas pir e, derdixe. Ji bo vê jî dîsa behsa fermana peyxember bo hînkirina xwendinê dike û hedîsan wiha dike referans: 1-“Îlmê ji qumatekê heta tîrbê bixwînin.” Yanî ji qumatekê heta gorê xwendin ferman kiriye. Lê mebest ne ku zarokên qumatekê kare bixwîne, mebest ew e ku di temenekî pir piçûk de divê meriv dest bi xwendinê bike. Heta niha hemû hedîs ser girîngiya xwendinê hatin pêşkêşkirin. Niha jî hedîsek ser evîna welat wiha tê pêşkêşkirin: 2- “Hezkirina ji welat ji îmanê ye.” Yanî merivên xwedî îman ji welatê xwe hez dikin. Cara pêşîn e ku hedîsek li ser welatperweriyê hatiye nivîsîn.

Banga mîr, axa û paşayan dike, dipirse ku heta niha kê ji we çi ji welatê xwe re kiriye da em bizanin hûn ji welatê xwe hez dikin. Şîroveya hezkirinê jî weka parastina welat ji dijminan û avakirina dibistanan; di dibistanan de hînkirina xwendin û pîşeyan bi zarokên xwe dike. Paşê jî feydeyên xwendinê rêz dike û dibêje ku hûn bixwînin, hûn dê hînê pîşeyan bibin, hûn dê karibin pêşiya Moskofê xwedî top û tîfing bigirin û nehêlin welatê we dagir bike.

Hedîseke din jî wiha hatiye nivîsîn: 3- “Ked û xebata bilind ji îmanê ye.” Di şîroveya vê hedîsê de dibêje: “Gelî kurdno! Elhemdû lîllah xelk hemî dizanin kurd xweyhîmmet, kurd camêr in, cesûr in, xwîna xwe li ser wetenê xwe dirîjînin. Lê heyfa min tê ne xwenda û dewlemend in, bêmarîfet in.”⁵⁷

Hedîsa çarem a vê hejmarê ev e: “Ji dinya xwe re wisa bixebite weka tu dê qet nemirî, ji axreta xwe re jî wisa bixebite weka tu dê sibê bimirî.” Li ser vê hedîsê jî balê dikişîne ser xebata dinyayê wek tîcaret, perwerde, hînbûna pîşeyan şîrove dike. Xebata axretê jî wek bicihanîna fermanên Xwedê û Peyxemberê wî şîrovedike. Pesnê dîndariya kurdan dide û dibêje lê mixabin jiber ku nezan in, nikarin baş xebatên axretê bikin. Balê dikişîne ser kesên ku nayên jibîrkirin û bang li mîr û

⁵⁷ Kurdistan, çapa sêyem bi tîpên erebî, Dezgay çap û belawkirdinewey Bedirxan, Tahran, 2006 (r. 16)

axayên kurdan dike, dibêje xêran bikin, xêr ne tenê nimêj û rojî ye, belkî xêra mezin avakirina dibistanan e û di wan de zarokên bê dê û bê bav danîna ber xwendinê ye.

Çend hevok li ser girîngiya dîrokê dinivîse. Daxwaza xwe ya nivîsandina dîroka kurdan di rojnameyê de, tîne ziman. Dibêje ez ê berhemên Ehmedê Xanî di rojnameyê de biweşînim. Bang li dewlemendên kurdan dike û dibêje ku zêdeyê kefen meriv nikare tiştek ji vê dinyayê bi xwe re bibe. Zêr û zîvên xwe bo avakirina dibistanan serfkin û tê da zarokên bêdê û bav bidin xwendin. Divê Misilman alîkariya hev bikin.

Wek mînaka başiya xwendinê Dewleta Misilmanên Emewiyan a ku li Endelusê, Spanyaya îro, ava biye dide. Dibêje ku çar-pênc padîşahên wan xwenda bûn. Ji xwendinê hez dikirin. Di çend salan de, çend bajarên Ewropayê girtin. Yek ji wan padîşahan navê wî Evdirehmanê Sêyem bû. Pêncî sal padîşahî kir. Merivên dora wî jî xwenda bûn. Ji ber vê çi bajarê navê ‘edaleta wî dibihîst bêşer teslîmê wî dibû. Di dema wî de gelek dewlemend bûn, dibistan û medreseyên mezin avakirin. Wisa mizgeftên mezin avakirin ku heta wê demê mizgeftên wek wan li rûyê cîhanê tunebûn. Ew ne tirk lê ‘ereb bûn.

Piştî wî yên bûn padîşah dest bi xerabiyê kirin. Xwendin û huner berdan, ‘edalet nema, dest bi zilmê kirin. Memûran dest bi xwarina bertîlan kir. Her walîyek got ez padîşah im. Hêza misilmanan ji hev belawela bû. Wateya gotina pêşyan a ku dibêje “Meriv li ser rêya mezinên xwe ye.” Hate cih xîreta Misilmantiyê ne li padîşah, ne li wezîr, ne jî li xelkê ma, herkes ketibû derdê bertîlan.

Filehan dora wan girt û dest bi şer kir. Her walîyek bi milek ve kişand, hevgirtin di nava misilmanan de nema. Filehan jin û zarokên wan dîl girtin. Ew jî revîn Efrîkayê. Ew dîlên di destê wan de hemû bûn file. Bo mînak vî navî dinivîse: “Alfons kurê Frîderîk kurê Henrîk kurê Tomson kurê Mihemed kurê Ebulqasim.” Ew sê navên pêşîn navên filehan e, bavê wan filehan Mihemedê kurê Ebulqasimê misilman e.

Dîsa bang li alim, mîr û axayên kurdan dike, dibêje ger hûn kesên li ber destê xwe neşînin dibistanan û wan fêrî huner û pîşeyan nekin; li dinyayê û axretê gunehên

wan li stûyê we ye. Çawa ku fileyên cîranê misilmanên Endelusê ew der hemû girtin û misilman kirin file, dê cîranê we Moskof jî rojekî Kurdistanê bigire, dê mizgeftên we bike dêr û jin û zarokên we dîl bigire. Niha ku hêza we heye bixebitin, bixwînin, fêrî pîşe û huneran bibin da ku hûn karibin xwe biparêzin.

Behsa Dewleta Selçûqiyan dike û dibêje ku piştê wê Mîrekî tirkan bi navê Osman, merivekî camêr, misilman û ‘adil bû. ‘Eşîra wî her roj mezin bû, xelkê ku ‘edaleta wî dîtin ketin bin desthilatdariya wî. Piştê ew çû ser dilovaniya xwe lawê wî jî wek wî cesûr û mêr derket. Dewlet di dema wî de mezintir bû. Misilman dîsa bûn xwedî dewlet. Wek li jorê hatibû gotin “Meriv li ser rêya mezinên xwe ye.” Hemû padîşahên wê demê ji xwendinê hez dikirin lewma mîr û wezîrên wan jî xwenda bûn, adil bûn, misilman ji dijminan, filehan ewle bûn.

Di hejmara yekem de behsa şerê Sûdan û Misrê nîvco mabû. Leşkerê Sûdanê ji yê Misrê bêtir e. Lê jiber ku misrî ji sûdaniyan bêtir xwey huner û pîşe bûn bi ser ketin, bi hezaran kuştî û birîndar çêbûn, çend hezar jî dîl hatin girtin. Sebeba vê ew e ku misrî xwenda ne, xwey top û tîfing in, rêbazên şer dizanin. Sûdanî camêr in, lê rêbazên şer nizanin, çekên wan nîn in, lewma têkçûn û êdî nikarin piştî xwe rast bikin.

Di derbarê weşandina “Mem û Zîn”ê de dinivîse ku daxwaz ji xwendevanan hatiye û ew ê di rojnameya Kurdistanê de beş bi beş hemû “Mem û Zîn”ê çap bike. Ew jî ji xwendevanan daxwaz dike ku destxetên vê kitêbê li ber kê hebe bila jê re bişîne da ku cihên nayên xwendin sererast bike û li wan vegeirîne. Piştî hinek agahiyan di derbarê vê kitêbê de dide, dest pê dike sî û şeş malik di vê hejmarê de diweşîne. (Rojnameya Kurdistanê hejmar 2, r. 3...)

Em dikarin bibêjin ku ji xeynê weşana “Mem û Zîn”ê cudahiyek ber bi çav di navbera naveroka hejmara yekem û duyem de nîn e.

4. NAVEROKA HEJMARA SÊYEM

Hejmara sêyem piştî “Bîsmîllah”ê bi hedîsa peyxember dest pê dike. Wateya hedîsê wiha ye: “Ji padîşah bigire heta şivanê gundan, li ba Xwedayê Te’ala herkes ji

hev û dinê berpirsiyar e.” Yanî divê yên mezin, yên xweyî hêz û dewlemend; siltan, paşa û mîr li yên bindestê xwe bifîkirin û wan ji şerê dijmin biparêzin.

Dîsa başiya xwendinê bi balkişandina serkeftinên Evdirehmanê Sêyem ê Mezinê Endelusê tîne bîra xwendekaran û gotina pêşyan: “Meriv li ser rêya mezinên xwe ye.” Sêbare dinivîse. Wek di hedîsa jorê de hatiye pêkêşkirin her ‘alim û mezinên kurdan divê wezîfeya xwe bînin cih.

Mîqdad Mîdhet Bedirxan dinivîse ku li welatê xwe dixwaze vê xizmetê bike lê dewlet nahêle malbata Bedirxaniyan biçin welatê xwe, ew jî bi rêya vê rojnameyê wezîfeya xwe tîne cih. Di rojnameyê de cara pêşîn e ku rasterast sirgûniya malbata xwe dinivîse:

“Kullukum raîn we kullukum mes’ûlun en reîyyetîhî. Aşîkar dibe ku ez jî bi emrê Pêxember eleyhîsselam me’mûr im xizmetê, qencîyê ji kurdan ra bikim, rîya qencîyê nîşanê wan bikim, wan ji xirabîyê hîfz bikim. Çiku dewlet nahêle kes ji me biçe Kurdistanê, loma ez bi vê cerîdeyê, ya li ser min deyn (e) ez dikim. Xwedê arîkarîya min û misilmana(n) hemîya(n) bike.”⁵⁸

Bi hedîseke din ku dibêje ‘elimandina îlmê li ser hemû mêr û jinên misilmanan ferz e. Balê dikişîne ser ferzên dînî wek nimêj û rojiyê û dibêje çawa ferza nimêj û rojiyê berdewam e wisa jî ferza ‘elimandina îlmê jî berdewam e. Dîsa dibêje ku meriv çiqasî ji welatê xwe hez bike jî bê xwendin meriv nikare başiyan li welatê xwe bike. Mînaka kitêbên ku li ser xwedîkirina dewar û pez, çandiniya genim û ceh hatine nivîsîn hene û dê bi rêya xwendina van kitêban abûriya⁵⁹ meriv baştir bibe.

Mealê ayeta “Leyse lîl-însanî îlla ma se‘a” wiha dide: “Mirov çi qas bixebite, çi qas bişixule wê ew qas kar bike.” Mînaka dewlemendiya frengan dide û dibêje ji derveyê kurdan mîletên din ên misilman xebitîn dewlemend bûn, divê kurd jî bixebitin û dewlemend bibin. Dîsa behsa şerê nava Osmanî û Yunaniyan dike, pesnê

⁵⁸ h.b. r. 19

⁵⁹ Cara pêşîn bêjeya “abûrî” hatiye bikar anîn. Bi wateya debarê. h. b. (r. 20)

serkeftina Osmaniyan dide. Ji mîr û axayên kurdan dixwaze ku ew kurdan fêrî huner û zanîne bikin da li welatê xwe bixebitin û aboriya xwe baştir bikin.

Bi kurtî behsa malbata xwe dike, wek birayên ku dijîn hevdeh in. Hemû xwenda ne, hin jê li Şamê, hin jî li Stenbolê ne. Berî vê, nivîsîbû ku dewlet nahêle li welatê xwe di nava Cizîra Botan de mezinatî û mîrektî bikin.

Ji xwendevanan dixwaze ku dema kaxizek jê re dişînin bila nav û navnîşanên xwe binivîsin da ku bersivên wan binivîse.

Pêşbîniyên wî bi piranî li ser metirsiya Moskof in. Behsa dagirkirina Qozanê ku misilman lê dijîn dike. Dibêje heta bîst û pênc salan wê Moskof bi Îslamê re şer bike. Lê bîst û pênc sal paşê dewleteke tirkî li Anatoliyayê û Bakurê Kurdistanê ava dibe. Dewleta Osmanî ya ku li Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê desthilatdar bû, ji holê radişe. Di encama jîholêrabûna dewleta osmanî de, Kurdistanê girêdayê dewleta osmanî dibe sê beş. Başûrê Kurdistanê ji aliyê Brîtanyaya Mezin ve, Rojavayê Kurdistanê jî ji aliyê Fransayê ve têne dagirkirin. Rojhilatê Kurdistanê jî xwe di binê desthilatdariya dewleta farisan de bû, wisa jî ma.

Pir bi kurtî behsa neliheviya kurd û ermenîyan dike. Cara pêşîn e ku navê ermenîyan dinivîse. Behsa şerê Spanî û Amerîkîyan dike, dibêje ‘her du jî xurt in ez ê paşê binivîsim.’⁶⁰

Pesnê Yusuf Zîya Paşa dide, kitêbek bi navê “El-Hedîyyet’ul-Hemîdîye fî’l-luxet’îl-kurdîyye” nivîsîye. Ev kitêb du beş in, yek ferhenga kurdî û erebî ye; behsa vê nehatîye kirin. Ya dî jî wek ku Mîqdad Mîdhet Bedirxan gotîye şîroveya rêbazên zimanê kurmancî daye nasîn. Bi tevî ku li ser navê Siltan hatiye çapkirin jî dîsa hatiye qedexekirin.

Di vê hejmarê de, hinek agahî li ser Hecî Qadirê Koyî wek “sala dî wefat kir” bi tevî helbesta wî ya “Zemane” dide. Dibêje ku wî derheqê hînkirina zanîn û hunerê de gelek helbest nivîsîne. Ew di gelek çavkanîyan de wek mamosteyê malbata Bedirxaniyan dihête nasîn

⁶⁰ H.b. r. 21

Di vê hejmarê de du teqrîz yanî nameyên ecibandinê ji Şamê hatine. Ya yekem pexşan e ku tê de pesnê rojnameyê û Mîqdad Mîdhet Bedirxan tê dayîn. Li ser rewşa kurdan xemgîniya xwe tîne ziman ku kurd camêr û cesûr in lê heta niha ji bindestiyê rizgarnebûna wan radiweste û wek sedem jî dibêje jiber ku kurd nebûne xwedî huner û sin'et lewma rizgar nebûne.⁶¹ Ev pexşan li ser navê N.H. ye. Teqrîza duyem helbestek ji neh malikan pêk hatiye. Bi mexlesa Lawê Şêx E. Fetah hatiye şandin. Çil û pênc sal paşê di rojnameya “Roja Nû” de⁶² Celadet Ali Bedirxan dinivîse ku bavê wî Emin Ali Bedirxan vê mexlesê bikar anîye. Vê teqrîzê jî di hejmara sêyem a “Roja Nû” de diweşîne.

Ev hejmar jî bi 35 malikên “Mem û Zîn”a Ehmedê Xanî bi dawî dibe. Malika 71. nehatiye çapkirin, dibe ku nehatibe xwendin an hatibe jibîrkirin.

5. NAVEROKA HEJMARA ÇAREM

Hejmara çarem bi arzûhala bo Siltan Evdîlhemîdê Duyem dest pê kiriye. Heta vê hejmarê hemû rojname bes bi zimanê kurdî ye. Di binê daxwaznameyê de nivîsiye: “Ev xetê min li jor bi tirkî nivîsî, kaxizek e ji Hezretî Siltan Ebdîlhemîd Xan re ye. Li vî kaxizî de ez hêvî dikim ku îzna cerîdeya min bide, da ez rêkim Kurdistanê.”⁶³

Di hejmara pêncan de, daxwaznameya duyem Mîqdad Mîdhet Bedirxan dinivîse. Du daxwazname jî (Hejmar 6-7) Evdîrehman Bedirxan li ser hev dinivîse. Ser nivîsên sê daxwaznameyan wek hev in: “Şevketlu Azametlu Sultan Abdülhamid Han-i Sani Hazretlerine Arzihal-i Abidanemdir”, lê ji ya heftan pê ve du peyvên pêşîn “Şevketlu Azametlu” û peyva dawîn “abidane” nayên nivîsîn. Ev guherîn jî nişan dide ku êdî helwesta Evdîrehman Bedirxan li hember Siltan bi xwe jî guheriye. Di van her çar (4-5-6-7) hejmaran de, bes daxwazname bi tirkî ne.

Di daxwaznameya yekem de, dide zanîn ku ji aliyê Wezareta Karê Hundir ve hatina rojnameya Kurdistanê bo welat hatiye qedexekirin û ji parêzgehan re danezan

⁶¹ H.b. r. 21

⁶² Roja Nû, jimar 3, Bi ser nivîsa “1898 û 1943 Roja Nû A Me” Celadet Ali Bedirxan nivîsiye.

⁶³ Kurdistan, çapa Tehran r. 24

hatine şandin. Li ser vê rewşê berî vê daxwaznameyê ji Serokwezaret û sekretarya Sarayê re bo qedexeya ser rojnameyê rakin, serlêdan kiriye û nivîsiye ger qedexe ranekin dê rasterast daxwazname ji Padîşah re bişîne. Ew di daxwaznameyê de wiha didomîne, ‘bi tevî ku dema bersivdanê têra xwe bihurî jî tu bersivek nehat û min jî vê daxwaznameyê rasterast ji Cenabê Padîşah re, di rûpela pêşîn a rojnameya xwe de nivîsî’:

“Padîşahê Min,

Weka hûn dizanin miletê kurd, ji bijarteyê miletan e ku dewleta Osmaniya ebedî hanîne wicûdê. Welatê wan Kurdistan jî cîranê du dewletan e, ew dikarin hêrîşên dijminên ji hêla Anatoliya ve rawestînin û wan têk bibin, lê mixabin berî Cenabê te derkeve ser text tu kesê bo perwerde, hîndekarîyê rêberiya pêşveçûna wan nekiriye. Ez benîyê we, ji bijarteyên mîrê kurd im, jiber ku Pêxember di hedîsa şerîf de gotiye: ‘Her yek ji we şivanek e û ji keriyê xwe berpirsiyar e.’ ez jî bi vê rojnameya xwe ya ku bi zimanê kurdî ye dixwazim vê wezîfeya xwe bînim cih, kurdan hînê huner û sin’etê bikim.

Jiber ku bi zimanê kurdî ye û ez jî yek ji mezinê wan im, ev şîretên min dê gelek bandoreke erênî li wan bikin. Ger ev karê ha deh sal berê hatiba kirin ez bawer dikim dê aniha kurd di rewşeke pir pêşketî de bûna.”⁶⁴

Di dawîya daxwaznameyê de, dibêje “Padîşahê Min, li gor dîtina min rojnameya kurdî yek ji amûrên paye bilind e ku dê reformên li seranserê Kurdistanê leztir bike û zilma memûran ji holê rake. Ev rewşa ku ji der ve jî dixuyê ji aliyê gelek pêwendîdaran ve jî tê pejirandin. Bi tevî ku di naveroka rojnameyê de tiştê menfî nîn e, pêkan e ku bi tevayî bi dîtina û daxwaza hikûmeta me ya paye bilind re bê eleqedarbûnê.

Ez xwe davêjim xweliya binê lingê Padîşahê xwe ku ferman ji Babêâlî re bike da destûra hatina rojnameyê bo Kurdistanê û cihê kurd lê dijîn bide.”⁶⁵

⁶⁴ H.b. r. 23

⁶⁵ H.b. r. 24

Piştî agahiyên li ser daxwaznameyê wek me li jor nivîsî, bang li kurdan dike: “Divê kurd hemî bighîn hev ji walîya, muteserrifa hêvî bikin, da bihêlin ez vê cerîdeyê rêkim welatê kurdan.” Piştî hinek pesnê kurdan dide, dibêje êdî bêkitêbî û bînivîsandin bo kurdan eyb, ar e û fedî ye. Ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî sê malik neqil dike: (me her malik bi rêze jimarek nîşan da)

“231 Ger dê hebûwa me îttîfaqek/vêkra bikira me îmqîyadek.

232 Rom û ereb û ecem tamamî/hemyan ji me re dikir xulamî

233 Tekmîl dikir me dîn û dewlet/tesîl-i dikir me ilm û hîkmet.”⁶⁶

Bi van malikan li ser girîngiya tifaqa mîr û axayên kurdan radiweste, pêşniyaz dike ku ji Padîşah re telgirafan binivîsin û daxwaznameyan bişînin da ku qedexeya cerîdeyê rake ku ji wan re karibe bişîne.

Li ser girîngiya rojnameyê radiweste û dibêje lewma zalim naxwazin kurd ji wek mîletên din bibin xwedî rojname û xwedî nivîsandin. Bang li mîr û axayan dike ku hemû kurdan bidin xwendin. Ger kurd bixwînin xurt û dewlemnd bibin hûn jî bi wan re dewlemend dibin, ne ji kurdan be hun (di piraniya nivîsan de “un” dinivîse, bes li virê “hun” nivîsîye.) ê mîr û axatîyê li kê bikin.

“Fazîlet’ul-ilm”/qencîya zanînê. Ev wek ser nivîs e, bo hedîsa “kesê baş ew e ku feydeyê dide merivan” hanîye û pê pesnê aliman daye. Daye zanîn ku bê zanîn bawerî tazî ye yanî zanîn reng û rûçik dide baweriyê. Dîsa bang li mîr, axa û kurdan dike, dibêje baş bizanin, xwendin li dînya û axiretê rûyê merivan spî dike.

Ayeteke Qur’anê neqil dike ku bang li Îbrahîm pêxember tê kirin, mealê wê “Ez elîm im, hez ji merivên (...)”⁶⁷ “alim dikim” nehatiye nivîsîn. Dîsa li virê bi referansên hedîsê Pêxember gelek pesnê xwendinê tê dayîn.

Gotineke Îmamê Xezalî neqil kiriye ku tê de cudahiya nava însan û heywanan de bes wek ilim hatiye pêşkêş kirin. Gelek mînakên ku hinek heywan bi hin hêlên xwe ji merivan xurttir in lê bi zanîna xwe meriv dikeve pêşîya wan. Şîreta Loqman a

⁶⁶ H.b. r. 24

⁶⁷ h.b. r. 24

ji kurê wî re neqil kiriye ku tê de pesnê hevaltiya aliman tê dayin. Dîsa ayeteke Qur'anê neqil kiriye ku Xweda, piştî navê xwe û melekan navê aliman zikir dike, bi vê referansê jî başiya zanîne derdixe pêş.

Di dawiya vê hejmarê de agahiyên fireh di heqê Spanya û Amerîkayê de dide, sedemê di şer de serkeftina Amerîkayê jî bi zanîn û çekên xurt ve girêdaye. Di vê hejmarê de “Mem û Zîn”a Ehmedê Xanî neweşandîye.

6. NAVEROKA HEJMARA PÊNCÊMÎN

Ev hejmar jî bi daxwaznameya duyem dest pê dike. Dide zanîn ku qedexeya li ser hatina rojnameyê ranebûye ser de jî Mîqdad bo vegera Stenbolê hatiye dawetkirin. Kesên di dest wan de rojname hebûye hatine girtin. Ger rojnameyê bidomîne dê Mîqdad Mîdhet Bedirxan jî ji aliyê rêveberiya Misrê ve bête girtin û bi zorê bo Stenbolê bête şandin. Bi çar xalan di vê daxwaznameyê de xwe diparêze û di dawî de ji Siltan dixwaze ku bo rakirina qedexeya ser rojnameyê ji wezaretê re ferman bike.

Dîsa bang li alim mîr û axayên kurdan dike ku bibin yek telgrafekê ji Siltan re verêkin da îzna vê rojnameyê bide.

Qenciya Zanîne:

Li ser qenciya îlmê dîsa ayeta Qur'anê wiha pêşkêş dike: “Fes’elû ehlezzîkrî in kuntum la te’lemûn.”⁶⁸ Ji hêla ziman ve bi piranî tîpa “n”yê ya di “an”ê de avêtiye û peyva “tişt” li devera Botan mê hatiye bikar anîn. Li ser qenciya zanîne gelek hedîsan jî dinivîse.

Nameyek dirêj ji bajarê Edeneyê ji Seyid Tahirê Botî hatiye ku pesnê rojnameyê û xwediyê wê dide. Agahî dide ku di wê serdemê de li Edeneyê bi hezaran kurd bo xebatê bi cih bûne. Nivîsên dînî gelek diecibîne û dibêje ger hinek li ser mezhebê Şafîî binivîsî baş e, jiber ku kurd Şafîî ne.

⁶⁸ H.b. r. 29

Di bersiva wî de Mîqdad Mîdhet Bedirxan dinivîse ku jiber qedexeyê nikare bi postayê bişîne, lê dibêje ez ê bi rêyek din pêncî rojname bişînim. Em dibînin ku dîsa beşek ji Mem û Zînê, bi qasî 33 malik (ji malika 73yan heta malika 105an) weşandîye.

Mîqdad Mîdhet Bedirxan hejmara 5an di 17ê Hezîrana 1898an de der dixe û vedigere Stenbolê. Di vegera wî de, bandora girtina birayê wî yê mezin Emîn Alî Bedirxan heye.

7. NAVEROKA HEJMARA ŞEŞEM

Sê meh û 24 roj piştî hejmara pêncan Evdirehman Bedirxan, 11ê Çiriya pêşîn a 1898an li Cenevê hejmara şeşan diweşîne. Ew jî wek Mîqdad bi daxwaznameya ji Siltan Evdilhemîd re dest pê dike. Di vê hejmarê de helwesteke Evdirehman tê dîtin ku dixwaze bi her awayî biselimîne ku dê li ser fikra birayê xwe î mezin be. Sernivîsa daxwaznameyê ji heman peyvan pêk tê. Di serê daxwaznameyê de, agahiyan di heqê Mîqdad de dide. Behsa nexweşiya wî dike û dide zanîn ku bo çûna Misrê jî destûr nedane wî. Lê bo hanîna wî ji Misrê gelek zor û zehmetê dane wî û birayê wî yê mezin Emîn Alî Bedirxan. Tiştê ku bala me dikişîne ew e ku Mîqdad Mîdhet û Emîn Alî Bedirxan di nava pêwendiyên xurt de ne. Ji bo anîna wî bi taybetî zordestî li Emîn Alî Bedirxan dikin. Di daxwaznameyê de bi berfirehî li ser karê “Ebulhuda” ku berevajiyê navê xwe bûye “Ebuddelal” yanî li cihê bavê rêya rastiyê, bûye bavê rêya xirabiyê. Li jorê me bal kişandibû ser hewldana wan a bo çûna Cizîra Botan. Ev bûyer jî nêzîkayîya wan nîşan dide.

Di dawiya daxwaznameyê de dide zanîn ku hatina Mîqdad Mîdhet Bedirxan berî van zordestiyan hatibû plankirin ev jî bi telgrafên wî yê berî girtina Emîn Alî Bedirxan tête selimandin. Dîsa dawiya daxwaznameyê de dide zanîn ku ew ê li hember zalimên wek Ebuddelal (Ebulhuda) tekoşînê bike da ku malbata xwe ji zalimên wek wî biparêze.

Piştî daxwaznameyê, bi pesin û şikrê Xweda dest bi nivîsa kurdî dike û dinivîse ku daxwaznameyek bi romî (tirkî) ji Siltan Evdilhemîd re nivîsiye û tê de behsa nebaşiyên Ebuddelalê bêesil û xerabiyên wî kiriye. Li vir bala meriv dikişîne ku Evdirehman Bedirxan di cihê zimanê tirkî de zimanê romî nivîsiye. Dîsa balê

dikişîne ser xebatên rojnameyê û dibêje ku ev xebat ji bo qenciya kurdan tê kirin. Li virê em dibînin ku navê Çapxaneyê jî “Metbe’eya Cem’iyeta Tifaq û Qenciya Misilmanan” e. Ev jî nêzîkiya wî û Jon Tirkan nîşan dide.

Em dibînin ku Evdîrehman Bedîrxan, giraniyê dide aqil û hiş: Wiha dinivîse: “Gelî Kurdno! Însan ji heywana qencîr in. Çiku biaqil û hiş in.” Yanî ew bîngeha zanîne dispêre aqil û rasterast pesnê aqilê merivan dide. Lê Mîqdad bêtir li ser qenciya îlmê radiwestiya. Dîsa Evdîrehman jî xwe dispêre ayet û hedîsan lê rasterast girîngiya aqil derdixe pêş. Mealê destpêka ayeta Qur’anê “We yerfe’û” yanî Xwedayê Te’ala gotiye, xwey’aqil hakimê hemû mexlûqa ne. Bi aqil meriv ji heywanan cuda dibe. Behsa gelek pêşketinên wek keştîyên li ser deryayê, trênen li ser rêya hesin, top û tîfîngan dike ku bi hêza hunera aqil hatine afirandin.

Aqil bi îlmê hêz digire. Bo xwendinê divê meriv aqil bikarbîne. Kurdan bo xwendin û nivîsinê bi qasî mîletên din aqil bikar neanîne. Ehmedê Xanî wiha dibêje:

“Enwa’ê milel di xweykitêb in

Kurmanc-i tenê di bêhesêb in” (Ev malik rêzejimara 241an e û di jimara 9. a rojnameyê de ye.)

Ev rewşa kurdan a bêkitêb û bêhesab bi Evdîrehman giran tê û dibêje fedî ye, ar e. Divê kurd jî li pey xwendin û zanîne bazdîn. Ew dibêje ez jî vê rojnameyê derdixim bo rêya zanîne bidim ber kurdan, lewre ez ji kurdan hez dikim. Hikûmet pere ji kurdan disitîne pê ji tirkan re dibistan çêdike. Kurdên reben dîlê wê hikûmetê ne. Ji xwedê hêvî dike ku kurd vê rewşê bibînin ji xew şiyar bin. Bi Hedîsa Pêxember a ku dibêje, ji dinyaya xwe re bixebitin wek ku hûn ê ebedî bijîn, ji axreta xwe re bixwebitin wek ku hûn ê sibê bimirin. Bang li alim, mîr û axayên kurdan dike, hedîseke din ku dibêje: “her yek ji we şivan e û berpirsiyarê keriyê xwe ye. Yanî kurmanç ji mezinên wan tên pirsîn. Ez dixwazim werim welatê xwe û xwe di rêya mileta xwe de feda bikim. Lê hikûmeta tirkan nahêle, naxwaze kurd xwedî fen û hêz bibin.”⁶⁹

⁶⁹ H.b. r. 33

Ji malika 106an heta 188an “Mem û Zîn”ê weşandîye.

8. NAVEROKA HEJMARA HEFTEM

Hejmara heftan, bi daxwaznameya çarem dest pê kiriye. Di ser nivîsa vê daxwaznameyê de peyvikên rêzgirtina ji Siltan Evdilhemîd re hatine derxistin. Yanî êdî rasterast li hember wî têdikoşe. Êdî rasterast ji Siltan re dibêje tu bûyî pêlîstoka destê zaliman. Pênc birayên min ên ku xwestine ji ber vê zilmê birevin herin welatê xwe Kurdistanê, te ew wek mêrkujan girtine avêtine zîndana Taşkişlayê û bi wan êşkence dikî. Min vê rewşê ji çapemeniya biyanî, derdorên siyasî û çavkaniyên ewlekar bihîst, ez ne ji ber zilma li ser birayên xwe lê ji ber rewşa ku meqamê xelîfetiya mînaka başî û edaletê ketiyê, heliyam.

Dipirse, “ev zilma ji aliyê esil mitribê Ebuddelal û derdora wî Paşayê bi navê Osman ve li ser malbata min a asilzade tê meşandin gelo li kîjan edalet û hîkmetê tê? Eger ev êşkenceyên li ser birayên min bo anîna min a Stenbolê be, ez sond dixwim ku ez wek lepên şêr ên derbexwarî her bihêztir dibim. Ew êşkence tu car nikarin bandorê li kurê wî bavê qehreman ku bi bavê te Evdilmecid re şer kiribû, bikin.”⁷⁰

Piştî daxwaznameyê ayeta Qur’anê ya li ser qenciya xebatê dinivîse. Bi vê referasnsê dide zanîn ger kurd bixebitin dê halê wan baş bibe, mihtacê kesî nabin û ji feqîriyê xelas dibin. Rewşa kurdan û yên din dide ber hev û kêmaniya kurdan ji wan re dike fedî. Behsa pêşketina rûsan dike ku dixwazin Kurdistanê bidin ermeniyan. Dinivîse sedemê vana jî ew Ebulhuda ye ku neyarê malbata Bedirxaniyan e. Daxwaz ji kurdan dike da bixebitin nezan nemînin. Lewra heger nexebitin nezan bin dê welatê wan ji wan bistînin bidin ermeniyan.

Ermenî jî wek kurdan mezlûm in. Ew dixwazin xwe ji bin zilma dewletê xelas bikin. Hûn jî wek wan li hember zilmê rabin lê şerê ermeniyan nekin.

Hedîsa Pêxember dinivîse ku Misilman bira ne, divê dijmintiya hev û bêtifaqî nekin, alîkariya hev bikin. Tu kes ji hev nekujin. Li ser vê mijarê gelek nesîhet dike, gotina Îmamê Şafîî ya ku dibêje ez li hemû welatan geriyam, min rewşa xweş û

⁷⁰ H.b. r. 35

nexweş ceriband û dît ku piştî dîn herî xweş dewlemendî; piştî kufrê herî nexweş jî feqîrî ye.

Evdirehman Bedirxan gotiye, gelî kurdno! Xwedê, Pêxember û Îmam gotinên qenc gotine, rêya rast nîşê me dane. Ger em guh bidin wan, dê aqûbeta me qenc be. Dîsa hedîsek ji sehabîyek bi navê Enes dibe referansa wezîfeya aliman û bang li alimên kurdan dike ku bo medrese li Kurdistanê bêne çekirin bixebitin. Mînaka arnawudan dide ku bo avakirina dibistanan û şandina mamosteyan gelek zehmet kêşane û biserketine. Ji kurdan re dibêje hûn jî bixwazin, eger nedan şûrên xwe bigirin bi zorê bistînin, jiber ku ew mafê we ye. Mînaka Melayek bi navê Mihemed dide, ew ji Bedlîsê radibe tê Stenbolê bo ku Siltan wî bike mamosteyê dibistana Bedlîsê lê Siltan wî nekir. Ez hêvî ji kurdan dikim ku kesên zana yên wek wî bi tekoşîna xwe ya li hember dewletê bikin mamoste.

Mînaka girava Girîdê dide ku berê di destê misilmanan de bûye, paşê ketiye destê filehan, dema ku misilmanên Girîdê arîkarî ji dewletê xwestin dewletê arîkarî nekir. Bi vê mînakê balê dikişîne ser metirsiya dagirkirina Kurdistanê ji aliyê mosqofan ve û ji kurdan re dibêje bixebitin da ku hûn karibin welatê xwe biparêzin.

Di vê hejmarê de şeş malik ji “Mem û Zîn”ê girtiye. Ji malika 189an heta malika 194an.

9. NAVEROKA HEJMARA HEŞTEM

Piştî çar hejmar li ser hev destpêkirinên bi daxwaznameyên ji Siltanê re, vê hejmarê bi “Bîsmîllah”ê dest pê kir. Ya dîn jî referansên ayetan di vê hejmarê de (pênc ayet) ji heft hejmarên berê zêdetir in. Ayeta yekem pesnê aliman dide û mealê wê ev e: “Qet alim û cahil wek hev dibin!” ayeta duyem jî pesnê aliman dide: “Xwedê payeya bawermend û aliman bilind dike.” Ayeta sêyem wiha ye: “Alim ji Xwedê ditirsin.” Ayeta çarem wiha ye: “Ew tiştên ku Xwedê daxistiye kesên ku bi wî hikum nekin ew jî rê derketî ne.” Bi vê ayetê ji kurdan dixwaze ku li hember memûrên fasiq rabin. Ayeta pêncan jî “La’neta Xwedê li wan kesên ku rêya rast vedişêrin e.” Aîsa nebaşiya memûran derxistiye pêş.

Di vê hejmarê de çar hedîs jî hene. Hedîsa yekem pesnê aliman dide: “Alimên umeta min wek pêxemberên kurên Îsraîl in.” Hedîsa duyem li ser xwestina zanînê ye: “Xwestina zanînê li ser hemû bawermendên jin û mêr ferz e.” Ya sêyem bênavber xwestina zanînê yanî ji qumatekê heta gorê ye. Hedîsa çarem a vê hejmarê pesnê xizmeta ji qewmê xwe re dide, mezinên qewman xizmetkarê wan in.

Di vê hejmarê de nameyek bi zimanê erebî ji Elîyê kurê Huseynê Amedî hatiye. M. Emîn Bozaslan di dema transkirîpê de wergerandiye kurmancî. Gelek pesnê rojnameyê û Evdirehman Bedirxan dide. Zimanê rojnameyê ji xeynî ayet, hedîs û nameya Elî hemû bi kurmancî ye. Name li gor daxuyaniya rojnameyê ji Mêrdînê hatiye şandin lê leqeba bavê Elî “Amedî” ye, yanî ji “Amedê” ye, ger ev ne Amêdiya Başûrê Kurdistan be.

Bi kurtî dîroka mîrên Cizîra Botan dinivîse. Wek di hejmara yekê de kalikên mîran bi Xalidê kurê Welîd ve girêdabû. Ji Xalid mîrektî tê Mîr Silêmanê kurê Xalid, Mîr Evdilezîz, Mîr Seyfedîn, Mîr Mecdudîn, Mîr Îsa, Mîr Bedredîn, Mîr Evdal û Mîr Îzedîn.

Di vê hejmarê de, şeş malikên ku di hejmara berê de hatibûn nivîsîn dubare nivîsiye, belkî jiber ku destpêk e dubare kiribe. Bi tevî hev 46 malik hatine nivîsîn. Yanî ji malika 189an heta malika 234an.

10.NAVEROKA HEJMARA NEHEM

Piştî “Bismîllah”ê vê hejmarê bi biwêjeke ereban dest pê kiriye: “Rutbet’ul-îlmî e’le’r-ruteb.” ku tê de pesnê zanînê tê dayîn. Bang li mîr û axayên kurdan dike ku divê hûn rûmeta zanîn û zanayan bizanin. Dide zanîn ku gunehê nezanan jî di stûyê mezinên wan de ye ku ew jî mîr û axayên wan in.

Di vê hejmarê de sernavek “Welat-Weten”nivîsiye ku tê de balê dikişîne ser rewşa welatê kurdan, Kurdistanê. Xelkê welatek çiqas bi hêz bibe ew welat jî ewqas bi hêz dibe. Balê dikişîne ser hilweşîna Mîrektiya Botan û dibêje niha dewleta Osmanî bixwîna kurdan wek maran dimije. Welatê kurdan wek gewdeyek birîndar bêhal maye. Haya we mîr û axayan ji xelkê kurd nemaye.

Hedîsek Pêxember ji bo li hember zaliman rabûnê tîne û dixwaza li hember dewleta Osmanî rabûnê û welatê xwe rizgarkirinê dike. Bang li alimên kurdan dike ku van nesîhetên di rojnameyê de ji xelkê nexwendî re bixwînin wan agahdar bikin.

Di vê hejmarê de jî balê dikişîne ser rewşa Girîdê û xemsariya dewleta Osmanî ku tu alîkarî nedaye misilmanên wêderê. Dewletên ne misilman alîkariya filehan kirine; zilm û zordestiyê li zarok, jin û kalan kirine. Dîsa bi biwêjeke erebî balê dikişîne ser girîngiya edaletê : “Sebat’ul-mulkî bî’l-edl”. Gelî kurdno! Hûn baş bizanin, ger memûrên bêedalet bi destê dewleta Osmanî, Evdilhemîd rêkiriye ser we lazim e hûn li ber wan rabin. Kurdistan ne welatê wan e, welatê we kurdan e. Siltan Evdilhemîd li kêfa xwe mêze dike. Tirk jî ji wî nerihet in. Ayeta Qur’anê ya ku mealê wê ev e: “Xweda edaletê emir dike” aniyê û dibêje kesê emrê Xweda neyne cih asî ye. Divê misilman hember rabin û di bin destê asîyan de nemînin.

Di vê hejmarê de jî behsa mîrên Cizîra Botan didomîne. Mîrektî ji Mîr Îzedîn tê Mîr Evdal, Mîr Îbrahîm, Mîr Şeref, Mîr Bedîr, Mîr Kek Mihemed, Mîr Şerefê kurê Bedredîn, Şah Elî Beg, Bedir Begê kurê Elî Beg bûne mîr. Em ê di beşa dîrokê de berfirehiya van mîran binivîsin.

Di vê hejmarê de 51 malik, ji malika 235an heta malika 285an hatine weşandin.

11.NAVEROKA HEJMARA DEHEM

Piştî hejmarên heşt û nehan, dîsa daxwaznameyek ji Evdilhemîd re dinivîse û dibêje ku ez bi hinek bertîlan ber bi Stenbolê ve tême vexwendin. Di her du daxwaznameyan de, behsa nebaşîya derdora Siltan kiriye û niha balê dikişîne ser pênc xalan ku ew jî ev in:

1-Divê bînavber Ebulhuda ji wezîfeya ku êdî zerarê dide siltan Evdilhemîd bi xwe jî, her karên nebaş li ser navê Siltan dike, bê dûrxistin.

2-Sê pa girtiyên li girtîgeha giştî ya zabitan, bi tevî ku çend meh in girtîne, hê nizanin bo çi hatine girtin û derneketine ber dadgehê jî. Berpirsiyarê vê jî Serokzabit Xelîl Şerîfê merivê Ebulhuda ye. Ji bo xirabiyên Ebulhuda veşêre herkesî davêje

hebsê, heta dergevanê Ebulhuda Şêx Sadiqê bêguneh jî avêtine hebsê, ji ber ku xirabiyê wan li der ve gotine. Gelek kesên wek wî bêguneh an di girtîgehê de ne an jî hatine nefî kirin.

3-Wek li jorê jî hat pêşkêş kirin divê derdora Ebulhuda bêne darizandin, wek mînak, bi tevî ku şahid û îsbata hêrîşa li ser Emîn Begê ku êvara yekşema heştemîn a gulana romî pêk hatibû bi destê Osmanê merivê Ebulhuda hatiye kirin, him kesên hêrîşkar ku li gor qanûn du sal seza dixwarin lê hatin berdan him jî Osman hat terfîkirin.

4-Jiber vê rewşê her ku diçe hezkirin û mezinahiya xelîfetiya Osmanî û pê re ya hemû misilmanan dihele û diqede.

5-Ji bo ku qewmê kurd ji başiya perwerdehê fayde bibîne û ez pê debara xwe bikim ev rojnameya Kurdistanê ku demeke ez diweşînim, ger hikûmeta we ya qedirbilind minasib bibîne bo belavkirina li Stenbolê maf bide min, min ev nivîsî.

Padîşahê min,

ez van daxwazan bo agahdarkirina we ji zilma li ser xêrxwazên mîleta me ku dewleta Osmaniya bêdawî ji binî ve dilerizîne, didim. Ez ditirsim ku ev zilim zirarê bigihîjîne zatê we jî.

Piştî daxwaznameyê, balê dikişîne ser pêwîstiya bi hev re jiyanê û wiha dinivîse. “Ger meriv bi tenê bimîne dibe weka heywanan. Yanî meriv mihtacê hev e. Her yek bi karekî ve girêdayî ye. Hin cil û cawan çêdikin, hin xwarinan amade dikin, hin avahiyên ava dikin. Bi tevî pêwîstiya vê bi hev re jiyanê, pêwîstî bi nîzamek jî heye. Wek malbatan her komê serokek jî divê. Ev serokî li gor mercan diguhere. Bi tevayî civat jî wiha ye, lê divê serokê civatê jî layîqê seroktiyê be. Ger serokê mîletê ne layîqê seroktiyê be divê mîlet bi hev re tifaqek qenc çêke li hember wî serokek baştir rake, bîne li ser postê serokatiyê bide rûniştin. Ger wiha nebe ew civat her diçe lawaz dibe. Niha serokê me Evdilhemîd bîst û du sal e, li ser textê xelîfetiye rûniştiye, ji roja ku hatiye ser text vir ve her roj civata me lawaz dibe.”⁷¹

⁷¹ h.b. r. 49

Mînaka yunaniyan dide ku ew der demeke dirêj di bin destê dewleta me de bûn, lê wan jî xwe ji Osmaniyan xilas kir. Di şerê dawî yê bi wan re Padişah ferman kir ku kes çekan bikar neyne. Wan gelek misilman kuştin, misilmanan xwestin dest hilînin heyfa xwe bistînin. Fermandarên çav berda bûn rutbeyan nehîştin xelk xwe biparêze, xelkê me gelek hatin kuştin.

Di dawiya vê mijarê de balê dikişîne ser kurdistanê, ji kurdan dixwaze ku haydar bin xwe ji moskof biparêzin, an na dê moskof Kurdistanê dagir bike.

Di vê hejmarê de jî behsa mîrekîya Botan dike ku mijara piştî Bedir Begê, kurê wî Mîr Mihemed dibe mîrê Cizîra Botan heye.

Di vê hejmarê de jî ji Mem û Zînê sih û şeş malik hatine weşandin. Yanî ji malika 286an heta malika 321an hatiye weşandin.

12. NAVEROKA HEJMARA YAZDEHEM

Di destpêka vê hejmarê de bi referansa ayeta ku pesnê tifaqê dide, bang li kurdan dike û li ser tifaqa misilmanan radiweste. Dibêje tu car ji hev neqetin, nebêjin ev tirk e, ev ne kurd e. Bi van fikran meriv ji hev dûr dikeve. Hedîsa Pêxember a di vî warî de ku tê de pesnê tifaqê tê dayîn pêşkêş dike. Li virê tifaqa misilmanan li hember memûrên zalim dixwaze. Ger ev tifaq pêk neyê dê welat, dîn û namûs ji dest here. Îdîa dike ku ji sedrê azem bigire heta wezîr, walî, miteserîf, qaymeqam û heta memûrên berdestan hemû bi bertîlan tene te'yînkirin.

Mînakeke balkêş dide, bi kurtî çîrok wiha ye: Em bibêjin kesek bi navê Mehmo li Cizîra Botan hebe û pênc sed pezên wî, jin û zarokên wî hebin dê çi bibe? Di serî de ku qaymeqam bibihîze piçek Mehmo dewlemend e, dê zabitek bişîne ser wî ku xeraca pezên wî bistîne. Mehmo jî çend pezan difroşe wek xerac dide zabît û kaxizê ku xerac daye ji zabît distîne. Mehek paşê dîsa qaymeqam zabitek din dişîne mala Mehmo da ku xeraca pezê xwe bide. Lê Mehmo kaxizê ku xeraca pez daye nîşan dide û bi îsrar dibêje ez nikarim du car xeracê bidim. Dema qaymeqam bi vê rewşê dihesê, zabitan dişîne ser serê Mehmo û wî davêje hebsê, jin û zarokên wî digirîn şîn û girîn di mala Mehmo de berz dibe. Piştî çend mehên Mehmo di hebsê de diqede, qaymeqam merivek xwe dişîne balê ger pêncî zêrî bide ew ê ji hebsê

derkeve. Mehmo xeberê ji malbata xwe re dişîne, hinek pezê din jî dide firotin derdikeve tê malê. Zivistan nêz e xwarina wan û pezê wan nîn e, hinek pez difiroşe û lazimatîyan dikire. Bi vî awayî di nava du salan de Mehmoyê ku dewlemend bû şivan û gavanê wî hebûn wisa feqîr dibe nikare keç û kurê xwe bizewicîne û bi vî awayî her ku diçe welatê kurdan hildiweşe.

Piştî vê mînakê dide, bang li alimên kurdan dike ku rabin mîletê şiyar kin, hedîsa Pêxember a ku ferman kiriye, divê alim bi îlmê xwe ‘emel bikin pêşkêş dike.

Paşê bang li mîr û axayên kurdan dike, dibêje xwedî li xelkê xwe derkevin, hûn û xelkê ji hev re alîkar bin çêtir e ku hûn xelkê Kurdistanê bi zilma Siltan re rû bi rû bihêlin û ji bo du rojên dinyayê jî axireta xwe nefiroşin. Dîsa bang li alimên kurdan dike ku hedîsa Pêxember ferman kiriye eger alim li hember zilmê deng nekin Xweda gema ji agir dixê devê wan. Divê alimên kurdan xwe ji vê rewşê biparêzin.

Di vê hejmarê de jî behsa girava Girîdê dike û balê dikişîne ser dewra Siltan Evdilhemîd ku gelek deverên di destê dewleta Osmanî de wek Girîdê ji dest çûne. Dibêje ku ewha bidome dê rojek Kurdistan jî ji dest biçe. Ji alim, mîr û axayên kurdan dixwaze ku rêberiya kurdan bikin nehêlin Kurdistan ji destê kurdan here.

Balê dikişîne ser hedîsa Pêxember a ku xeteriya alimên ji rê derketî derdixe ber çavan. Ev hedîs wek malika Celaledînê Romî ku tê de tê gotin ku xetereya alimên ji rêya heq derketî weka şûrê tûjê di destê dizan de ye.

Piştî gelek nesîhetan ayetek Qur‘anê tîne ku Xweda gotiye: “Ez bi izzet û celala xwe sond dixwim, ew ê ku mezlûmek bibîne û neçe alîkariya wî ez ê heyfa xwe jê bistînim.” Di nivîsa xwe de, bang li kurdan dike ku xwe ji kuştina ermenîyan bi dûr xînin û divê hûn alîkariya wan bikin, bi taybetî hûn jî mezlûm in.

Di beşa dîroka mîrên Botan de, behsa Mîr Mihemedê kurê Mîr Mihemed, Mîr Ezîzê kurê Mîr Kek Mihemed û Mîr Mihemedê kurê Mîr Evdal dike.

Di vê hejmarê de, 40 malikên “Mem û Zînê” yanî ji malika 322yan ta malika 361an weşandiye.

13.NAVEROKA HEJMARA DIWAZDEHEM

Di vê hejmarê de, behsa Alayên Hemîdiye dike, ku li ser wan agahiyek di rojnameyekê de xwendiyê. Bi kurtî wiha bûye: Hin kes ji Alayên Hemîdiye (Nivîskar wan kurd dihesibîne) li ser karekî diçin bajarê Urfeyê, ji xelkê bajêr (Nivîskar wan tirk dihesibîne) xwestine ku ji wan re nivînan amade bikin, xwarin bidin wan û ceh jî bidin hespên wan. Xelkê Urfeyê daxwazên wan bi cih neanîne. Wan jî gotiye em merivê dewletê ne, hûn mecbûr in xizmeta me bikin. Bi şûr û tifîngan hêrîşê xelkê kirine.

Evdirehman bang dike, gelî kurdno! Ger hûn bi rastî leşkerê dewletê ne, çira dewlet we xwedî nake? Eskerê dora Siltan li Stenbolê bi goştê mirîşkan tê xwedî kirin. Ma ji we re ne fedî ye, hûn diçin ser malên xelkê ji wan cih û nan dixwazin? Madem hûn eskerê dewletê ne bila dewlet we xwedî bike, ger we xwedî nake hûn çima ji malên xwe dertên?

Li ser vê mijarê gelek nesîhet dike, ew Siltanê ku dikare zêran li eskerên xwe yên Stenbolê par vebike, çima mesrefên we nade? Armanca wî ew e ku kurdan li ber çavê dewletên dinyayê reş bike, wan kêm û nebaş nîşan bide. Mîr û axayên kurdan vê rewşê dibînin lê bo îqbala xwe dengê xwe nakin. Lê ew îqbala ku hêvî dikin jî dê di demeke nêz de wenda bikin. Ev dîtina xwe herdem dubare dike û dibêje ku wezîfeya parastina kurdan li ser milê axa û mîran e. Bo palpiştiya vê fikra xwe, helbesta helbestvanek ereb ya bi maneya şivan divê pezê xwe biparêze, lê ku şivan bi xwe gur be wê kî pez jê biparêze, pêşkêş dike.

Bang dike û dibêje, gelî kurdno! Hikûmet bo milletê wek şivanekî ye, lê mixabin ev şivan pezê xwe naparêze. Ji her alî ve neyar hêrîşê welatê me dikin, her roj perçeyek wenda dibe. Divê kurd hişyar bin an na di demeke kurt de di destê kurdan de ne dîn dimîne ne namûs.

“Di ayeta Qur‘anê de dibêje ku îtaa emrê Xwedê, Pêxember û paşê jî yê Siltan bikin. Eger siltan adîl be rast e, lê ku zalim be divê li hember rabin û di cihê wî de yekî adîl rakin. Alimên me vê heqîqetê baş dizanin lê ji ber du tiştan wezîfeya

xwe nayinîn cih. Yek ji bo îqbala xwe ya din jî ji Siltan ditirsîn. Ev her du sedem jî ne di cih de ne. Ne îqbala zaliman heye ne jî ezab ji ezabê Xwedê mezintir heye.”⁷²

Beşa duyem a vê hejmarê behsa meha remezanê ye. Di vê mehê de Siltan ji der û dora xwe re gelek zêran belav dike. Ev zêrên ku belav dike wek xerac ji xelkê distîne. Li welatê me kurdan, li Kurdistanê millet ji birçîna dimirin lê Siltan zêran ji der dora xwe re belav dike.

Piştî vê beşê behsa Xirqe-ê Seadet dike. Bi kurtî mijar ev e. Meha remezanê roja pazdehan Siltan mecbûr e here ziyareta Xirqe-ê Seadet bike. Derdora Siltan wisa wî ditirsînin ku Siltan ji tirsan nikare ji saraya xwe derkeve. Heta ji bo ku roja îne jî sarayê bo nimêja xutbê bi dûr nekeve mizgefteke biçûk li pêş saraya xwe daye çêkirin. Ji tirsan dil dike ku Xirqe-ê Seadet bîne sarayê lê aliman dengê xwe bilind kirin, li hember derketin ew tirsîya nehanî sarayê. Ev tirsonekiya Siltan Evdilhemîd ji destê derdora wî ya ku bi tirsandina wî zêrên xwe zêde dikan e. Siltanê berê ne ditirsîyan her dem di nava gelê xwe de digeriyan, rewşa gelê xwe dipirsîn, derd û kulên wan çareser dikirin. Di pêşîya leşkerên xwe de şerê dijminan dikirin. Siltan Evdilhemîd mirtib li dora xwe dane hev, her roj hinek milkê misilmanan dikeve destê dijmin.

Di vê hejmarê rojnameyê de behsa destdirêjiya çar filehên bûlgar li ser jinên misilmanan dike û pesnê misilmanên arnawid dide ku vê bênamûsiyê qebûl nakin, radihêjin çekê xwe dixwazin her çar bûlgaran bikujin, qaymeqamê wê derê pê dihesê wan kesan bi cilê eskeran di nava eskeran de vedişêre. Lê arnawid belav nabin her wan dixwazin. Paşê yekî ji wan li derve dibînin û dikujin.

Dîsa behsê tîne ser Girîdê û dibêje ku yekcarî ji destê misilmanan derketiye. Êdî waliyê wirê yunanî ye. Her dem heqaretê li misilmanan dike.

Di vê hejmarê de li ser mîrektiya Cizîrê behsa Mîr Şerefê kurê Xan Evdal tê kirin ku di sala 1055an de bûye mîr.

⁷² h.b. r. 56

Di vê hejmarê de, ji “Mem û Zînê” çil malik, ji malika 362yan heta malika 401ê hatine weşandin.

14.NAVEROKA HEJMARA SÊZDEHEM

Ev hejmar jî bi daxwaznameyek ji Siltan Evdilhemîd re dest pê kiriye. Lê ev daxwazname ji daxwaznameyên din cuda ye. Rasterast nameya ku ji Diyarbekirê hatiye, li ser daxwaza xwedîyê nameyê piştî ku werdigerîne tirkiya osmanî di nava daxwaznameyê de pêşkêşê Siltan Evdilhemîd dike. Heta vê hejmarê, di rojnameya Kurdistanê de, tu nameyek wiha dirêj û dubare cih negirtibû. Kurdiya nameyê jî piştî daxwaznameyê di rojnameyê de çapkiriye. Ev name ji mezinê Diyarbekirê hatiye. Herfên serê navê xwe nivîsiye ku Ş. M. ne. Di serê nameyê de, pesnê Evdîrehman û bavê wî Mîr Bedirxan dide. Paşê pesnê milletê kurmanç dide. Pesnê rojnameya Kurdistanê dide û eleqeya mezin a kurdan bo wê dinivîse lê memûrên dewletê wê di destê kê de bibînin êşkence dikin û davêjin hebsê. Dinivîse ku serdema Mîr Bedirxan gundên kurdan ên sed malî niha deh mal mane. Hinek koçê nav ecem, hinek koçê nav tirkan kirine. Yê mane jî jar û birçî ne, li ber dîwaran dimirin.

Girîngiya Kurdistanê li hember hêrîşên mosqof tîne ziman, dibêje ne ji Kurdistanê ba wê dijmin Anatolyayê dagirkira û rewşa misilmanên tirk nebaş dibû. Ji Siltan dixwaze ku wan memûrên zalim neşîne Kurdistanê, memûrên adil bişîne an na dê Xwedayê Te‘ala vê hesabê misilmanan ji Siltan jî bipirse. Hedîsa Pêxember a ku dibêje mezinê civatê ji kesên ber destê xwe berpirsiyar in, dike referansa vê berpirsiyariyê.

Bang li Siltan dike, dibêje ey Xelîfe, li pêşiyên xwe, bav û kalê xwe bifikire, wan bi şûrê di destê xwe de li pêşiya leşkerê xwe dinyayê dilerizand. Ew herdem di nava gelê xwe de bûn lê îro tu ji seraya xwe dernakevî. Hela carekî serê xwe ji serayê derxîne da tu bibînî ku jin û zarokên belengaz ji destê memûrên zalim çawa rondikan wek baranê dibarînin û welatê kurdan Kurdistan wek ku Tîmûrleng tê re derbasbûbe çawa hilweşiyaye.

Ev nameya ku me naveroka wê vegot di daxwaznameya ji Siltan re de, wek daxwazên xwendevanek hatiye nivîsîn.

Piştî name û daxwaznameyê, bi ser navê “Ulemayên Kurdan re Xîtabek” ku bang li alimên kurdan kiriye dinivîse, ku padîşah li ser însanan hakim e û alim jî li ser padîşah hakim in. Lê li Kurdistanê alimên kurdan ne hakimê padîşah in, ew mehkûmê memûrên padîşah in. Bi tevî ku dibînin ew memûr ji edaletê û şerî’etê dûr in jî ji bo îqbala xwe, li ber wan memûrên zalim stûyê xwe xwar dikin. Hûn dibînin ku ji vê rewşê navê we xera dibe jî dîsa hûn dengê xwe nakin. Hûn çiqas xwedî îlm dibin bibin, ger ev rewşa we wiha be, hûn tu sûd ji îlmê xwe nagirin. Çunkî hûn emrê Xweda û Pêxember naynin cih. Ger alim bi îlmê xwe emel bikin dikarin padîşah bînin ser heqiyê, çunkî padîşahê padîşahan Xweda ye. Behsa kitêba Mihemed Berkewî ya bi navê kitêba mezin û kitêba Îmamê Xezalî ya “Delîleya Îslamê” binêrin hûn ê alimên niyet xerab kî ne baş bibînin.

Ayeta ku dibêje fitne ji kuştinê xerabtir e, bo memûrên zalimên ku zilmê dikin dike referansa nebaşiyên wan û dibêje ji ber vê roj bi roj Kurdistan xera dibe. Piştî ku nebaşiya fitneyê diyar dike ji kuştinê xerabtir nîşan dide, ayetek di derbarê kuştinê de tîne ku dibêje kesê ku bawermendekî bikuje heta bi heta di dojahê de dimîne.

Di derbarê mîrên Cizîra Botan de, behsa Mîr Bedirxan bi berfirehî dike. Ew mîrê dawîn e û bavê Evdirehman Bedirxan e. Hişyariyek dide kurdan û dibêje gelek biyanî rojnameya min dikirin dixwînin. Ez hêvî dikim kurd jî vê rewşê ders bigirin hişyar bibin ew jî xwe hînê xwendinê bikin. Di dawiya pexşanê de pereyên ji Diyarbekirê 200 quriş, ji Silêmaniyê 121 quriş û ji Edeneyê 120 quriş hatine. Diyar dike ku ev jî welaperweriya Şêx Mihemed (Ş.M.) nîşan dide.

Di vê hejmarê de 25 malik, ji malika 402yan heta malika 426an hatiye weşandin.

15.NAVEROKA HEJMARA ÇARDEHEM

Vê hejmarê bi hedîseke Pêxember dest pê kiriye. Di vê hedîsê de pesnê xebatê tê dayîn û tê gotin hîmmet ji îmanê ye an xebat ji baweriyê ye. Bang li kurdan dike û dibêje kesê ji we bo welatê xwe bixebite, xwe û zarokên xwe ji bin zilma memûrên Siltan derxîne, li ba Xwedê rûmeta wî bilind dibe. Bang li kurdan dike ku

Xwedê û Pêxember, ji bo parastina mafê merivan gelek rê dane ber însan. Nûçeya çar kurdên ku di ser sînorê rûsan re borîne ji rojnameyên ewropîyan xwendîye. Rûsan ji Siltan xwestîye ku wan kurdan terbiye bike an na ew ê wan terbiye bikin. Bi vê nûçeyê balê dikişîne ser hişyariyên xwe yê ku di her hejmara rojnameya xwe de dinivîse û dibêje ku kurd hişyar nebin dê rûs welatê wan dagir bikin.

Dinivîse ku rewşa Siltan li ber çavan e. Ew alîkariya tu kesî nake. Mînakî Girîdê dide ku hema bêje Siltan bi destê xwe Girîdê radestê Yunaniyan kiriye. Di serdema berî Evdilhemiîd de gelek keştiyên dewleta Osmanî hebûn, bi wan, dewletê welatê xwe diparast. Lê ji ber ku Siltan bi gelê xwe ne ewle bû, ne hişt van keştiyan bêne parastin hemû xera bûn. Di şerê yunaniyan de, keştiyên yunan zora dewletê birin û Girîdê bi dest xistin. Hin caran Siltan diyariyan dide wan kesên ku dibin sedemê ji destçûna gelek beşên welat.

Nameyek ji Mela Salihê Cizîrî hatiye ku tê de pesnê Evdirehman Bedirxan û malbata Bedirxaniyan tê dayîn. Ji zehmetiya hatina rojnameyê gazinan dike û dibêje bi vê rojnameyê dê herdem navê te li rûyê dinyayê hebe. Li ser rawestina Evdirehman a perwerdehiyê kêfxweşiya xwe tîne ziman û dibêje mixabin ku derfeta perwerdehiyê li welatê kurdan kêm e. Gazinan ji dilnexwaziya Siltan bo kurdan dike. Ji derdora Siltan a xerab gazin dike û dibêje ji malbata Bedirxaniyan pê ve tu hêviyek kurda nemaye. Di nameya xwe de dibêje xwezî ev rojname berî deh salan derketana, lê dîsa jî baş e û dema kurdan hatiye hêvî dike ku ev xebat her berdewam be. Ev rojname hemû başiyan dinivîse, lê mixabin Siltan başiya kurdan naxwaze. Hemû welat pêşketine bes Kurdistan paş ve maye. Sebebê vê jî ew bêeslê Ebulhuda û yê wek wî ne. Li Stenbolê bi hezaran kurd hene lê mixabin yek derbeyek lê nade ku em jê rizgar bibin. Di dawiyê de dinivîse gelo ev nivîs dê bigihîje rojnameyê û hêvî dike ku Mîr bersiva wî bide.

Di vê hejmarê de bi guherînên hindik û bi tirkî nivîsa li ser Mîr Bedirxan dinivîse.

16. NAVEROKA HEJMARA PAZDEHEM

Di vê hejmarê de, guherînek heye, ew jî ev e ku heta niha ya bi daxwaznameyê ya jî bi “Bismîllah”ê dest bi nivîsê dikir lê ev hejmar bi banga, “Gelî Kurdno!” dest pê kiriye. Ji kurdan re dibêje ku min heta niha ji serî heta dawîya rojnameyê behsa memûrên zalim ên ku hikûmetê dişandin ser we dikir. Dibêje ku ez ê di vê rojnameyê de behsa nezaniya wan bikim. Min berî çend rojî mînakê di rojnameyekê de dît. Çend sal berê Siltan, Namiq Paşa wek walî şand Trablûsxebê. Mîhrabên mizgeftan ne ligorî qibleyê bûn. Hinek kesan ev çewtî dîtin û ji Namiq Paşa xwestin ku rast bike. Lê wî ev çewtî ji nezani û îrada xwe rast nekir. Misilmanan ji rûyê wî çewtî nimêj kirin.

Jiber van zalim û nezanan xelkê Şam û Trablûsxebê misilman ber bi welatek Afrîkayê bi navê Merakeş/Mexrîb (Fas) ve direvin. Heta ku direvin hikûmeta xwe ya qedîm biguhêzin çêtir e. Bang li aliman dike ku rêberiya gelê xwe bikin da wan ji zilmê xelas bikin. Ger alim bi îlmê xwe emel nekin dikevin xizmeta zaliman ku ew jî kufir e. Behsa ferza hecê dike û dibêje bi vê ferzê misilman hev dinasin. Bi şertê ku edaleta siltan hebe. Ger tunebe tu ewlehiya misilmanan namîne. Wek ku roja îne misilman hemû di nimêjê de bin û yek bê hemûyan li ser nimêjê bikuje. Jiber zilmê bûyerên wiha pêk tên. Mînakê bijîjkê bi navê Emîn Paşa dide ku ji Siltan hêrs dibe dixwaze wî bikuje lê bi ser nakeve, Siltan wî dide kuştin.

Dîsa behsa hikûmeta rûsyayê dike ku li xelkê kurd gefan dixwe ku wek welatê Çerkez û Efxanan Kurdistanê jî dagir bike. Behsa nameyek ku ji Mûsilê hatiye dike. Di nameyê de hatiye nivîsin ku eşîrên derdor, xelkê Mûsilê talan dikin û aboriya wan xera biye. Navê lawên Şêx Nûrî û Mistoyê Mîra dide ku bi wan navê kurdan xera dibe. Bang li mîr û axayên kurdan dike ku bi vî awayî navê kurdan tê pîskirin. Bi talanê tu kes sereder nebûye. Gelek şîretan li kurdan dike û dibêje ku kes bi talanê negihîştîye armanca xwe û bi ser neketiye. Lewra der û cîranên talankaran ji wan zirarê dibînin û dema belakî were serê wan kes di hawara wan naçe. Helbestek Sadî ku bi farisî ye, li ser nebaşîya kesên ku ji der û cîranê xwe re nebaş in, diherin helakê ye.

Di dawiyê de behsa îhtîmala ku Siltan bi xirabiyên Ebulhuda hesiyabe û bera wî bide dike. Lava ji Xwedê dike ku demek zû Siltan bera wî bide û misilman ji xerabiyên wî xelas bin. Di beşa dîrokê de behsa Selahedînê Eyûbî û malbata wî dike. Di vê hejmarê de 44 malik, ji malika 427an heta malika 470yan hatine weşandin.

17.NAVEROKA HEJMARA ŞAZDEHEM

Vê hejmarê bi sernivîsa “Îtîzar”ê dest pê kiriye. Lêborîn xwestin bo derengmayîna rojnameyê ye. Dinivîse ku sê rojname bo pêşeroja miletê û carcaran jî kitêb bi hev re li welatekî frengan çap dibin. Ev rojname û kitêbên derdikevin hemû bi tirkî ne, rojnameya Kurdistanê tenê bi kurdî ye. Ji ber ku van rojan gelek kitêb çap bûn loma rojnameya min dereng ma. Dinivîse ku ew tenê di çapxaneyê de dikare herfên kurdî rêzbike û wî bo pêşeroja welat, terka welatê xwe kiriye. Her misilman dixwaze Dewleta Osmanî li ser pîyan bimîne, lê ew bi rêveberiya xerab nexweş e. Divê em wê tedawî bikin, sebebê nexweşiyê ji holê rakin. Saxiya dewletê saxiya me ye, mirina dewletê mirina meye. Padîşahê nebaş ji canewer xerabtir e, lewra canewer dikare çend kesan bikuje, lê padîşahê xerab kare hemû civatê bibe xerabiyê. Çawa meriv xwe ji jehra marekî diparêze, divê meriv dewleta xwe ji amir û memûrên xerab biparêze. Dîsa behsa feqîriya miletê û îsrafa padîşah û wezîrên wî dike. Feqîrên ku jê alîkariyek bixwazin bi wan re dixeyîde û wan ya hebis dike ya jî nefî dike. Her nebaşî dike, pereyê miletê davêje bankayan û faîzê dixwe û dibêje ez xelîfeyê Pêxember im. Tiştê ku Siltan ji seraya xwe re serf dike ji ya hikumdarê îngilîzan bêtir e.

Mînaka Îmam Elî ku kesek bi şev hatiye ba wî tiştêk giştî pirsîye, Elî li ber findê bersiv daye. Paşê ew kes tiştêk şexsî dipirse Îmam Elî findê ditefine, wê demê ew kes pirsê tefandina findê dike. Îmam Elî jî dibêje find ne ya min e. Ez nikarim bo şexsê xwe û te serf bikim. Hinek mînakên din yên xelîfeyan bi başî dide û rewşa îro rexne dike. Behsa mesrefa hespên bêfayde û keçên ku di serayê de hemû jiyana wan derbas dibe dike.

Balê dikişîne ser derdora wî ya ku ji wan kesên mirtibên wek Ebuddelal û dibêje li cihê ku guhdariya van nebaşan dike, “ger jiyana xelîfeyên Îslamê bişopîne dê baştir karibe welatê xwe bi rê ve bibe. Ev rewşên em pêşkêş dikin, her kes dizane.

Gelek rojnameyên tirkî hene van rewşan tînin ziman.”⁷³ Jiber ku kurd li derdorê Stenbolê ne Evdîrehman dixwaze bi rojnameyê kurdan hişyar bike. Bang li mîr û axayan dike ku ji bo zewqa dinyayê wezîfeyên xwe naynin cih, hedîsa Pêxember a ku dibêje evîna dinyayê serê hemû çewtiyan e, bibîr bin. Bi vê hedîsê dide zanîn kesê ku bo zewqa dinyayê wezîfeya xwe neke, ew ê ne axreta xwe tenê belkî دنیا xwe jî wenda bike. Amanca ji evîna dinyayê ew e ku evîndariya mal û milk nahêle başiya merivan bifikire, an na xebata di rêya başiyê de dostaniya Xwedê ye, ev jî hedîs e.

Pîştî van şîretan nameya ku ji Şêx Hesenê Serokê Komeleya Başkirinê li Trablûşamê (Lubnanê) hatiye, pêşkêş dike. Di serê nameyê de pesnê xwediyê rojnameyê dide. Ji wî re lava ji Xweda dike ku ev karê hanê bibe destpêka pêşketina îslamê. Di dawiya nameyê de, dinivîse ku ev name ya hevnasîn û spaskirinê ye.

Bi sernivîsa “Hewadîs”ê, behsa Bosnayê dike. Ev cih jî weka gelek cihên din ji destê Dewleta Osmanî hatiye derxistin. Ketiya destê Awusturyayê. Rewşa zilma li ser misilmanên wirê, li ber çavan radixe. Di dawiya nivîsê de bang li kurdan dike: “Gelî Kurdno! Çavên xwe vekin! We îlla ev halên ha ê bînin serê we jî! Hêviya roja xwe bin!”⁷⁴

Di vê hejmarê de, bi tevê malikên ji bîrbûyî (malika 476 û ya 503) divabû 42 malik, ji malika 471ê heta malika 512an bihata weşandin. Lê 40 malik weşîyane.

18.NAVEROKA HEJMARA HEVDEHEM

Di vê hejmarê de, em dibînin ku êdî peywendiya rojnameya Kurdistanê, bi rojnameyên ku bi tirkîya Osmanî derdikevin re, zêde dibe û Evdîrehman Bedîrxan wiha nivîsîye: “Nav Cerîdeyên berê de min ji we re nivîsî ku wek cerîda min gelek cerîdeyên tirkî jî hene ku li hire, li Misrê û li hin welatên di derdikevin.”⁷⁵ Bi awakî berfireh pesnê van rojnameyan tê dayîn. Dibêje ku Siltan çî qas zilma xwe zêde dike nikare pêşiya başan bigire.

⁷³ h.b. r. 72

⁷⁴ h.b. r. 74

⁷⁵ h.b. r. 75

Perîşaniya her cure komên civatê tîne ziman, wek mînak zabitek leşkeriyê bi navê Fuad diçe ba mareşalê berpirsiyarê pêwîstiyên leşkeran û mafê leşkerên xwe dixwaze. Mareşal bi vê tevgera serleşker hêrs dibe, lê ji îsrara Fuad Begê û leşkerê wî ditirse ku serhildanek leşkerî pêk bê, lewma dengê xwe nake. Difikire ku paşê yek bi yek wan sirgûn bike. Di her beşên civatê de, xerabiyên ku tîne aqilê Siltan û derdora wî hatine kirin.

Dinivîse ku meriv zarokên biterbiye dibîne, dizane ku bav û dêyên wan xwey terbiye ne. Meriv civateke biterbiye dibîne, dizane ku mezinên wê civatê biterbiye ne. Gazinan ji xerabiya civata dewlemendan dike ku sebebê wan jî Siltan bi xwe ye. Dewlemendiya wan jî bi malê xelkê ye. Dinivîse ku diz bi şev dizî dikin, lê derdora Siltan bi roj dizî dikin. Xelkê misilman hemî jar û perîşan in. Di cihê ku xelk zarokên xwe bişînin dibistanan bi xwe re dibin alîkariya xwe ya cotkariyê û civata misilman nikare zarokên xwe di rêya Xwedê û Pêxember de bida xwendin.

Hinek li ser pergala serayê disekine. Di serayê de kî nivîsek bi dizî di eleyh kesek de binivîse ku ji Siltan hesnake, kesê nivîs nivîsiye bi gelek diyariyan tê pêşwazî kirin û ew kesê nivîs di eleyhiya wî de ye jî tê sirgûnkirin ku nizane çima hatiye sirgûnkirin jî.

Me di serî de nivîsî ku di vê hejmarê de, behsa rojnameya Osmanî tê kirin. Helbestek bi sernivîsa “Paris’e Muvasetat”, ji rojnameya Osmanî hatiye girtin ku tê de pesnê kesên hatine sirgûnkirin dide. Ev nivîs bi tirkîya Osmanî ye û wek helbest bikêşan e. Di 10ê Tebaxa 1897an de, di rojnameya Osmanî de hatiye weşandin. Di şazdeh hejmarên berê de, ji derveyê daxwaznameyên ku ji Siltan re hatibûn nivîsîn Tirkîya Osmanî tune bû.

Dîsa mînaka Girîdê dide ku ji ber nebaşîya Siltan misilmanên Girîdê ketin bin destê yunaniyan. Behsa zilma wan dike ku Rûsya dixwaze sê hezar ermenî bişîne Girîdê ser erdê misilmanan û bang li kurdan dike ku hay ji xwe hebin da welatê wan Kurdistan nekeve destê rûsan.

Di vê hejmarê de, dîsa bi tirkîya Osmanî nameyek hatiye çapkirin. Ev name bi îmzeyê “Bir Kürd” ji Kurdistanê hatiye şandin. Tê de hatiye nivîsîn ku xwîner ji

hejmarek pê ve hemû hejmarên rojnameya Kurdistanê birêzê xwendiyê. Gelek pesnê Evdirehîm daye. Paşê pesnê mileta kurd dide û bi esil kurdbûna helbestvanekî wek Fuzûlî û serleşkerê wek Selahedînê Eyûbî dike delîla pêwîstiya hişyarkirina kurdan.

Bi van her du nivîsên tirkîya Osmanî em dibînin ku êdî rojnameya Kurdistanê hevkarîya xwe ya bi Cemîyeta Îtîhad û Teraqîyê re xurttir dike.

Di vê hejmarê de, 31 malikên “Mem û Zînê”, ji malika 513an heta malika 543yan hatine weşandin.

19.NAVEROKA HEJMARA HEJDEHEM

Di vê hejmarê de, tê ragihandin ku êdî dê di rojnameya Kurdistanê de zimanê tirkî jî were bi kar anîn. Di hejmara hevdehan de du nivîsên xwendevanan bi tirkî hatibûn weşandin. Bi kurdî di bin sernivîsa “Tebîx”ê de û bi tirkî jî dibin ser nivîsa “Tebîğ-i Mahsûs”ê de Evdirehman behsa xwarziyê xwe Fewzî Beg dike ku ji ber nebaşî û zilma mareşal û serleşkeran ji pîşeya xwe ya leşkeriyê kerixiye û dê di nivê rojnameya Kurdistanê ya beşa tirkî de bibe alîkarê wî. Vê guherînê jî bi daxwaza xwendekarên ku nikarin bi kurdî bixwînin û fam bikin re girê dide. Di roja me de jî ev hincet pir tê bihîstin.

Kurtenivîsek li ser dîroka kurd û Kurdistanê di bin sernivîsa “Îcmal” de hatiye çapkirin. Di nivîsê de didazanîn ku ji du hezar salî zêdetir e, kurd li welatê xwe ne. “Cîranê wan ecem peyva kurd bi maneya mîrxas û dilawer bikar tînin. Bi tevî van taybetiyên kurdan hikûmetek serbixwe ava nekir û ew her dem bûne pêlîstoka cîranên xwe. Piştî hilweşîna eceman kurd ketin bin destê Îskender. Dû re sasanî, paşê ereb bûn hakimên Kurdistanê. Di dema Siltan Selîmê yekem de kurdan bi daxwaza xwe bi Dewleta Osmanî re tifaq çêkirin. Di dawiyê de kurd û arawudan berawird dike ku kurd nezanên misilmanên Asyayê ne û arawud jî nezanên misilmanên Ewropayê ne, lê arawudan bi gelek dibistanan xwe ji nezaniyê xelas kir. Kurd hê jî dîlê memûrên zalim ên ku Siltan Evdilhemîd dişîne ser wan in.”⁷⁶

⁷⁶ h.b. r. 80

Di kurtenivîseke din a bi kurdî de, ku bi ser nava “Hewadîs”ê hatiye nivîsîn, behsa tîrsa Evdilhemîd ji rojnameyên mixalîf dike. Wek mînak behsa mehek berê hatina Ehmed Celaledîn Paşa ya Ewropayê dike ku ji bo bi bertîlan îqnakirina wan bûye. Dibêje ku hemû hewldanên Evdilhemîd bêencam man.

Nivîseke dirêj bi tirkî li ser xirabiyên hikûmetê û di encama wan xirabîyan de tiştê ku hatine serê Fewzîyê xwarziyê Evdîrehîm nivîsiye. Behsa têkçûna Teselyayê, ji wirê çûna Edîrneyê û vegera Stenbolê dike. Paşê ji mecbûrî çawa ji welat reviyê hatiye Ewropayê dinivîse. Bi ser nivîsa “Di Rêya Genêveyê de” behsa pêşketina Bulgaristanê dike û dilê xwe bi rewşa kurdan dişewitîne.

Di vê hejmarê de 34 malik, ji malika 544an heta malika 577an a “Mem û Zînê” hatine weşandin.

20.NAVEROKA HEJMARA NOZDEHAN

Hejmara Nozdehan Wenda ye

Me gelek hewl da ku em vê hejmarê jî bi dest bixin. Nûçeyek li ser dîtina vê hejmarê li pirtûkxaneya Kongreya Amerîkayê derket. Em bi peyketin me nedît. Li Londonê jî çend dostan lêkolîn kir, lê encam heta niha tune. Hinek kes dibêjin gelo ew nehatiye weşandin? Li gor dîtina min ew hatiye weşandin, sedem ew e ku em dizanin 15 malikên “Mem û Zîn”ê, ji malika 578an heta malika 592yan, divê hatibe weşandin. Hejmara bîstan ji malika 593yan dest pê kiriye. Di hejmara 21ê de berdwama nivîsek ku di hejmara 19an de weşiyaye heye.

21.NAVEROKA HEJMARA BÎSTEM

Di vê hejmarê de, ji çar rûpelan sê bi tirkî ne, bes rûpelek bi kurdî ye, ew jî 27 malikên “Mem û Zîn”ê û çend rêz pexşan e ku tê de rewşa Dewleta Osmanî ya berê û niha tê berawirdkirin.

Balkêşiyek di daxwaznameya vê hejmarê de heye, ew jî ew e ku daxwazname wek nameyek vekirî bi nav kiriye. Di rêzên pêşîn de dinivîse ku bi rewşeke şaşker hesiya ye û dê bi rêya rojnameyê li ber çavê Siltan raxîne. Di berdwamiya vê nivîsê de dide zanîn ku ew dê karê nelirê yê Siltan û derdora wî bi hev re dikin biselîmîne û

bandora wî ya xerab derxe holê û ji Siltan tika bike ku dest jê bikêşe. Bi vê rê dê millet ji vê rewşê agahdar bibe.

Behsa şerê Transvalê dike ku di navbera Îngilîz û Holandayê de pêk hatiye. Bo têkçûna Îngilîz li derdora Ladysmitê, Siltan ji Şahbanûya Îngilîzan re telgrafa sersaxiyê dişîne. Ji ber dostaniya Dewleta Osmanî û Dewleta Îngilîzan, birayê Evdirehman Xalid Seyfulah hestiyar dibe, 4-5 hezar⁷⁷ kurdên dixwazin herin alîkariya Îngilîzan bi fetwaya miftî dicivîne dibe ber balyozxaneyê Brîtanyayê, bi vê tevgera kurdan Balyozê Îngilîz kêfxweş dibe, lê dibêje ku destûra wî ya qebûlkirina leşkerên dilxwaz tune ye. Komeleyek ku bes ji Stenboliyan pêk tê jî heman serlêdanê dike û heman bersivê digire. Tevî ku bi dilxwazî piştgiriya vî şerî dikare wek piştgiriya Siltan jî bê hesibandin. Lê kesên xerab yê derdora Siltan bo berjewendiyên xwe tevgera hanê wek li hember Siltan derketine pê didin bawerkirin û 8-10 rojan davêjin zîndanê. Nahêlin Qur'anê jî bixwînin. Ji ber zilm û zorê kurê Doktor Husnu Paşayê Behriyeyî dîn dibe û kesek din jî seqet dibe.

Dema balyozê Brîtanî bi vê rewşê dihesê, bi ber dikeve dixwaze Stenbolê terk bike, li ser vê helwesta wî girtî tîn berdan, lê nameyek wek ji Siltan re spasdîr in, bi wan didin îmzekirin. Xalid Seyfulah Bedirxan îmze nake û nayê berdan. Bi daxwaza balyoz rojek paşê tê berdan. Ev bûyer wek mînakê bîdadiya Siltan hatiye nivîsîn.

Nivîseke dirêj bi tirkî jî kopiya muxtira Serokwezîrê berê Seîd paşa ye ku du sal berê bi boneya pîrozbahiya salvegera destpêka Siltaniya Evdilhemîd hatibû pêşkêşkirin. Di vê nivîsê de, Serokwezîr Seîd ji Siltan re dide zanîn ku gelek pê re rast e, lewma jî jê re pêşniyazên bo başiya dewletê û Siltan bi xwe dike. Hinek rexneyên balkêş dike, wek çawa haya biyaniyan ji planên Rûsya û Fransa yê li ser xirabiya Dewleta Osmanî heye û ya wî tune ye, tevî ku Dewleta Osmanî di tengasiya aborî de ye, ew çawa kare zêr û xelatên biha li derdora xwe belav bike? Di bersiva van pirsan de dide zanîn gelo Siltan bes xwe difikire ku samana wî heta sax be têra wî dike? Ger wisa be, ev tê wê maneyê ku dema Siltan tîk biçe ji destê xelkê mezlûm ne tenê nikare samana xwe belkî nikare jiyana xwe jî biparêze.

⁷⁷ Rohat Alakom, *Eski İstanbul Kürtleri*, Weşanên Avesta, Stenbol 1998 (r. 15)

Piştî van rexne û hişyariyan gazin ji pêwendiya Siltan a bi xwe re dike û dibêje ku ew mecbûr maye xwe bavêje bextê balyozxaneyê Îngilîzan. Di her deverî de ev rewşa wî ya xerab ji aliyê Siltan û derdora wî ve, li rûyê wî hatiye xistin.

Ev nivîs di vê hejmarê û ya dû de hatiye beşkirin. Di dawiya vê beşê de, bo selametiya welat daxwaza sepandina “Qanûnê Esasî” dike. Didezanîn ku ew ne ji Osmaniye Nû ye, lê di nava Lijneya Wezîran de kesek bikêrhatiyê ku karibe Qanûnê Esasî bicih bike tune ye.

Bi tirkî dîsa beşek bi sernivîsa “İcmal”, heye ku tê de behsa rewşa Stenbolê dike. Bi zimanekî edebî zilma rêveberiyê bi metaforan li ber çavan radixe. Dinivîse ku li Stenbolê bahozên siyasî dest pê kirine, dilên birîndar wek çiyayên volkanîk li ber teqînê ne. Bahozan girtiye ser derdor û xwelîya ku ji girên pûç û xerabe radike dikeve çavên zaliman, wan li hev şaş dike. Dûkela xwînî ya ji rondikên mezlûman li asoyên bilind ên ku destê zaliman nagihîjê ewrên reş û tarî afirandine. Bi kombûna van ewran êdî îro bahozê dest pê kiriye. Gotina “xayîn tirsonek in” dîsa hatiye cih, zaliman dest bi girtina rêber û pêşengên xelkê kirine. Lê dibêjin tirs pêşiya ecel nagire, dê rojekî xelkê mezlûm bi hev re rabe ser pîyan û van zaliman ji ser stûyên xwe bavêje.

Hewadîs:

Dîsa bi tirkî bûyera reva zavê Siltan Evdilhemîd Mehmûd Paşa, ji Stenbolê ber bi Parisê ve hatiye nivîsîn. Bi çend hevokan pesnê wî tê dayîn. Elî Heyderê kurê Mîdhet Paşa, bi pêşkêşa kurtejiyana bavê xwe berhema wî ya bi navê “Welatên Osmaniye: Rabirdû û Dahatûya wan” weşandiye. Ev nûçe di rojnameya “Heq” de hatiye xwendin. Di nûçeyê de dinivîse ku pereyên ji firotina kitêban bi dest bikevin bo Osmaniye Nû hatîne terxankirin. Ev pirtûk li hemû şaxên Osmaniyan û buroyên rojnameya “Heqê”, rojnameya me ya “Osmanî” peyda dibe.

22. NAVEROKA HEJMARA BÎST Û YEKEM

Hejmar bi sernivîsa “Îstanbûl”ê, bi zimanê kurdî dest pê kiriye. Ji hejmara 18an pê ve piraniya rojnameya Kurdistanê bi tirkî ye. Ev hejmar jî ji nivî zêddetir bi tirkî ye.

Di hejmara berê de jî behsa rewşa siyasî ya Stenbolê bi zimanê tirkî kiribû. Vê carê bi kurdî mijara ku ji Siltan re wek nameya vekirî şandibû derdixe pêş. Girtina birayê xwe Xalid Bedirxan, midaxeleya Balyozê Îngilîz û bêdadiya Siltan dinivîse. Bang li kurdan dike, dibêje ev Siltanê ku dibêje ez Xelîfe me, nahêle Qur‘an bê xwendin, ka çawa Xelîfe ye.

Beşa “Mem û Zîn”ê ya ku di vê hejmarê de hatiye weşandin 16 malik e. Ji malika 620an dest pê dike, malika 621ê hatiye ji bîr kirin, heta malika 635an di vê hejmarê de heye.

Di berdeewama nivîsa hejmara berê ya Seîdê Serokwezîrê berê de, xuya dike ku Dewleta Osmanî di tengasiya aborî de ye û Siltan jî her ku diçe mehaneyên wezîran zêde dike. Bi vê hêşyariyê dixwaze bide zanîn ku ew berjewendiya dewletê di ser her tiştî re digire. Dibêje ku ez li mala xwe ya ku derdora wê bi sîxuran dorpêçkiriye, ji ber vê rewşa dewletê ya xerab roj bi roj dihelim. Bi tevî ku dizane her nivîsa wî, dê di aleyhiya wî de bê bikaranîn jî dîsa hîşyariya ku ji xwe re wek wezîfe dibîne bi cih tîne.

Nivîsek Omer Fevzî ya ku ji kovara “Turkîya’da Askerlik”ê hatiye girtin, bi tirkî heye. Di vê nivîsê de behsa beşek artêşê ku bi navê “Nîzam-i Cedîd” hatiye avakirin, dike. Rexne dike, dibêje zêde xwepêşandanê bikêrê çi tê? Ger sazkarê vê pergalê îro rewşa ku ketiyê bidîta dê qehir bibûya. Zêde fedakariya leşkerên welatperwer tu tişt di vê beşa artêşê de nemaye. Bûye aletê dsethilatdaran ku wek aşê leşkerên welatperwer dihêre, ji taqet dixîne û davêje bê ku wan derman jî bike.

İSTANBUL’DAN ŞİRKET-İ BAĞIYE

(19’uncu nüshadan mabâd)

Ev nivîs jî diselimîne ku hejmara 19an çap bûye lê hê jî wenda ye. Mebest ji şîrketa neheqiyê ew e ku Wezîrê Hêzên Deryayê bi navên taybet şîrketek ava dike û ji vê şîrketa xwe keştiyan bo Îdareya Mexsûsêya Dewletê ku saziya karê keştiyan e, bi perekî zêde kirê dike û wî perê davêje berîka xwe. Rojnameya Kurdistanê li ser vê gendeliyê dûr û dirêj radiweste, bang li xelkê dike dibêje her tişt li ber çavan e, kerem kin li hember vê gendeliyê derkevin.

Di dawiya vê hejmarê de gelek pesnê Mehmûd Celaledîn Paşa tê dayîn ku piştgiriya azadîxwazan dike. Behsa nameya wî dike ya ku ji Ahned Rizayê yek ji serokên Cemiyeta Îtîhad û Teraqiyê ye ra şandîye. Di nameyê de ew vexwendiyê bi hev re xebata hevpar. Rojnameya Kurdistanê jî dixwaze nîşan bide ku ew jî piştgiriya vê xebatê dike.

23.NAVEROKA HEJMARA BÎST Î DUYEM

Ji hejmara hejdehan ku tê de daxuyaniya dê nivê rojnameyê bi tirkî be tê dayîn, vir ve; piraniya rojnameyê bi tirkî ye û bûye wek rojnameyên din ên tirkan ku li hember Siltan Evdilhemîd têdikoşin. Di serê vê hejmarê de, bi sernivîsa “Îstîrad” bi kurdî nivîsek heye. Êdî rojnameya Kurdistanê dest avêtiye vegotina diroka şerê serokwezîrtiya Osmaniyan. Ev nivîsa bi kurdî jî bi çîroka Elî Heyderê kurê Mîdhet Paşayê tirkan dest pê kiriye. Pesnê Elî Heyder tê dayîn ku gelek bi teferu’at bûyera bavê xwe pêşkêş kiriye. Evdirehman mebesta xwe ya vê nivîsê wek ku ji bo xelk rûyê Evdilhemîd bibînin nîşan daye. Di berdewamiyê de behsa ji text dîrxistina Evdilezîz û di cihê wî de anîna Siltan Miradê Pêncem ser text dike. Newxeşî û dînîtiya Siltan Mirad û hewldanên rihetkirina Siltan ji aliyê Mîdhet bi alîkariya bijîjkê Awusturyayî ji bajarê Vîyanayê bi navê Ledîstrof, tê vegotin. Dek û dolabên Evdilhemîd bo hatina ser text, bi Mehmûd û Redîf Paşayan re peyman çêdike. Ev çîroka Mîdhet bi kurdî di sê jimarên din de jî domandiye.

Di vê hejmarê de neh malik, ji malika 636an heta malika 644an ji “Mem û Zîna”a Ehmedê Xanî hatine weşandin.

Di beşa tirkî de bi ser navê “Îdare-i Maslahat” ve “Îş‘ar-i Ahîr” nivîsek heye. Di vê nivîsê de behsa mafê her hikûmetê tê kirin ku divê bo parastina welatê xwe

miletê xwe nîzam û întîzamek wê ya adîl hebe. Li gor şert û mercan ev diguhere. Pesnê hikûmetên adîl tê dayîn û hikûmeta Siltan Evdilhemîd a ku bi “îdarekirina rewşê” û li benda “îşareta dawîn” mayînê edaletê bînpê dike, tê rexnekirin. Dîsa mînaka şerê navbera Osmanî û Yunanî tê dayîn ku bi vê helwesta hikûmetê her der ji destê Dewleta Osmanî derket. Ev nivîs bi navê Bahriyeli Riza hatiye weşandin.

MÛLÂHAZA

Di bin vê ser nivîsê de, pesnê “Meclîsa Mebûsan” tê dayîn ku bi hewldanên Mîdhet Paşa hatiye damezrandin û di demeke kin de bi hîleyên Siltan Evdilhemîd hatiye hilweşandin. Di civîna meclîsê de Evdilhemîd li mebûsan heqaret dike. Kopîya mameya Raûf Paşa ya ku ji Mîdhet Paşa re li ser vê mijarê şandiye, di nava arşîva Elî Heyderê kurê Mîdhet Paşa de, Evdirehîm Bedirxan dibîne û diweşîne.

SURET-Î MEKTUP

Wek her nameyên wê serdemê bi pesnê kesê ku name jê re diçe (Mîdhet Paşa) dest bi nivîsê hatiye kirin. Wek me di serê vê hejmarê de jî nivîsî êdî nivîsên rojnameyê piraniya wan tirkî ne, ji destê mixalîfên Siltan derketîne, wek vê nameyê ku ji aliyê Raûf Paşa ve hatiye nivîsîn. Naveroka nameyê jî li ser berberiya paşayan bi hev re ye. Siltan jî hêrs dibe û hêrîşê mebûsan dike. Ev jî bi dîtina xwediyê rojnameya Kurdistanê tê maneya hêrîşa bi ser milletê ve, lewma nivîsiye. An na ev bûyera zêdeyê bîst sal berê bûye, nabe mijara rojnameyê û tarîxa li ser nameyê (Sibata 1878an) jî bîst û du sal berî tarîxa vê hejmara rojnameyê nîşan dide.

HAVADÎS

Di bin vê sernivîsê de du bûyer hatine nivîsîn. Yek bi navê “Millet Gözünü Açtı” ku tê de behsa reva du prensên lawê Mehmûd Paşayê zavê Siltan tê kirin. Tê gotin ku Siltan hêrs bûye û gotiye sedemê vê bûyerê lêbikolin. Bersiva Siltan ji aliyê nivîskarê nûçeyê ve tê dayîn: Êdî milletê çavê xwe vekiriye, azadî û edaletê dixwaze, yanî jiyanê dixwaze. Bûyera duyem jî bi navê “Sadrazamlık Yarışı” ye. Tê nivîsîn ku Memdûh Paşayê Wezîrê hundir, dixwaze Serokwezîr Xelîl Rifat daxîne û ew cihê wî bigire. Lê di vê mijarê de meyla Siltan bi ser Tewfik Paşayê Wezîrê Karê Derve ve ye. Li gor gotegotek din jî dibe ku alimek hîlbijêre da wan bike alîkarên xwe.

24. NAVEROKA HEJMARA BÎST Û SÊYEM

Vê hejmarê bi berdewamiya vegotina bûyera Mîdhet Paşa dest pê kiriye. Di dawiya wê beşê de lihevkirina Siltan, bi Mehmûd û Redîf Paşayan re hatibû nivîsîn. Wan jî dînîtiya Muradê Pêncem di nava mîletê de belav kir. Lê gotegot jî ser negirt. Paşê Evdilhemîd bi balyozê Rûs re rewşa dînîtiya birayê xwe parvekir. Ji Balyozê Rûs Agnatyefî xwest ku hemû balyozan bicivîne da ku bawernameyên xwe pêşkêşê Siltan bikin. Li ser vê rewşê Mîdhet Paşa xwest ku Evdilhemîd heta ku Murad baş dibe, bibe Siltan lê dema baş bû dîsa Siltaniyê bide birayê xwe Murad. Evdilhemîd ev qebûl nekir lê ji Mîdhet Paşa Qanûnê Esasî xwest. Bi vê helwesta Evdilhemîd, Mîdhet jî hêvîdar bû. Piştî ku Evdilhemîd cihê lingê xwe çêkir, gazî Mehmûd û Redîf kir. Şer bi Dewleta Rûs re deranî berê mîletê da şer û Meclîsa Mebûsan girt, Mîdhet Paşa jî bi daxwaza Rûsan şande sirgûnê.

Di vê hejmaarê de, 18 malikên “Mem û Zîn”ê, ji malîka 645an heta malîka 662yan hatine weşandin.

GARABET-Î HÎLKAT

Pesnê aqilê ku Xwedê ji bo başiya merivan daye dide. Di nava aferîdeyan de, meriv bi aqilê xwe bextewer e. Lê hin meriv hene ku ji sewalan jî xerabtir in. Dema sedemê van nebaşîyan bê lêkolîn divê şertên ku ev tevgerên nebaş tê de derketine jî li ber çavan bêne girtin.

Ev vegotin jî bo nirxandina rewşa Siltan Evdilhemîd tê sepandin. Siltan û bavê wî Evdilmecîd dide ber hev û dibêje diva bû ku ew jî wek bavê xwe baş bûya. Lê mixabin ku Evdilhemîd ne ji bavê xwe tu xisûsiyetên baş, ne jî ji şertên baş ên ku tê de mezin bû başî girt. Her dem bi dek û dolaban derdora xwe xapand. Jiber vê taybetiya wî em lava ji Xwedê dikin ku lingek zû vê xulqeta xerîb (Siltan Evdilhemîd) ji ser dilê mîletê rake.

25. NAVEROKA HEJMARA BÎST Û ÇAREM

Vê hejmarê bi îlana ku dê rojnameya Kurdistanê ji niha û pê ve, ji mehê carek derkeve, dest pê kiriye. Heta vê hejmarê ji pazdeh rojan carekê derketina wê dihat

nivîsîn yanî wek rojnameya pazdeh rojî bû lê carna ji heft mehan zêdetir diket navbera du jîmaran. Balkêşiyek din jî, di vê hejmarê de peyva “azîne” li serîya navê Kurdistanê hatiye nivîsîn. Kurmanc îro vê peyvê di wateya "metod"ê de bi kar tînin. Baş nayê famkirin ka ev peyv çima û bi çî wateyê li wir hatiye nivîsîn. Di hejmarên din de, di cihê wê de sala rojnameyê hatiye nivîsîn, weku "sala ewwulî" yan jî "sala diduyê". Gelo ev peyva "azîne" encama şaşîya çapê ye?

Di vê hejmarê de li ser bûyera Midhet Paşa behsa pereyê nû dike. Siltan tewsîsata xwe bi pereyê nû qebûl nake û zêran digire. Midhet Paşa pê dihesa û dixwaze zêran paş ve bide, pereyê nû bigire. Siltan wek wî nake ew jî diçe mala xwe û dev ji Serokwezîriyê berdide. Siltan dibêje were ser karê xwe ez ê wek te bikim. Lê dema tê, mora serokwezîriyê jê tê sendin û nefiyê Îngilîstanê tê kirin. Paşê dibe waliyê Girîdê û herî dawî waliyê Şamê ye.

Di vê hejmarê de 13 malik, ji malika 663yan heta melika 675an, ji “Mem û Zîn” hatine weşandin.

Îlana bi kurdî bi tirkî jî hatiye nivîsîn. Di vê îlanê de sedema derengmayîna rojnameyê wek barkirina ji Cenevê bo Londonê hatiye nîşandan. Lê hejmara bîst û sêyem li Qahîreyê derketiye. Diyar dike ku ji niha û pê ve dê ji mehê carek li Londonê derkeve.

Di beşa bi sernivîsa “Cûlûs-ı Şeametme’nûs”de behsa xirabiyên Evdilhêmîd dike û ji Xwedê lava dike ku wî zalimê ji ser text bavêje. Dibêje Xwedêyo bo çî vî zalimî ji ser text navêjî? Bo çî mîletê ji zilma wî xelas nakî? Meriv dikare bibêje ku ev nivîs rexneya herî tûj e ku li Siltan Evdilhêmîd, di rojnameya Kurdistanê de hatiye kirin.

Di beşa tirkî de sernivîsa “Kürdistan ve Kürtler” heye. Di vê nivîsê de behs tê kirin ku kesek çiqas jêhatî, baş û wêrek dibe bila bibe ger şans, talih û si’ûda wî tune be tu tişt bi destê wî nakeve. Gelek mînakên wiha wek kesan hene. Netewa kurd jî wek netew xwedî gelek taybetiyên giranbiha ye. Bi tevî ku netewa kurd ji gelek jîr, mêrxas, camêr, azadîxwaz û fedakaran pêk hatiye jî dike nake heta vê sedsala ku werara şaristanîyê gihîştîye lûtkeyê jî nagihîje azadiya xwe ya neteweyî.

Li ser welatê kurdan wiha dinivîse: “Îro kurd xwediyê erdên mezin ên ku ji Loristana ku eyaletê Îranê ye, heta Xarpûtê(Xarpêtê) û heta navçeya Qûrnayê ku lê çemên Ferat û Dicleyê digihîjin hev, dirêj dibin in; wekî din li cihên cuda yên Anatolia û Îranê û heta li Belûcistan, Rûsya û Afganistanê jî êlên kurdan ên belavbûyî hene. Li gor texmîna zanyarên Îngilîzan ên ku xwedî agahiyên rewşan bêkêmanî ne, nifûsa kurdan çar mîlyon e. Bi tevî ku bi awayê pêwîst sînorên siyasî yên kurdan nehati be diyarkirin jî îro li hinek cihên kevin ên Asûristan û Medan niştecih bûne. Herêma ku bajarên Erzirom, Diyarbekir, Mûsil, Herêma Erdelanê ku li ser Ecemistanê ye û axa Kermanshahê, Zaba Jêrîn, Bedlîs û Batmanê digire nava xwe û derdora gola Wanê cihên ezeli yên gera vê netewa egît bûne”⁷⁸

Di vê nivîsê de derbarê destpêka dîroka kurdan de agahiyên zanistî nîn in. Di Zendê de navê kurdan wek “Kardu” derbas bûye ku eceman maneya egîtî û mêraniyê lê barkiriyê. Di derbarê kurdan de du lêkolînerên Îngilîz bi navê Rîkh û Sir Hanry Lyard agahî didin. Di dema ku kurdan misilmantiyê qebûl kiriyê de Dewleta Eyûbî û Merwanî avakirine.

HAVADÎS

Di bin vê ser nivîsê de, nûçeyek wek pesnê Îsmail Kemalê ku hatiye Ewropayê tê dayîn. Dibêje em bi hêvî ne ku dê hewldanên wî bo miletê çêbibin. Nûçeya duyem jî di derheqê gera Ahmed Paşa li Ewropa û Amerikayê ku jiber nezaniya wî bêencam maye de ye. Dê di atolyeyên Alman ên li Kielê ne de bo çêkirin û sendina şeş keştiyên şer lêkolîn bikira. Bo du keştiyan peyman sandinê bi karxaneya Ansaldo re hatiye çêkirin lê ku bertîl tune be nayên sandin. Di dawiya nûçeyan de Evdilhemîd, bo ku nehîştîye top jibo merasima cenazê Qral Humbert, ji aliyê keştiyên balyozxaneyan bêne avêtin tê rexnekirin.

26.NAVEROKA HEJMARA BÎST Û PÊNCHEM

Di vê hejmarê de dawiya bûyera Mîdhet Paşa hatiye nivîsîn. Li Şamê jî xebata Mîdhet hezkirina xelkê Şamê jê re anî. Lê Siltan dîsa xwest wî bide kuştin. Bi ser neket. Tayîna wî da Îzmîrê. Li Îzmîrê di bin femandariya Hilmî Paşa de dor ji

⁷⁸ h.b. r. 103

mala Mîdhet Paşa hat sandin, lê Mîdhet Paşa reviya ji destê wan xelas bû û xwe avêt balyozxaneyê Fransayê. Bi bertîlan Siltan, Fransayê îqna kir û li Îzmîrê avêt hebsê. Ji wirê jî anî Stenbolê bi tawana ku birayê wî Siltan Evdilezîz kuştiye dadgeh kir. Bi bertîlên Siltan dadgeran jî biryara dardekirina Mîdhet Paşa dan. Piştê dadgehê xeber şiyand ji Mîdhet re ku destê wî maç ke û lêborîn bixwaze dê wî efû bike. Lê Mîdhet Paşa serî li ber Siltan netewand. Siltan jî wî nefiyê Taîfê kir. Li wêderê dostekî Mîdhet bi navê Îbnureşîd xwest wî ji hebsê birevîne, lê bi ser neket. Siltan Waliyê hîcazê Safwet ji wezîfeyê avêt û Osman anî cihê wî. Bi emrê Siltan Mîdhet paşa di hebsê de hat xeniqandin.

Di vê hejmarê de 18 malik, ji malika 676an heta malika 693yan, ji “Mem û Zîn”ê hatine weşandin.

Rojnameya Kurdistanê ji ber hin pêwîstiyên ji Londonê jî vediguheze Folkstonê. Ev agahî wek îlan di destpêka beşa tirkî de, hatiye dayîn.

KÛRDLERE

Di bin vê sernivîsê de, bang li kurdan tê kirin ku baş guhdariya van gotinên wî bikin. Ji bo xwe dibêje ku ez kurê wî kesî me ku bo parastina azadî û bextewariya kurdan canê xwe feda kiriye û ez jî di wê rê de li Ewropayê dixebitim. Bi kurtî şîretên wî ev in:

Li Ewropayê, tiştek heye min diêşîne ku jiber nezanîna ewropayîyan ji hin rewşan derdikeve holê. Ew jî şerê ermenîyan e. Ji ber vî şerî ez nizamim çima hûn kurd tînin tawanbarkirin? Sedema vî şerî ew e ku ermenî dixwazin welatê kurdan Kurdistana delal ji xwe re bikin cihwarê kêf û seyranê, bi vê mebestê li Ewropayê çî dikin ez dibînim. Bi tevî vê rewşê jî mafê we yê beşdariya şerê ermenan tune ye û li Tirkîyeyê her kes bi xebata xwe kare hin tiştan bi dest bixe. Hûn bizanin ku tu car li welatê me “Ermenistan” nikare bê avakirin. Madem wisa ye, jiber çend çete û xeraban ger hûn jî bi zilm û zora dewletê re hevparî bikin dê rêya dagirkirina Kurdistanê li ber Rûsyayê vebibe. Hûn dizanin ku Evdilhêmîd nikare tiştek baş bike. Rewşa berî wî û ya niha bidin ber hev hûn ê bibînin ku ew nikare tiştek bike. Dîsa dibêje ku divê kurd xwedîti li ermeniyên ku xwe davêjin bextê wan bikin. Li cihê ku

şerê ermeniyan bikin divê li hember hikûmeta zalim rabin. Bang li kurdan dike û dibêje bav û kalên me ne wiha bûn, dema ku lekeyek bihata ser dîn û şerefa merivan, bi her awayî li ber xwe didan û hêrîş radiwestandin. Balê dikişîne ser xetera ku dibe axa nava deryayên Reş û Spî bikeve destê Rûsyayê. Di vê rewşê de bersivdana hêrîşên ermeniyan yên li Kurdistanê sivik dimîne.

Dîn ketiye nav destûpiyan em tişkî nakin. Hedîsên Pêxember têne xerakirin, kes pê tev nagere, ji kesên feqîr pê ve kes leşkeriyê nake. Hûn bi şerê ermiyan, zêde aletbûna zilma hikûmatê û dizîya memûrên zalim bikêrê tişteki nayên. Hûn bi fermana “Zekî Paşa”yê mezinê Alayên Hemîdiye van karan dikin, lê baş bizanin ku bi vî karî hûn mezin nabin, berevajî wê hûn pê biçûk dibin. Ew dema karê xwe bi we biqedîne dikare li serê çiyakî Kurdistanê we daleqîne û malbata we birçî bihêle.

Wek lijneyek bi hikûmetê re hest nîn e; ew lijne wek kevir û daran e. Bi vî şerê ermenan çi dikeve destê we? Bi tevî ku hûn demek di nava xweşiyê de dijiyan, niha wek hemû osmaniyan hûn jî di nava tunebûnê de dijîn. Divê hûn feqîrên ermeniyan biparêzin. Ji rûyê çend çeteyan divê hûn nehêlin du milyon ermenî zerarê bibînin. Divê hûn dijminahiya kesên nebaş bikin.

Kurdno! Wek hûn dizanin Evdilhemîd ji herî xerabên ermeniyan re efû çend car derxist, lê ji kesên ku dibêjin dînê me welatê me ji dest diçe re tu car efû tune û wan davêje çolistanên Afrîkayê bo ku wan ji holê rake. Ji ber vê zilma Evdilhemîd bûyerên ermenan tune tînin hesibandin.

Hûn ji ber memûrên zalim merivatiyê ji bîr dikin. Ew her dem bi xerabiyê re ne. Hûn nebin aletê xerabiyê. Hûn malê xwe bidin kesên feqîr ku malê wan tê talankirin. Hûn canê xwe feda bikin bo kesên ku bi neheqê hêrîş tê ser wan. Belkî van memûrên zalim ji we fedî bikin. Ma ne fedî ye hûn bi teşwîqa Zekî Paşa konê waliyê Erzeromê bidizin? Ger rojek Zekî Paşa tanq û topan bişîne ser we hûn ê wê gavê dest têkin kêlekan. Hinek sereokên Alayên Hemîdiye ji piştgiriya Zekî Paşa har bûne, li cihê ku xelkê xwe biparêzin wan stûxwar dikin, ev bi şerefa netewî ya kurdan nakeve.

Di nava kurdan de gelek kesên jîr û zana hene. Divê her kes ji wan sûd bigire. Gelek aletên hêja bo xizmeta merivan derketine ji wan sûd bigirin. Ji bo dahatûya xwe bixebitin. Tiştê herî baş ew e ku hûn ji bo xwe karên baş bikin. Alîkariya herî baş meriv bi xwe re dike û du risteyên tirkî nivîsiye ku maneya wan bi gotina pêşiyar “Çavê li deriya xwelî li seriya” re li hev tê.

HAVADÎS

Di vê hejmarê de nûçeya hatina Evdilhelîm Memdûh Begê wergêrê bajarê Aydinê ku dozdeh sal e li sirgûnê ye, bo Londonê heye. Gelek pesnê wî ji hêla zanîna gelek zimanan ve tê dayîn. Tê gotin ku dê bi şarezatiya xwe gelek xizmeta millet û welat bike.

27. NAVEROKA HEJMARA BÎST Î ŞEŞEM

Ev hejmar bi daxwaznameya ku meriv kare bibêje rasterast rexname ye, ji Evdilhemîd re dest pê kiriye. Di serî de behsa biryara dadgehek taybet a bi fermana Evdilhemîd hatiye damezrandin dike ku bê dîtina wî di heqê wî de biryar daye. Ev biryar, her kesek xwedî wijdan nerihet dike, lê jiber ku ev biryar bo welatperwerî û miletperweriya min hatiye dayîn ez pê şanaz im, dibêje Evdirehîm Bedirxan. Paşê behsa malbata xwe dike, rexne li derdora Siltan dike û dibêje bi guhdarîkirina van kesên xerab Siltan bi xwe jî biçûk dibe. Di derheqê kesên ku li Ewropayê bo azadiyê dixebitin de, ji Siltan re dibêje ku jiber zilma memûrên te, heta jiber xerabiyên te û rizgarkirina canê xwe reviyane Ewropayê. Bi ser de jî tu radibî wan bêîfade mehkûm dikî. Ew kesên ku te dixin vê rê xerabiyê te dixwazin. Ristekê bi farisî li ser kesên ku zilim li wan tê kirin nivîsiye: “Her kê zehmetî xord, elbette fîganî daret.” Î dibêje divê ku Siltan ji vê agahdar be. Di dîrokê de gelek mînak hene ku vê rêbaza xwezayî piştrast dîkin. Hawarnekirina ji ber zilmê ne mimkun e; kesên ji ber zilmê birîndar bin, bêhemdê xwe hawar dîkin. Her kesek xwedî wijdan dema vê hawarê dibihîze, wek ku Xwedê jî xwestiye destê alîkariyê dirêjê mezlûman dike. Her ku zilma te zêde dibe, tu jî ber bi dawiya desthilatdariya xwe ve diçî.

Evdirehman Bedirxan bi kurtî behsa perwerdehiya xwe dike ku me di beşa kurtejiyana wî de nivîsiye. Dibêje ku şeş-heft salan wezîfeya seroktiya Rêveberiya

Lîseyan ên Wezareta Perwerdehiyê kiriye. Bi tevî ku daxwaza wî ya taybet xizmeta miletê bûye, ji ber zilma ku maran jî ji jiyanê sar dike, ew dev ji vê wezîfeyê berdide û derdikeve Ewropayê. Ji Siltan dipirse, kesê ku memûrtî, mehane û malûmilkê xwe bihêle; ew qas evîndarê azadiyê be û here Ewropayê, gelo bi desteserkirina we ya malûmilkê wî vedigere Stenbolê?

Ji Siltan re dibêje ku tu ji aliyê Xwedê ve wek xizmetkarê mileta xwe hatî wezîfedarkirin, lê tu miletperweran tawanbar dikî, ez tenê hedîsa Pêxember a “Kî mezlûmek bibîne û alîkarî neke, Xwedê lînet lê bike” tînim bîra te. Dibe ku tu rojek li xwe varqilî, ez bi vê hêvîyê te vedixwînim edaletê û bîryara derheqê xwe de jî nas nakim.

Di hejmara bîst û pêncan de, di beşa tirkî de behsa şerê ermenan kiribû. Di vê hejmarê de bi sernivîsa “Kurdan Re”, heman mijarê dinivîse. Ez naxwazim heman mijarê dubare bikim. Bi kurtî balê dikişîne ser hin çeteyên ermeniyan ku dixwazin li Kurdistanê “Ermenistan”ê avabikin û dibêje ku tu car ew nikarin biserkevin. Bang li serokên Alayên Hemîdiye jî dike ku guhdariya Zekî Paşa nekin û bi wî ewle nebin.

Di vê hejmarê de 18 malik, ji malika 694an heta malika 711an, ji “Mem û Zîn”ê hatine weşandin. Ji hejmara bîst û duyem vir ve, heta dawî navê berhemê “Zîn û Mem” hatiye nivîsîn. Meriv tînegihîje gelo ev xeletîyek teknîkî ye an tiştek din e?

KÜRDLER VE ERMENİLER

Di bin vî sernavê de, di serî de, sedsala nozdemîn tê nirxandin. Ji aliyekî ve dê sed sala 19. wek sed sala şaristaniyê, ji alîyekî ve jî wek sed sala ku çaryeka wê bi serdema Evdilhemîd hatiye qirêjkirin were bibîranîn. Ji ber vê qirêjê divê ne layîqê navê kesên xizmetkar û parastvanê merivatiyê be.

Paşê jî nepakîya Siltan wiha tê pêşkêş kirin: Ev Siltanê ku li gor gotina nepak a “dabeş bike û bi rê ve bibe” tev digere, naxwaze du bira ji hev hez bikin, bi hev re bimeşin. Mînak du gelên wek kurd û ermeniyan ku ji berê de ji hev hez dikirin, bi fesadiya wî, îro hatine wê rewşê ku ji hev nefret dikin.

Em bifikirin, ev çend sal e, ji ber daxwaza Siltan a xwînreji û mêrkujîyê, bi bandora nezanî û ehmeqîyê çiqas can û mal hatin tune kirin û fedakirinê, çiqas xwîn hate rijandin.

Gelo kurdan ji ermenîyan xerabî dîtibû? Na! Ermenîyan ji kurdan çi dîtibû? Hiç! Dema em dîr û kûr bifikirin, dibînin ku bes Siltan her du gel ji rêya rast derxistine, çavên wan pêşîya wan nabîne, her ku diçin ber bi xetereya tunebûnê ve dimeşin.

Piştî van şîroveyan, dibêje, dibe ku hinek menfi'etperest îtiraz li gotinên me bikin. Lê ji bo selmandinê delîlên me yê qetî hene. Di destpêka kuştina ermenîyan de, Siltan ji hikûmetên Ewropayê yê ku xwe neqayîl dikirin re digot; kurd wehî ne, nezan in, li hember min jî radibin. Bi tevî vê rewşê jî ez ê wan terbiye bikim.⁷⁹ Gelo ev gotinên Siltan rast in? Berî Evdilhemiîd kurd û ermenî wek bira bûn. Ma piştî Evdilhemiîd bû siltan wehîti û nezaniya kurdan derket?

Li Kurdistanê, ji derveyê Alayên Hemîdiye kê zilim kiriye? Wek mînak li Diyarbekirê serokê êla "Mîran" Mistefa Paşa heye. Berî 10-15 sal şivanek bû ku jê re "Misto Keçelo" digotin. Xerabî û mêrkujîya wî bi Siltan xweş hat, ew kir serokê Alaya Hemîdiye. Ev kesê ku di xerabîyê de sînornenas e, gelo dê ermenîyan nekuje, misilmanan talan neke? Her gava şikayeta wî tê kirin, derdora Siltan wî diparêze.

Mînakek din, Emîn Paşayê êla Heyderan e. Wek di rojnameya "El-Mueyyed" de hatiye nivîsîn, ew ji kuştina ermenîyan bi mûbbed hebsê hatiye mehkûmkirin. Siltan wî efû dike. Hefteyek piştî efûyê, ew pêşengîya qetlî'ama ermenîyan li Sasonê dike. Her dem tê xwestin ku eşqîya bêne tepeserkirin. Lê li gorî min eşqîyayê ku divê bê tepeserkirin ji Siltan pê ve kesek din nîn e. Ê ku Emin Paşa efû kir ew bû. Lê wek "Qabîl" birayê xwe Muradê Pêncem efû nekir.

Wek encam, kesê hêrîşê ermenîyan dikin ew paşayên Alayên Hemîdiye merivên Siltan in. Heman hêrîşan dibin ser misilmanan jî. Çi ermenî dibe, çi kurd dibe, rêya xilasîyê bi yekîti û piştgirîyê bi dest dikeve. Ev hemû wek şîret bo kurd û ermenîyan dinivîsin.

⁷⁹ h.b. r. 111

28. NAVEROKA HEJMARA BÎST Û HEFTEM

Ev hejmar bi piranî bi zimanê tirkî hatiye nivîsîn. Beşa “Mem û Zîn”ê jî tê de nîn e. Di destpêkê de hinek kurdî heye ku bi sernivîsa “Kürtçe Kısım” hatiye dest pêkirin. Meriv kare bibêje ku rojname êdî jî serî heta dawî bi tirkî ye. Meriv dibîne ku êdî sernivîsên kurdî jî bi tirkî têne nivîsîn.

Di vê beşê de bang li kurdan dike û dibêje, hûn dizanin çiqas millet hene hemû ji bo qenciya xwe dixebitin. Lê mixabin kurdan xizmeta biyaniyan kiriye. Ev ew qas sal e hûn xizmeta tirkan dikin, we çî qencî dît? Ew qasî hikûmet li we zilim dike, dema nîşanek an rutbeyek dide we, hûn hemû zilmê ji bîr dikin. Hûn ew qas di rêya hikûmetê de hatin kuştin, lê heta niha tu merivek kurd di rêya xizmeta welatê (li virê mebest Kurdistan e) xwe de xwe nedaye kuştin. Weka ku em bo xizmeta biyaniyan hatine afirandin. Berî pênc sed salan tu tirkekî li welatê me tune bû. Ew ji welatê Tûran hatine welatê me û di welatê me de hikum li me dikin. Padîşahên wan ku hemû xwînê jî dîktator in, navê “Xelîfe” li xwe danîne û çiqas cure zilim hene tînin serê me. Lê bi rastî ew ne xelîfe ne. Ew padîşahên zalim in ku divê ji xelîfetiye bêne avêtin. Hûn vê rewşê nizanin, ji ber ku hikûmetê bi zanîn ew nezan hîştine.

Tirk û Padîşah çî navî dixwazin bila bidin xwe; lakîn Xwedê kurd ji xizmeta wan re neafirandiye. Bêguman padîşahên niha xwe li milletê nakin xwedî. Heta berî çend salan xwest bajarekî ji welatê Arnawudistanê bide dijmin. Lê arnawudan ew rewş qebûl nekir, dest avêtin şûran, stûyê xwe ji padîşah re xwar nekir û bi vî awayî welatê xwe, dîn, namûs, jin û zarokên xwe parastin. Min baş bihîstiye ku Evdîlhemîd welatê Kurdistanê bi Rûsan re soz daye. Ger hûn ji niha ve bo welatê xwe baş nexebitin, paş çend salan dê bikeve binê lingê leşkerê moskof.

Li cihê ku hûn ji bo jiyan û namûsa xwe bixebitin, hûn xwe bi xwe hev dikujin, jin û zarokên ermeniyan ên bêguneh dikujin. Pêxember gotiye “Mizgînê bidin wan kesên ku kesek bikuje dê ew jî bê kuştin”. Ger em wiha bidomînin, em tev dê bîn kuştin. Hûn bi fermana Evdîlhemîd ermeniyan dikujin. Ma fermana Evdîlhemîd ji hedîsa Pêxember mezintir e. Ji fermana Xwedê pêştir e. Evdîlhemîd dibêje ku “ermenî neyarê we ne”, we bi vê gotinê dixapîne. Ma hûn nizanin ku

ermenî nikarin neyariya we bikin. Neyarê we padîşah bi xwe ye ku welatê we bi mosqof re soz daye.

Evdirehîm Bedirxan dibêje, ez baş dizanim berî çend salan li Wanê civînek çêbû, da ermeniyan bi kurdan bidin kuştin. Di vê civînê de Şêx Ubeydulahê Nehrî li hember vê fermanê derket û got ku em îro ermeniyan bikujin sibêroj dê miletek din were kurdan bikuje.

Êdî dem hatiye, divê em bo başiya xwe û zarokên xwe bixebitin. Şerm e ku kurdên ew qas mêrxas xizmeta hikûmeta zalim bikin. Berê em jî desthilatdar bûn. Lakîn me vê desthilatdariya xwe wenda kir, em ketin bin destê beredayiyan. Bêtifaqî û neyartîya me ji hev re bûye sedema vê rewşê. Ji kurdan gelek kesên qenc û ‘adîl hene ku karin rêveberiya me bikin. Çima em di bin destê tirkên de bimînin. Kurdan tu car merivên jar nekuştine. Lakîn memûrê tirkên we xapandine û hûn jî çûne we jarên ermeniyan kuştine. Bi vê kirina xwe we navê bav û kalan reş kir.

Ji xwendevanan re dibêje ku min gelek hevdîtin bi mîr û axayên Kurdistanê re çêkirine. Em dixwazin ku hemû kurd û ermenî bi hev re tifaqek çêkin li hember Evdilhemîd bibin yek. Evdirehman Bedirxan dibêje ku bo rêberiyê ez ê yekî bişînim, hûn jî pê re bixebitin. Paşê ez ê jî ji aliyê eceman werim ser sînore Kurdistanê, bi îzna Xwedê em ê bi serkevin da cîhan bibîne ku em kurd zana ne, ermeniyan nakujin. Rast e hinek kesên pêgirtiyên Siltan hin ermenî kuştin. Bang li alimên Kurdistanê dike ku di mizgeftan de bi wazên xwe kurdan şiyar bikin.

KÛRDLERE

Di bin vî sernavî de, dîsa şîretan li kurdan dike. Bang li kurdan dike, balê dikişîne ser pêwîstiya jiyanek civakî ku her kesek ji vê civatê divê wezîfeya xwe bîne cih. Ew wezîfe jî parastina welat û miletê ye.

Bi tevî ku rewş wiha ye jî, hûn radibin bi zixtkirina Evdilhemîd û memûrên wî yên zalim, dev ji wezîfeya xwe ya civakî berdidin û di bin fermana Siltan de ermeniyên belengaz, jin û zarokên wan dikujin.

Gelî kurdno! Ji ber nezanî û xeşîmiya we çavên we rastiyê nabînin. Hûn bi nîşan û rutbeyên bêrûmet ji hişmendî û şerefa netewî bi dûr dikevin. Bi vî awayî gelek nesîhet li kurdan dike. Gelek pesnê kurdan dide ku nebin aletê Siltan bo kuştina ermeniyan. Wek Şêx Ubeydulahê Nehrî li hember fermana Siltan a kuştina ermeniyan rabin û bi ermeniyan re hevaltî bikin. Bi vî awayî hûn karin şerefa bav û kalên xwe biparêzin.”⁸⁰

ÎNTÎŞAR-I REZALET

Di bin vî sernavê de, xerabiyên Siltan tî ziman. Wek mînaka van xerabiyên nûçeya ku di rojnameya “Suisse”ê de derketiye dinivîse. Ev nûçe behsa gelek penaberên siyasî li Cenêvê dike. Evdilhemîd bo şopandina van kesan li ser hev balyozên vî bajarî ji kar davêje. Herî dawî Cihûyek Almanî bi navê Richtoven ku ji birçîna dîmir, dike cîgirê balyoz. Ev kes ne wek cîgir lê wek balyozê Dewleta Osmanî xwe dide nasîn. Siltan ji wî jî aciz dibe. Kesek bi navê Heyder ku Balyozê bajarê Jêve li Îtalyayê ye, dike balyoz. Dema tê Cenêvê muhira balyozxaneyê ji Richtoven dixwaze. Richtoven bi heqaretên mezin wî diqewirîne. Ew jî rewşê ji Siltan re dinivîse. Siltan bersiv nade. Alîkarî ji balyozê Parisê yê bi navê Munir ku berpirsiyariya balyozxaneyê Swîsîrê jî wek mikafat jê re hatibû dayîn, dixwaze. Ew jî destûrnameya Siltan û ya xwe dide Heyder, lê vê carê Richtoven heqaretên mezintirîn li wî dike û dibêje min 8000 frank bo balyozxaneyê mezaxtiye, heta pereyên min neyê dayîn ez muhira balyozxaneyê nadim.

Evdirehman Bedirxan li ser vê nûçeyê dibêje heyfa Dewleta Osmanî ku dema navê wê derbas bibûya Ewropî dilerizîn, îro ketiye çî rewşê di destê kesek sextekar de.

SULTAN MURAD-I HÂMÎS HAZRETLERÎ LÎSANINDAN

Di bin vî sernavê de şeş malik bi înzeya “Bir Cigerxûn” hatiye nivîsîn ku tê de gazinan ji tunebûna azadiyê dike. Mirinê ji dîlîtiyê baştir dihesibîne.

⁸⁰ h.b. r. 115

29. NAVEROKA HEJMARA BÎST Û HEŞTEM

Vê hejmarê bi “Îtizar”a duyem dest pê kiriye. Lêborîna yekem di hejmara şazdehan de, ji ber ku sê meh navber ketibû nava hejmara 15 û 16an bû. Li ser rojnameyê “ji 15 rojan carekê dertê” nivîsîbû. Niha jî şeş meh ketiye navbera hejmara 27 û 28an û li ser rojnameyê “ji mehê carekê dertê” hatiye nivîsîn. Lêborîn him bi kurdî, him bi tirkî hatiye nivîsîn. Ev dereng mayîn gelek caran dertê pêşiya xwendevanên rojnameyê. Bi vê lêborînê Evdirehman Bedirxan dixwaze rewşa bêderfetiya xwe bi xwendevanan re parve bike. Dema meriv li tabloya weşana rojnameya Kurdistanê dinêre dibîne ku rojname li çend welatan geriyaye û çiqas dereng derketiye. Ji hejmara 16an pê ve nivîsîna bi tirkî îlan dike lê di hejmara 25an de bi tirkî nivîsiye ku “Kurdistan rojnameyek kurdî û tirkî ye”.

Meriv kare bibêje ku ev hejmar bi taybetî li ser “Alayên Siwarên Hemîdî” rawestiyaye. Him bi kurdî him jî bi tirkî ev mijar nivîsiye. Di serî de, dibêje ku ev Alayên Siwarên Hemîdî jî wek hemû karên Siltan bi niyetek xerab hatine saz kirin. Bi vê nûçeyê dixwaze rewşa xerab li ber çavan raxîne. Balê dikişîne ser girîngiya cihê Kurdistanê.

Kurdistan li Rojhilatê Dewleta Osmanî, bi sînorên Rûs û Îranê ve ye. Îran jî wek Osmanî lawaz e, lê Rûs her dem li pey derfeta ye ku hêrîşê Dewleta Osmanî bike û Kurdistanê dagir bike. Çavê wî lê ye ku bi vî awayî xwe bigihîne Deryaya Hindî. Bi tevî van xetereyan hikûmeta Osmanî tu car sînorên rojhilat xurt nekiriye. Alayên Siwarê Hemîdî di dema hêrîşê de bo leztevgerê pêwîst in. Wek dixuyê ji pêwîstiyê bêtir ji bo xwe pêşandanê hatine avakirin. Siltan her dem çavê wî li xapandina gel e. Lê ew nikare dewletên Ewropayî bixapîne. Berî ku hêzên hêrîşê xurt bike divê hêzên parastina welêt xurt bike. Yanî parastin ji hêrîşê pêwîsttir e.

Evdirehman Bedirxan dide zanîn ku armanca esasî ya saz kirina van alayên siwarî ew e ku tifaqa ermenyan û kurdan ji holê rake. Siltan ditirse ku ermenî li hember zilma wî rabin û kurd jî piştgirîya wan bikin. Dema Zekî Paşa fikra saz kirina alayên siwarî pêşkêş dike Siltan bi niyeta fesadiya nava gelan zûzûka vê fikrê dipejirîne.

Ev bû deh sal in ku Alayên Siwarên Hemîdîye sazûne. Di vê deh salê de zilm û xerabiyên ku kirine meriv nikare salix bide. Kurdistanê kiriye sê par. Aliyek ermenî, aliyek kurdên Siwarên Hemîdî û kurdên ne Siwarên Hemîdî. Ev sê alî bûne neyarên hev. Hev dikujin, hev talan dikin. Kurdistan bûye qada şer. Lê kurd û ermeniyên ku ji rewşê haydar in, bi hev re tifaq dikin û li hember zilm û zora hikûmetê li çareyekê digerin. Li Kurdistanê her der di nava hawar û fixanê de ye, her der ji xwîna kuştîyan sor bûye.

Alayên Siwarên Hemîdî, bi her awayî hatine xurtkirin. Çi çek dixwazin ji wan re amade ne, ferman û piştgiriya Siltan herdem di destê wan de ye. Milet çiqas şikayeta wan dike bêfayde ye. Wê demê her kes dixwaze beşdarê Alayên Siwarên Hemîdî bibe, ji bo xwe ji zilmê biparêze.

Zekî Paşa bi sazkirina Siwarên Hemîdî li Kurdistanê têr nebû xwest ku li nava ereban jî Siwarên Hemîdî saz bike. Alayên Siwarên Hemîdî ji ereban jî sazkin û ew jî bi Zekî Paşa ve girê dan.

Bi tevî ku Zekî Paşa mînaka xwe ji Rûsyayê Siwarên Qazaq girtibû lê wek wan ne ji bo hêrîşê belkî ji bo xwe pêşandanê avakiribû. Femandarê giştî yê serleşkerî çiqas îtiraz kir jî Siltan guh nedayê.

Pazdeh malik, ji malika 712an heta malika 726an, ji “Mem û Zîn”ê hatiye weşandin.

HAVADÎS

Di bin vê sernavê de, nûçeyek li ser kuştina ermeniyan heye. Dinivîse ku ji ber nezanî û bêkêriya rêveberiyê, hemû hemwelatî bi hev ketine. Li ser axa ku bûyerên Sasonê li wirê pêk hatibûn, îro dîsa ji fitne û fesadiyê gel serî hildaye, leşker ew dorpêckirine, ew der dîsa bûye gola xwînê.

Dewletên jîr û zana, ne dema serhildanê bi zilm û zorê gelê xwe dorpêckidin, belkî bi xweşî û zanîn gelê xwe bi rê ve dibin.

30. NAVEROKA HEJMARA BÎST Û NEHEM

Ev hejmar bi sernivîsa “Wezîyeta Hazir û Misteqbel a Kurdistanê” dest pê kiriye. Heman nivîs bi tirkî jî bi sernivîsa “Kürdistan’ın Vaziyet-i Hazıra ve Müstakbelesi” hatiye pêşkêşkirin.

Di nivîsê de rewşa dawîn a Kurdistanê tîne ber çavan ku xerabiyên mezin çêdibin û dewleta Osmanî li holê tune ye. Ev rewş jî aliyê gel ve wek îşareta xerabiyek mezin tê dîtin. Evdirehman Bedirxan dibêje ji ber vê ez ê behsa rewşê bikim. Ev deh sal in li Kurdistanê bi fesadiya Siltan gelek kuştin bûne karek ji rêzê. Ji ber van bûyeran hêviya gel heye ku hikûmet biguhere, an na tu çare nîn e.

Ji aliyekî kurdên nezan ên ku ji rûyê hikûmetê di nava nezanîne de ne, bi tehrîka Siltan dema rastê ermeniyên tîn, wan dikujin. Heçî kurdên li hember van kuştinan derkevin ew jî ji aliyê Siwarê Hemîdî ve tîn kuştin.

Ji aliyekî din ve jî Rûsya bo berjewendiyên xwe ermenî û kurdên ku heta niha wek bira dijiyan ji hev re dike dijin.

Nivîskar li ser çar xalan radiweste: 1- Ya yekem helwesta hikûmetê ye, ku li cihê pêşiya kuştinan bigire fesadiyê dike, bêtir kuştinan teşwîq dike. Ji dewletê Ewropayê re jî dibêje ez dixwazim reforman çêkim, lê kurd hov in ez bi wan nikarim, li ber min radibin derdikevin serê çîyan. Li ser vê xalê ji kurdan re pêşniyar dike ku bi ermeniyên re û li hember memûrên Siltan rabin. 2- Kurdên ku di van kuştinan de cih digirin ne ji ber ku kurd in vî karî dikin belkî ji ber ku xizmetkarên Siltan in vî karî dikin. Em baş dizanin ku kurd û ermeniyên berî Evdilhemiîd hev nedikuştin wek birayan bi hev re dijiyan. 3- Di van kuştinan de hin ermenî jî xwedî qusûr in. Ew zilm û zora Siltan û hikûmeta wî ya zalim nabînin, sedema hemû xerabiyên wek dînê Îslamê dibînin. Bi vê helwesta xwe sarî û kînê dixin nava xwe û hemû Misilmanan, çî kurd çî tirk xwe dûrê her kesê didin. Tu wîlayet nîn e ku ermenî ji mîletên din, ji kurdan an ji tirkan bêtir bin. Ger ermeniyên bo tifaqa bi kurdan re hewldanek çêkiriba belkî ewqas kuştin çênebûya. Di serî da îngilîz alîkariya ermeniyên bi hêviya ku li hember Siltan rabin kir lê dema dît ku li hember mîletê ne, alîkarî nekir. 4- Rûsya dizane ku bêtifaqî û bihevketin welatan xera dike. Loma naxwaze hikûmet jî reforman pêk bîne. Heta hin ermeniyên ku direviyan

Rûsyayê jî dihanî radestê dewleta Osmanî dikir. Rûsya ferman dide balyozên xwe yên bajarên Kurdistanê da bi qencî û diyariyan kurdan berdin ser dilê ermeniyên. Ji alîyekî din ve jî dibêje ku ew ermeniyên di bin zilma hikûmeta Osmanî de ne, divê bêne ser mezhebê Ortodoksan da em karibin wan biparêzin. Bi van helwestan Rûsya dixwaze ermeniyên bixapîne bike bin destê xwe û tu mafek jî nede wan.

Di vê hejmarê de jî 15 malik, ji malika 727an heta malika 741an, ji “Mem û Zîn”ê hatine weşandin.

MESAİL-İ MÜZ‘İCE

Di bin vî sernavî de, du bûyerên siyasî acizkar têne pêşkêşkirin. Siltan Evdilhemîd wek miqnatîsa ku hemû xerabiyên bikişîne welatê Osmanî, bo zerar û ziyana hêzên Osmanî her carê bi dewletek Ewropî re dikete xirecîrê. Xetereya wan îmtiyazên ku dida dewletên biyanî wisa mezin bû, weka ku bibêje bila kes bi bêkêriya min nehese, çî tê serê milletê û dînê Îslamê xema min nîne.

Bûyera yekem, peymana ku bi balyozê Fransîz ê Stenbolê, Mosyo Fonstan re, hatiye îmzekirin e. Pênc sal berê, şirketek fransîz bi standina îmtiyazê sekuyên Stenbolê avakiribû. Di vê peymanê de şertek wiha hebû: Ger tapûyên van sekuyan neyê dayîn, dê ji aliyê hikûmetê ve him werin standin him jî deynê bankerên wek Lorando û Tobini ku bi faîzek pîr zêde bûn, pêşin werin dayîn. Çend caran balyoz dixwaze ev şert bê cih, ku nayê cih jî hikûmetê tehdît dike.

Bûyera duyem jî angaştê desthilatdariya Brîtanîyayê ya li ser Siltaniya Kuweytê ya ku li perava Kendava Besrayê ye. Ev navçe wek diyarî bo şirketê Almanîyayê ji ber avakirina rêya tirêna Bexdayê hatibû dayîn. Ev angaştê Brîtanîyayê jî ji ber ku sih sal berê Kuweyt ketibû destê Osmanî lê tu carî girîngî nedabûyê pêk hatibû.

31. NAVEROKA HEJMARA SIHEM

KURDISTANÊ DE ESASA NÎFAQÊ

Di vê nivîsê de xerabiya rahibên Jezwîtan⁸¹ hatiye nivîsîn. Ji ber xerabiya wan ew ji hemû welatên Ewropayê hatine derxistin. Ew jî li Welatên Rojhilat belavbûne. Bi tevî ku xerabiya wan gihîştîye welatên Osmanî jî lê bi piranî behsa xerabiya wan a li Çînê û giravên Okyanusyayê tê kirin. Dibêje ku gelek dîroknûsan ev mijar nivîsiye. Bi taybetî Baron Bazakorê ku bi fermî wezîfedarê lêkolîn û nivîsîna şerê li Çînê bû, di berhema xwe ya bi navê “Şerên li Çîn û Kuşanşînê” de li xwe mikur tê ku sedemên li hevketina Çînê du ne: Yek jê Îngilîz in ku bo berjewendiyên xwe yê madî her gav Çînê didin ber guleyên top û tîfîngan; ya din jî rahib in ku bi parastina Fransayê gelek karên bêqanûnî li Çînê dikin. Dema ku leşkerê dewletên mitefîk li çînîyan zilmê kirin, rahiban jî dest bi talanê kir. Leşkeran ev talana rahiban dît û wan jî dest pê kir. Ji ber ku rahibên mîsyoner berê hatibûn wêderê wan dizanî gencîneyên zêran li ku ne, bi alîkariya leşkerên çînî ku çûbûn ser baweriya wan yanî bûbûn file û bi vê alîkariyê dibin xwedî xêr, hemû zîv û zêr talan kirin. Ev rewşa xerab bi kontrolkirina ewraqên leşkerê Fransîz ê ku di rêde mir, derket holê.

Gelek bûyerên din jî îsbat dikin ku ev kirinên rahibên mîsyoner bi destûra wezaretên wan pêk tên. Ew bûyera di nava hikûmeta me û Fransayê de ku me di hejmara 29an de nivîsî, bi pênc şertên jêr xerabî ji Kurdistanê re jî tînin.

1-Qebûlkirina hemû xwendîgehên li nava Osmanî û muafiyeta wan ji bacê.

2-Qebûlkirina hemû avahiyên dînî, nexweşxane û muafiyeta wan ji bacê.

3-Veavakirina hemû xwendîgeh, nexweşxane û milkên dîn yê di salên 1894-95-96an de, di bûyera ermenîyan de zerar dîtî.

4-Dema hikûmeta fransayê dest bi avakirin an veavakirinan kir ku di şeş mehan de îtiraz nebe, êdî îtiraz nayê kirin.

⁸¹ Jezwît/Cîzwît navê mezhebê ye. Ev mezheb sala 1540an ji aliyê Îgnatyus de Loyola ve hatîye avakirin. Lê vî mezhebî li Ewropayê cih negirtî ye. Keşeyên vî mezhebî berê xwe dane Rojhilat û li van deran dêr avakirine. Navê vî mezhebî bi wateya “Îsayî” ye.

5-Li ser daxwaza Fransayê qebûlkirina rahib Emanuel bo Patrîktîya Keldaniya. Ji van pênc xalan diyar dibe ku ew rêya Fransa li Kurdistanê dişopîne dê siberojê xerabiyê ji Kurdsitanê re bîne. Xulase Kurdistana reben, sirf bi tedbîrên Fransa, tifaqa Rûsya û rêberîya mîsyoneran di siberojê de, dibe ku bibe cihê şerê kurd û ermeniyan.

Ev hêrîş û zilma mîsyoneran û hikûmetên wan, hemû ser wî xelqê ye ku ji rûyê zilma Evdilhemiîd ji berê ve jar û reben mane. Lakîn di afirandina meriv de aliyek heyfstandinê heye. Ne kurdên nezan heta qewmên zana jî nikarin di binê heqaretan de xwe ragirin. Loma kurdan jî heyfa xwe girt. Ewqas zeman e ermeniyan hêrîşê kurdan nedikir. Kurdan jî bi wan re xweş didan û distendin. Ev çend sal e rewş li hev ketiye. Sedema vê jî fesadiya mîsyoneran e.

Di dema ku Teymûr Leng dixwest ji Rûsya, Qafqasyayê hêrîşê Kurdistanê bike de, ermeniyan ji hevalên xwe yê Misilman zêdetir Kurdistanê parast. Di dîrokê de mînakên wiha gelek in. Ev jî nişan dide ku şerê îro û xwedîderketina dewletên Ewropî bo berjewendiyên wan e. Ne ji bo xwîna ermeniyan e. Piştî şerê dewleta Osmanî û Rûsyayê peymanê ku li Berlînê hat îmzekirin, şertên wisa giran daye qebûlkirin ku ev bîst sal in şer ji Kurdistanê dernakeve. Hinek şertên vê peymanê hene ku bîne cihê dê şer zêdetir bibe. Fransa jî vê rêya Rûsyayê dişopîne, ew pênc şertên ku bi hikûmeta me daye qebûlkirin ger bîne cihê dê welatê me bibe gola xwînê.

Welhasil dermanê hemû van derdan Qanûnê Esasî ye. Ger Qanûnê Esasî bê tetbîqkirin, zilma siltan û memûrên wî radibe, xelq jî ji hiqûqê xwe bawer dibe û mîsyoner jî nikarin fesadiyê bikin. Dewletên biyanî jî ji me re rêz digirin. Japonya jî demek weka me bû, lê piştî ku nîzam û îztîzama xwe çêkir, dewletên biyanî jî ji wan re rêz girtin. Divê em jî wek wan Qanûnê Esasî bicih bikin da ku zilim ji nav me rabe.

Ev beşa ku me nirxand bi tirkî jî bi sernivîsa “Kürdistan’da Esas-ı Nifak”ê hatiye nivîsîn. Ji kurdî gelek dirêjtir e ku tê de teferuatên zêde hene. Beşek dirêj di vê hejmarê de ye, berdwama wê jî di hejmara sih û yekan de ye.

Di vê hejmarê de 14 malik, ji malika 742yan heta malika 755an, hatine weşandin. Ji ber ku di hejmara sih û yekan de “Mem û Zîn” nehatiye weşandin, li vir dawiya weşandina “Mem û Zîn”ê bi malika 755an hatiye. Em ê di beşa “Ziman û Wêjeyê” de, li ser girîngiya weşandina “Mem û Zîn”ê rawestin.

ZIYA-Î AZÎM

Îshaq Sukûtî efendiyê dostê me yê Diyarbekirî ji Azadîxwazên Osmanî yê pîroz û rêzdar e. Ji nexweşîna wek encama rêya bi jan û westîner a ku bi fikr û xîreta rizgarkirina netew û welatê xwe ji xetereya ku bi ser de hatiye, ketibûyê, rizgar nebû û li bajarê San Remo yê Îtalyayê çû ser dîlovaniya xwe. Rehma Xwedê ya zêde li wî be.

Gelek pesnên wî ji aliyê Evdîrehman Bedîrxan ve tên dayîn. Sukûtî di sala 1868an de li Amedê hatiye dinê. Di sala 1887an de Lîseya Tibê ya Kulelî xelas kiriye û di heman salê de, dest bi xwendina dibistana leşkerî ya tibî ya Gulhaneyê dike. Di 1889an de, bi Îbrahîm Temo re Cemiyeta Îtîhada Osmanî bi nepenî dadimezrîne ku ev cemîyet dibe bingeha Cemiyeta Îtîhad û Terakîyê. Her çiqas tê gotin ku wî, Evdîla Cewdet û Evdîlayê Agînî li Xarpêtê di salên 1893-94an de, dibistanek bo ceribandina modelek nû ya perwerdeyê avakirine, lê tu agahiyên qetî di vî warî de nîn in. Di serê sala 1896an de, dema ku wek sitvanî tebîb, li nexweşxaneyê tetbîqî ya Heyderpaşayê dixebitî, ji wezîfeya leşkerî hat avêtin û bi cezayê pênc salan bo Rodosê hat sirgûnkirin. Ji wirê reviya Misirê, ji wir jî çû Ewropayê. Heta dawiya temenê xwe ku li Ewropayê bihurand, di nava Cemiyeta Îtîhad û Terakî de xebitî.

32. NAVEROKA HEJMARA SIH Î YEKEM

KONGRE

Di bin vê sernivîsê de, behsa amadekariyên qongreya Azadîxwazên Osmanî tê kirin ku ji aliyê lawên Mehmûd Paşa yê neviyên Siltan ve salek berê hatibû îlankirin. Pesnê vê helwestê tê dayîn. Jiber ku ewqas sal e xebatên li welat û Ewropayê negihîştine encamên berhemdar, ev bang hêviyên mezin dide. Evdîrehman Bedîrxan dest pê dike, çîroka xebatên Sebahedîn û Lutfullah pêşkêş dike. Her du

Prensên bira ji çil kesên Azadîxwazên Osmanî re vexwendname şandine. Ev çil endamên qongreyê ji milletên cuda yên Împaratoriya Osmanî bûn. Armanca qongreyê ew e ku hemû azadîxwazan bigihîne hev û bi vê tifaqê rojek zûtir desthilatdarî bi dest bixin. Şêş danişîn çêdibin hemû gengeşe li ser midaxelekirin an midaxelenekirina biyaniyan tê kirin.

Li ser van gengeşiyên hemû endam dibin du beş. Gelek heqaret jî tên kirin. Wek mînak nahêlin dengê Ferîd Begê baldar û azadîxwaz bê bihîstin. Di vê qongreyê de, rewşeke din a ku hêvi dişikand jî hebû ew jî ev bû ku hemû axaftin bi zimanê fransî (û tirkî...) dihatin kirin. Evdîrehîm Bedîrxan li virê gelek li ser girîngiya zimên disekine, lê ew bi xwe piraniya rojnameya Kurdistanê jî bi tirkî çap dike.

Tiştêk din jî hebû ku gelek kesên nasnameya wan nediyar di qongreyê de wek endam cih girtibûn. Dema daxwaza nasnamediyarkirina her kesî hat kirin, serokê dîwanê Sebaheddîn helwesteke tund nîşan dide û dibêje her kesê ku hatiye vexwendin ji aliyê wî ve tên naskirin. Lê ew kesên nasnamediyar jî hemû alîkarên midaxelekirina biyaniyan bûn. Bi vî awayî endamên qongreyê bûn du beş, lê piraniya endaman bûn alîgirên Sebaheddîn ku dixwestin biyanî midaxeleyê nava Dewleta Osmanî bikin. Ji yazdeh endamên ku ne dixwestin biyanî midaxele bikin û di qongreyê de temsîla beşa hindik dikirin, ev bersiv dihat bihîstin. “Heta niha çiqas biyaniyan midaxeleyê nava me kirine, ev midaxele bi zirara me bi dawî bûye. Ev bîst-sih salên dawîn ku Dewleta Osmanî nivê axa xwe wenda kiriye jî hemû ji rûyê midaxeleya biyaniyan bû. Dema em alîkarî bixwazin em ê zûtir welatê xwe wenda bikin. Bi taybetî jî ev alîkarî xwestin bi milletê giran tê. Tu car me nediye ku biyaniyan bo qencîya me alîkariya me kirine. Ger alîkariya me bikin jî bo berjewendiyên xwe dikin.”

Ev dîtina yazdeh endamên qongreyê bû. Bi vî awayî endamên qongreyê bûn du beş. Ev her du alî jî di armanca eslî de yek bûn. Lê di metoda gihîştina armancê de, wek me li jor nivîsî, midaxelekirin an midaxelenekirina biyaniyan de, dibûn du alî. Di danişîna roja şeşan de, yazdeh endamên ku li hember midaxeleya biyaniyan bûn, bi kurtî fikra xwe beyan kirin û ji qongreyê veqetiyên. Qongre bi vî awayî bi dawî bû.

Me di hejmarê berê de jî nivîsî ku tirkîya nivîsa “Kurdistanê da Esasa Nîfaqê” pir hatiye dirêjkirin û dewama wê di vê hejmarê de heye. Ji ber dirêjkirina nivîsê tirkî di vê hejmarê de beşa “Mem û Zîn”ê nehatiye weşandin.

AHRAR-I OSMANÎYE KONGRESÎ

Me di beşa kurdî de, behsa vî mijarê kiribû. Di dawîya qongreyê de yazdeh endamên ku Evdirehman Bedîrxan jî di nava wan de bû, fikra xwe ya li jêr bi tirkî nivîsî û hevaleyê wan xwendibû:

“ Hemwelatîyên me yê xoşewîst!

Dema em beşdarê qongreyê bûn, me jî dil dixwast ku em di nava dîtineke hevpar de qongreya xwe bi dawî bikin. Sûdgirtina ji hêza ku dê yekîtiya me pêkbihiya daxwaza me ya herî pêşîn bû. Heta pêşniyaza me ya dawîn dide selimandin ku em di vê mijarê de çiqasî dilxwazên lihevkerin û ahengiyê ne. Pêşniyaza me ev bû:

“Qongre dê bi danezanek bi dewletên mezin bide zanîn ku li welatê me bi rêya destxistina Qanûnê Esasî dê ji bo geşedanên şaristanî û reformên giştî bixebite û di vê mijarê de hêviya eleqeyek erênî û xêrxweziyê ji dewletên Ewropa dike.”

Lê mixabin di vê daxwaza xwe de em bi ser neketin; fikrên me nebûn yek. Piraniya endamên qongreyê pişgiriya fikra ku dixwast ji bo bi cih anîna reformên pêwîst li welatê me, divê dewletên biyanî bo midaxeleya karên me yê hundir bênê vexwendin, kir. Biryar hat dayîn, karê herî girîng ê ku komîteya dê bê sazîkirin bike, ev kar e. Bi kurtî rihê rêzîknameya ku hat qebûlîkirin, xwestina “helwesta alîkarîkirinxwaz”ê ji biyaniyan bû. Em difikirin ku di vê serdema şaristaniya em tê de ne, hê jî yê herî girîng ku hikûmetan dike nava hereketê berjewendiyên wan e. Em ne bawer in ku dê her dem berjewendiyên dewletan di mijara reforman de, bi yê me re hevpar bin. Em qebûl dikin ku dê midaxeleya biyaniyan zerarê bide berjewendiyên me, serxwebûna me û parastina bihevve mayîna axa me. Her kes dizane ku mînakek bisûd a midaxeleya biyaniyan a ku di demeke aşîyê de pêk hatibe tune ye.

Mijarek duyem jî ev e: Me fam nekir, şandina midaxeleya Ewropayê bi awakî li gor berjewendiyên me, tê çî wateyê. Me fam nekir dê çawa komeleyek Azadîxwazên Osmanî ku dê li Parisê bê damezrandin, siyaseta dewletên mezin di meseleyên rojhilat de, araste bike û bi rê ve bibe.

Wek ku bi neheqî ji me re tê gotin em dijî Ewropayê nîn in. Berevajê wê, li welatê me belavkirina pêşketinê wan ên di qada şaristaniyê de, daxwaza me ya herî pêşîn û pîroz e. Em dixwazin ku bi geşedanê wan ên di qada zanistê de, pêşiya gelê xwe ronî bikin û bi saziyên wan ên sûdwar, bi rejîmê wan ên meşrûtî hikûmeta xwe bikin. Em dixwazin di hemû mijarên sûdwar de li şopa netewên medenî bimeşin. Ji ber vê, sedemê li hev nekirina me, ne lîdîjbûna Ewropayê ye, qebûlîkirin an qebûlnekirina midaxeleya biyaniyan e. Em welatperweriyê bi qetî di redkirina vê midaxeleyê de dibînin. Em hêvî dikin ku dê ev welatperweriya me li gor berjewendiyên me be û dê him teqdîra mileta me ya xoşewîst him jî ya Ewropayê bigire.

Ji ber van sedeman, em didin zanîn ku em mecbûr in cuda bixebitin û em bi dilûcan ji komîteya ku dê endamên pîr damezrînin jî dixwazin ku xizmetên sûdwar bo welatê me bike.”

Êdî em dibînin ku rojnameya Kurdistanê, di hejmara dawîn de him bi zimanê xwe him jî bi naveroka xwe rojnameyeke sîyasî ye. Bi gotinekî dî bi Jon tirkên ku di sala 1908an de, bi navê Meşrûtiyeta Duyem bûn desthilatdar, re tev gerîyaye.

BEŞA PÊNCHE MIJARÊN SEREKE YÊN ROJNAMEYÊ

Em dixwazin di vê beşê de li ser heft mijaran bi hûrgilî rawestim. Her yek ji van mijarên sereke ji ber ku gelek girîng in, bi lêkolîna hin çavkaniyan bûne tezên master û doktorayê. Wek mînakê vê, em karin teza master û ya doktorayê yê Hogir Tahir Tewfîk bidin ku yek li ser rola rojnamegerîyê di pêşvebirina hizra netewî de ye û ya dî ji li ser kêşeya ermenîyan û pêwendîya wê bi kurdan re ye.

1. ZIMAN Î WÊJE

Rojnameya Kurdistanê ceribandina yekem a bi zimanê kurdî ye ku bi tîpên erebî û bi rênivîsa farisî hatiye çapkirin. Berî vê ceribandinê, berhemên zimanê kurdî bi destan dihatin nivîsîn.

Wek me di destpêkê de jî nivîsîbû, zimanê rojnameya Kurdistanê di hejmarên pêşîn de bi tevayî kurdî ye. Lê her ku rêveberên rojnameyê ji zimanê kurdî dûr ketine bêtir zimanê siyasî yê wê serdemê ku ew jî tirkîya Osmanî bû derketiye pêş. Wek me di xwendina sî hejmarên rojnameyê de jî dît, hejmara dawîn êdî bi tevayî bi zimanê tirkî ye. Naverok jî hemû bûye mijarên siyasî.

Dema em pêwendîya rojnameyê bi wêjeyê re bigrin berçavan em dibînin ku di hejmara duyem de, di bin navê rojnameya Kurdistanê de, di kunyeya rojnameyê de bi tirkî 'Bazı ümera-i Ekradın arzularına mebnî bundan böyle ahval-ı carîye ve edebiyat-ı Kürdiyeden dahi bahsolunacaktır'⁸² dinivîse, ku li ser daxwaza hin mîrên kurdan rewşa niha û edebiyata kurdî jî dê bêne behskirin. Ev nivîs di hejmara yekem de tune ye. Di bin vê nivîsê de, di rûpela pêşîn a nasnameya rojnameya Kurdistanê de, jî dîsa bi tirkî dinivîse; nameyên bi erebî, tirkî, farisî ku li gor helwesta rojnameya me

⁸² M. Emîn Bozarslan, *Kurdistan Rojname Kurdi ya Pêşîn 1898-1902*, Cild I, Weşanxana Deng, Uppsala 1991 (r. 121)

ne, dê bi wergera kurdî bêne weşandin. Bi vê helwesta rojnameyê jî em dibînin ku di destpêkê de zimanê kurdî derketîye pêş.

Bi vî awayî di hejmara duyem a rojnameya Kurdistanê de, berî ku dest bi çapkirina beşên “Mem û Zîn”ê bike daxuyaniyek wiha jî dide: “Hin ji mîr û axayên kurda kaxiz rêkirine ji min re, dixwazin ku ez vê cerîdeyê de behsa halê nuho û edebiyata kurdî, ango hin şê‘r û beytên kurmancî binivîsim. Loma, paş nuho, bi îzna Xwedê ez ê behsa halê nuho bikim û her car hin beyt û şê‘rên kurmancî û hîkatên qenc binivîsim.”⁸³

Ji hêla ziman ve bi piranî tîpa “n”yê ya di gireka pirjimarîyê, “an”ê de hatiye avêtin. Hema meriv kare bibêje ku ev rewş heta serdema ku Mîr Celadet Bedirxan rêzimana kurmancî bi tîpên latînî dinivîse heye. Peyva “tişt” wek ku li devera Botanê mê ye hatiye bikar anîn.

Pêwendîya rojnameya Kurdistanê ya bi wêjeya kurdî re jî di çapkirina Mem û Zîna Ehmedê Xanî de dîyar dibe. Cara yekem e ku Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi rêya rojnameya Kurdistanê tê weşandin. Berî rojnameya Kurdistanê hemû Mem û Zîn bi dest dihatin nivîsîn. Ji ber ku temenê rojnameyê ne dirêj bûye, têra weşana hemû malikên Mem û Zînê nekiriye. Heta malika 755. hatiye weşandin. Malikên 71 û 621ê di rojnameyê de nehatine çapkirin. Dibe destxeta li ber dest nehatibe xwendin.

Li gora rêza malikan dîyar dibe ku ji malika 578an heta ya 592ya 15 malik jî di hejmara 19. a wenda de hatine çapkirin. Em li virê dixwazin bidin zanîn ku ev malikên Mem û Zînê û nivîsa bi sernavê “Şîrketê Baxîye” diselimînin ku hejmara 19an a rojnameya Kurdistanê derketîye.

Wek encam em dikarin di heqê xizmeta rojnameya Kurdistanê bo wêjeyê de bibêjim ku ev 755 malikên hatine jî xizmetek pir girîng e.

2. PERWERDE

Meriv dikare bibêje ku serdema rojnameya Kurdistanê dertê, êdî dewleta Osmanî, ji ber hestên netewî, serhildanên netewan yên li Ewropayê, bi her awayî dest

⁸³ Rojnameya Kurdistanê, Weşana Dezgey Bedirxan, Çapa sêyem, Tehran 2006 (r. 18)

havêtiye mijara perwerdeyê û dixwaze bi bernameyên navendî kurd, ereb û arnawidên Misilman⁸⁴ ber bi tirkîtiyê ve asîmîle bike û entegre bike.⁸⁵ Di vê serdemê de, piranîya netewên di nava Împaratoriya Osmanî de ne, bi taybetî jî li Balkanan serî hil didin û azadiya xwe bi dest dixin. Rojnameya Kurdistanê di hejmara yekê de bala aliman dikişîne ser girîngiya perwerdeyê. Meriv dikare bibêje ku ev hejmar bi piranî perwerdeyê ji xwe re kiriye mijar. Wek me di xwendina vê hejmarê de pêşkêş kiribû, bi pênc hedîs û bi çend ayetan li ser girîngiya perwerdeyê hatibû rawestî.

Mînaka **pêşîn** a entegrasyonê Alayên Hemîdîye ne ku di 1891ê de hatine damezrandin, ya **duyem** jî “Mekteba Eşîra”⁸⁶ ye. Wek di xwendin û analîzên jorê de jî xuya dike sedema derketina rojnameya Kurdistanê jî jixwe bo perwerdekirina kurdan bûye. Di bin navê rojnameya Kurdistanê de, bi tirkî nivîsiye ku rojnameya bi kurdî niha ji pazdeh rojan carek diweşe; ji bo kurdan hişyar bike û teşwîqê hînkirina sin’etan bike. Di hejmara duyem de bo avakirina xwendingehan bang li dewlemendên kurdan dike ku zêr û zîvên xwe yên di elbikan de ne, derxînin û di rêya Xwedê de xwendingehan ava bikin.⁸⁷ Zarokên bêdê û bav di wan xwendingehan de bidin xwendin. Wek mînak dibêje, her welatê ez lê digirim, dibînim ku dewlemendên wan zarokan dişînin Stenbolê di xwendingehên mezin de, didin xwendin.

Di pirtûka bi navê “Aşîret Mektep Devlet”⁸⁸ de, hatîye nivîsîn ku amadekarîyên vekirina Mekteba Eşîran, di 23ê Hezîrana 1892ya de dest pê kirine. Di dokumanên amadekarîyê de dinivîse ku biryar hatîye dayîn bo ku eşîretên ereban “ji zilûmeta cehaletê” rizgar bikin ev dibistan dê bêne vekirin. Ancax bo nimûne niha ev mekteba eşîran li Stenbolê tê vekirinê.⁸⁹ Ji dokumanên ku di vê pirtûkê de tene

⁸⁴ Lütî (Ahmed Ramiz) *Emir Bedirhan*, bğst yayınları, İstanbul 2007 (r.19-94-95)

⁸⁵ *Siyasi Hatıratım*, Sultan Abdülhamit, Weşanên Dergah, Çapa 7. Stenbol 2010 (r. 49)

⁸⁶ Rohat Alakom, *Eski İstanbul Kürtleri*, Weşanên Avesta, Stenbol 1998 (r. 45)

⁸⁷ Rojnameya Kurdistan, Çapa sêyem, Tehran 2006 (r. 15-16-17)

⁸⁸ Ev pirtûk di nava weşanên Aramê de, di Kanûna 2001an de derketîye. Pirtûk ji du beşan pêk tê. Beşa yekem ji aliyê Eugene L. Rogan ve hatîye nivîsîn. Rogan mamosteyê zanîngeha Oksford(Oxford)ê ye. Beşa duyem jî teza masterê ya Alişan Akpınar e.

⁸⁹ Alişan Akpınar, Eugene L. Rogan, *Aşîret Mektep Devlet, Osmanlı Devlet’inde Aşîret Mektebi*, Weşanên Aram, Stenbol 2001 (r. 74)

pêşkêşkirin tê famkirin ku di destpêka vekirina “Mekteba Eşîran” de navê Dîyarbekir derbas dibe. Paşê eşîrên xwedî Alayên Hemîdîye daxwazkirine ku zarokên wan jî biçin Mekteba Eşîran.

Bang li alim, mîr û axayên kurdan dike, dibêje eger kesên di hukmê we de ne, hûn nedin xwendin û bo hînkirina sin’etan hûn wan neşînin xwendengehan, li dinyayê û axretê gunehê wan di stûyê we de ye.⁹⁰ Bi vî awayî gelek şîret li karbidestên kurdan dike. Wek encam em karin bibêjin ku rojnameya Kurdistanê girîngîyek mezin daye perwerdeyê.

3. TÊGIHÎŞTINA KURDISTANÊ

Em dixwazin balê bikişînin ser navê rojnameyê ku ew jî rasterast bi navê welat yanî bi “Kurdistan”ê hatîye binavkirin. Di hejmara duyem de hedîsek pêxember li ser vê mijarê pêşkêş dike: “‘hubbu’l-wetenî mîn’el-îman’; ango ‘hejêkirina weten ji îmanê ye’”⁹¹ Li virê mebesta wî ji welêt Kurdistan e, ji ber ku gazî axa, paşa û mîrên kurdan dike dibêje we çî ji welatê xwe re kirîye. Dibêje hezkirina welêt ew e ku hûn dibistanan çê bikin. Tê de kurdan bidin xwendinê da bikaribin welatê xwe ji dijminên wek mosqof biparêzin. Di berdewamîya vê nivîsê de dîsa bang li axa, şêx û mîrên kurdan dike û wiha dipirse: “Carekê qenc bînin bîra xwe axa wetenê we çî ye. Ne hemî ji hestî û goştê dê-babên we ne, tirbên ecdadên we ne, paş çend rojekê wê ji we re jî bibe tirb. Ne heyf e mosqof bi espên xwe bide ser wê axê û tirba!”⁹² Mîqdad Mîdhet Bedirxan di her pênc hejmarên pêşîn ên rojnameya Kurdistanê de, bi vê ferasetê li ser girîngîya welêt rawestîyaye.

Ji hejmara şeşan bi şûn de Evdirehman Bedirxan jî bi heman rêbazan derxistina rojnameya Kurdistanê meşandîye. Wek mînak girîngîya welat, xwendin û perwerdeyê bi piştgirîya ayet û hedîsan derxistîye pêş. Di hejmara nehan de piştî şîrovekirina hedîsek li ser payebilindîya ‘ilmê, beşek rasterast bi navê “Welat-Weten” nivîsîye. Wiha dest pê kiriye: “Weten ango welatê mirov cismek we ye ku yê ji wî cismî muteessir dibin, xelkên wê derê ne. De vêca hingî mirovên welatekî

⁹⁰ *Rojnameya Kurdistan*, Çapa sêyem, Tehran 2006 (r. 17)

⁹¹ h.b. r. 15

⁹² H.b. r. 15

xweyqewet bibin, hewqas ax û berê wî welatî xweyqewet dibe.”⁹³ Li virê jî em dibînin ku girîngîya welat bi jiyana hemwelatîya ve girê daye. Wek çawa ku navê rojnameyê Kurdistan e.

4. DÎROKA KURDISTANÊ

Em dikarin nivîsên ku di rojnameya Kurdistanê de li ser mijara dîrokê hatine nivîsîn û bi piranî ji Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî girtine, bikin du beş:

A) Beşa yekem, ew beş e ku bêtir li pey koka malbata Bedirxaniyan geriyaye. Di hejmara yekê de Mîqdad Mîdhet Bedirxan, bang li alim, mîr û axayên kurdan dike, dibêje hûn hemû esl û neslê min dizanin. Behsa malbata xwe dike ku kalikên wî ji nesla Xalidê kurê Welîd in. Li virê hinek lihevketin heye, wek ku Mîqdad Mîdhet Bedirxan koka Bedirxaniyan digihîjîne ereban.

Di hejmara heştan de, bi ser navê “Hikumdarên Cizîra Kurê Omer” dîroka cizîrê dinivîse: Navê Cizîrê “Cizîra kurê Omer” e. Ev bajar, du sed sal piştî hicreta Pêxember, ji aliyê Evdilezîzê kurê Omerê Berqemîdî ve hatiye avakirin lê M. Emin Bozarşan, nîşan daye ku ev agahî şaş e. Dibêje, di Şerefnameyê de hatiye nivîsîn ku avakarê keleya Cizîrê, Umerê kurê Ebdulezîzê Emewî ye⁹⁴. Mîr Silêman li derdora Cizîrê hikûmeta xwe ava kir. Mîr Silêman kurd bû, ew kalikê Mîr Bedirxan û hemû mîrên Kurdistanê ye. Ji Mîr Silêman vir ve navê hemû mîran bi kurtî dinivîse. Di jimara heştan de, li ser Mîr Silêman dibêje ku alimek bi navê Şerefê kurê Şemsedîn, Şerefxanê Bedlîsî, di kitêba xwe tarîxa Kurdistanê, “Şerefnameyê” de, behsa Mîr silêman kiriye. Sê kurên wî hebûne. Piştî wî kurê wî Mîr Evdilezîz kurê Silêman dibe mîrê Cizîrê û bajarê Gurkilê dide birayê xwe Hecî Bedir, bajarê Finikê jî dide birayê xwe Mîr Evdal. Du kurên mîr hebûn, piştî mirina wî kurê wî Seyfedîn kurê Evdilezîz bû mîrê Cizîrê, piştî ku ew mir birayê wî Mecdudîn kurê Evdilezîz bû mîrê Cizîrê. Piştî mirina wî kurê wî Îsa kurê Mecdudîn bû mîrê Cizîrê. Piştî wî kurê wî Bedredînê kurê Îsa bû mîrê Cizîrê. Ji Şerefnameyê gelek pesnên vî mîrê tene girtin. Piştî mirina wî kurê wî Evdal kurê Bedredîn bû mîrê Cizîrê. Piştî mirina wî kurê wî

⁹³ *Rojnameya Kurdistan*, çapa sêyemîn, Tehran 2006 (r. 43)

⁹⁴ Şerefname, wergera wê ya erebî, cild 1, rûpel 111, Qahîre 1958-Şerefxanê Bedlîsî, ŞEREFNAME, Wer. Ziya Avci, Avesta, Stenbol 2007 (r.210)

Mîr Izedînê kurê Evdal dibe mîr. Di Şerefnameyê û Rojnameya Kurdistanê de behsa şerê di navbera Mîr Izedîn û Tîmûrleng de tê kirin. Hilweşîna Cizîrê ji aliyê Tîmûrleng ve di 1394an de pêk tê.

Di hejmara nehan de ev mijara dîrokê tê vegotin. Piştî wî kurê wî Mîr Evdal kurê Izedîn bû mîrê Cizîrê. Piştî wî kurê wî Mîr Brahîm kurê Evdal bû mîrê Cizîrê. Sê kurên Evdal bi navê Şeref, Bedir û Mihemed hebûn bi vê rêzê bûn mîr.

Di hejmara dehan de, bes behsa Mîr Mihemedê kurê Bedir Begê tê kirin. Piştî mirina Bedir Begê kurê wî Mîr Mihemed bû mîrê Cizîrê. Di dema wî de Muradê Sêyem Siltanê Osmanî ye. Mistefa Paşa dişîne seferê. Di rê de ecem hêrîşê wî dikin lê Mîr Mihemed û kurdên din diçin hawara wî. Ew û leşkerên xwe bi saya kurdan difilitin lê Mîr Mihemed tê kuştin. Rojnameya Kurdistanê gelek pesnê vê alîkariya Mîr Mihemed dide û dibêje ku Siltanên baş ên wek Muradê Sêyemîn alîkarî heq dikin lê Siltanên wek Evdilhemîd heq nakin.

Behsa mîrên Cizîrê di hejmara yazdehan de jî tê kirin. Piştî kuştina Mîr Mihemed di şerê li hember eceman de, bo Dewleta Osmanî kurê wî Mîr Mihemedê kurê Mîr Mihemed ku bi temenê xwe biçûk e, dibe mîrê Cizîrê. Piştî pênc salan, sala 1583yan mîr. Piştî mirina wî kurê apê wî Mîr Ezîzê kurê Mîr Mihemed bû mîrê Cizîrê. Di sala 1587an de dema ku Wezîr Osman Paşa diçû ser Îranê Mîr Ezîz ji mîrîtiyê avêt û Hawind bû mîr. Demek Mîr Ezîz çû Sincarê rûnişt. Paşê Mîr Ezîz bi eskerên giran girte ser Hawind û ew îdamkir lê di şer de Mîr Ezîz jî hat kuştin. Piştî wî Mîr Mihemedê kurê Mîr Evdal bû mîrê Cizîrê. Lê baş ji heqê mîrîtiyê derneket û li cihê wî Mîr Şerefê kurê Xan Evdal bû mîrê cizîrê. Piştî sala 1639an agahî di heqê mîrên Cizîrê de kêmin. Yanî ev agahiyên ku Şerefname, Dîroka Kurdistanê, dide; di rojnameyê de hatine weşandin. Evdirehman Bedirxan dibêje ku kitêbek li Kurdistanê li ser dîroka kurdan heye, ger bi dest min bikeve ez ê wê jî biweşînim. Di hejmara sêzdeh û çardehan de behsa Mîr Bedirxan heye.

B) Beşa duyem jî dîroka kurdên dervayê mîrektîya Botanê ye. Di hejmara pazdehan de behsa Selahedînê Eyûbî heye. Ev nivîs wek kurteya beşa pêncan a

Sefheya Yekan a Şerefnameyê ye.⁹⁵ Bi vê nivîsê em fêr dibin ku navê kalê Selahedînê Eyûbî Şadî ye. Ji gundê Diwînê, ji ber ku Selçûqîyan dagirkirine, ew û du kurên xwe, Necmedîn Eyûbîyê bavê Selahedîn û Esedudîn Şêrkoyê apê Selahedîn, rabûne koçê Bexdayê kirine. Şadî li Bexdayê koça dawî dike. Piştî mirina Şadî kurê wî Necmedîn Eyûbî bi rêya Behrûzîyê wezîrê Selçûqîyan dibe Muhafîzê “Tîkrît”ê. Di sala 1138an de li Tîkrîtê Selahedîn tê dinyayê. Li wirê peywendîya Necmedîn Eyûbî û Îmadedîn Zengîyê Hakimê Mûsilê çêdibe. Îmadedîn wî dike Muhafîzê Balbekê. Piştî mirina Necmedîn ew dikevin xizmeta kurê wî Nûredîn Mehmûd. Selahedînê Eyûbî li Balbekê û Şamê ji bavê xwe perwerdehiyê digire. Dema ku xelîfeyê Dewleta Fatimîye yê Misrê alîkarî ji malbata Eyûbîyan xwest, di salên 1166-1168an de çend caran Selahedînê Eyûbî bi rêberîya apê xwe Şêrko çû Misrê. Piştî ku apê wî li Misrê koça dawî kir Selahedîn li ciyê wî bû wezîrê Misrê.

Di hejmara bîst û çaran de behsa Merwaniyan û serokên wan “Bad” û “Ebûsaîd” dike.

5. DAXWAZÊN JI SILTAN EVDILHEMÎDÊ DUYEM

Dema em ji hejmara yekem a rojnameya Kurdistanê dest pê bikin û li ser helwesta rojnameya Kurdistanê ya li hember Siltan Evdilhemîdê 2. binêrin em ê bibînin ku di serî de rojnameya Kurdistanê bo hişyarkirina kurdan ji nezanînê û fêrkirina pîşeyan bo wan, dest bi weşanê kirîye. Rojnameya Kurdistanê 22yê Nîsanê dertê, lê di nava heftekî de Siltan fermana qedexekirina rojnameya Kurdistanê di 30ê Nîsanê de daye.⁹⁶ Ji xwe sîyaseta Siltan Evdilhemîd li ser asîmîlekîrîna kurdan hatibû avakirin. Siltan vê helwesta xwe di bîranînên xwe de wiha dinivîse: “Berî her tiştî bo bihêzkerina neteweya tirkên li Rûmelî û bi taybetî jî li Anatoliayê, divê em kurdên nav xwe asîmîle bikin û bi xwe ve entegre bikin.”⁹⁷ Bo pêkanîna vê sîyaseta xwe jî çî pêwîst bûye kirîye. Wek mînak dibistanên bi navê “Mekteba Eşîretan” û Alayên Siwarên Hemîdî dane damezrandin. Dîsa di vê pirtûkê de hatîye nivîsîn ku hinek kes

⁹⁵ Şerefxanê Bedlîsî, ŞEREFNAME, Dîroka Kurdistanê, Werger: Ziya Avcî, Weşanên Avesta, Stenbol 2007

⁹⁶ Malmîsanîj, *İlk Kürt Gazetesi Kürdistan'ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan 1868-1936*, Weşanên Vate, Çapa 2., Stenbol 2011 (r. 121-122)

⁹⁷ Sultan Abdülhamit, Siyasi Hatıratım, Dergâh Yayınları, çapa 7. Stenbol Gulan 2010 (r. 49-51)

sîyaseta wî ya kurdan rexne dikin, ew jî di bersiva van rexneyan de dibêje ku di rêyek rast de ye.

Di nav hejmarên ku hatine dîtin de, daxwazname di heşt hejmaran (4-5-6-7-10-13-20-26) de hene. Di hejmara çaran de Mîqdad Mîdhet Bedirxan daxwazname bi numro yekê ji Siltan Hemîd re dişîne û dixwaze qedexekirina hatina rojnameyê bo welat bê rakirin. Ev jî dibe sedem ku di rojnameyê de zimanê tirkî jî cara pêşîn cih bigire. Piştî vê di hejmara pêncan de jî bi numro duyan Mîqdad Mîdhet Bedirxan dîsa daxwaznameyek ji Siltan Evdilhemîdê 2. re nivîsîye. Behsa daxwaznameya berê kirîye û gotiye ku qedexeya li ser rojnameya Kurdistanê ji xwe ranebûye, bi ser de jî rojnameya Kurdistanê di dest kê de bê dîtin zelim li wan tê kirin. Wek jî vê daxwaznameyê tê famkirin, gefên bi zorê anîna wî ya Stenbolê lê hatine kirin. Piştî vê hejmarê ji ber van gefan vegerîyaye Stenbolê.

Ji hejmara şeşan bi şûn de Evdirehman Bedirxan rojnameya Kurdistanê derxistîye. Di hejmara şeşan de Evdirehman Bedirxan jî dest bi nivîsa daxwaznameyê bo Siltan dike. Di vê daxwaznameyê de bi piranî li ser vegera Stenbolê ya Mîqdad Mîdhet radiweste. Angaşt dike ku Mîqdad Mîdhet ne ji ber zordana malbata Bedirxanîyan lê bi dilê xwe vegerîyaye Stenbolê. Di hejmara heftan de jî Evdirehman Bedirxan Daxwaznameya xwe ya duyem ji Siltan re nivîsîye. Di daxwaznameya vê hejmarê de balê kişandîye ser zilmûzora li ser birayên wî yên ku xwestine biçin Kurdistanê. Di vê daxwaznameyê de memûrên zalim yek bi yek binav dike. Dibêje ku ew malbata xwe serî li ber zilmê natewînin.

Di hejmara dehan de, daxwaznameya 3. a Evdirehman Bedirxan bi pênc xalan hatiye nivîsîn. Ji van xalan ya herî girîng ew e ku dixwaze mafê weşandina rojnameya Kurdistanê li Stenbolê jê re bê dayîn. Çar xalên din wek daxwaznameyên din dîsa li ser zilma memûrên zalim in.

Di hejmara sêzdehan de, Evdirehman Bedirxan rasterast wek daxwazname daxwazên ku ji kesek Amedî hatine ji Siltan re pêşkêş kirîye. Di vê nameyê de ji Siltan tê xwestin ku hinek bala xwe bide Kurdistanê jî. An na wê Kurdistan ku cihê wê pir girîng e bo parastina hemû Misilmanan, dê weka Girît û cihên din bikeve destê dijminên wek Rûsyayê.

Di hejmara bîstan a rojnmeya Kurdistanê de, Evdirehman Bedirxan daxwaznameyek balkêş ji Siltan re şandiye. Di vê daxwaznameyê de behsa birayê xwe Xalid Seyfullahê ku 4-5 hezar kurdên dilxwazên piştgirîya Birîtanyaya dosta Osmanî civandibû, dike. Bi fetwaya miftîyê Stenbolê serî li balyozê Birîtanyayê dabû. Balyoz bi vê tevgera kurdan pir kêfxweş bûbû. Ji wan re spasîyên xwe pêşkêş kiribû û gotibû ez nikarim we dilxwazan bişînim qada şer. Li ser vê bûyerê bi fesadîya derdorê ew tên girtin, li girtîgehê jî zilmûzorek mezin li ser wan tê meşandin. Heta daxwaza wan a xwendina Qur'anê jî nayê bicihanîn. Balyozê Birîtanyayê ku bi vê rewşa wan dihesê, hêrs dibe dibêje ger ew neyên berdan ez ê ji welatê Osmanî derkevim. Li ser vê daxwazê girtî tên berdan. Di dawîya daxwaznameyê de Evdirehman Bedirxan gazinan ji Siltan dike û dibêje Xweda îlham bide Siltan da ku miletê bêsûc û guneh biparêze.

Di hejmara 26an a rojnameya Kurdistanê de, Evdirehman Bedirxan, daxwaznameya dawîn (daxwaznameya heştam) dinivîse. Taybetmendîya girîng a vê daxwaznameyê ew e ku êdî rasterast ji Siltan re xirabîya wî dibêje. Wek mînak dadgeha ku di heqê wî de biryara desteserkirina mal û milkên wî di giyaba wî de daye rexne dike û dibêje ez û kesên wek min ên azadîperwer ên masûm bo ku ji xirabîya te rizgar bibin, me welatê xwe terk kir em çûn welatên Ewropayê. Dikeve serê te ku em ji bo mal û milk vegehin û teslîmê te bibin? Bi vê daxwaznameyê dawî li peywendîyên xwe û Siltan hanîye.

6. TÊKILIYÊN KURD Û ERMENIYAN DI ROJNAMEYA KURDISTANÊ DE

Mîqdad Mîdhet Bedirxan di hejmara sêyem de, nivîsîye ku du-sê sal in kurd û ermenî nelihev in. Dibêje ku dewlet jî ji vî halî ne razî ye. Nivîsîye ku dê paşê li ser vê mijarê raweste.⁹⁸ Lê em dibînin ku di du hejmarên ew diweşîne de vê mijarê derbas nebûye.⁹⁹

⁹⁸ Kurdistan, bi tîpên 'erebî, çapa sêyem, Tehran 2006 (r. 21)

⁹⁹ Hogir Tahir Tewfiq, *Kurd û Meseleya Ermenîyan 1898-1920*, (r. 323)

Hecî Qadirê Koyî yê mamosteyê xwedîyên Rojnameya Kurdistanê di helbestên xwe de balê dikişîne ser xetereya hewldanên têne kirin bo welatê kurdan pêşkêşê ermenîyan bikin. Ev jî helbesta wî ye:

“Xakî Cizîr û Botan ye’nî welatê kurdan

Sed heyf û sed mixabin deyken be Ermenistan”¹⁰⁰

Di hejmara heftan a rojnameya Kurdistanê de, wek vê fikra Koyî, Evdirehman Bedirxan jî balê dikişîne ser vê mijarê. Bi kurtî ji kurdan dixwaze ku pir bixebitin; bibin xweyî sin’et û huner an na, dê dewletên mezin ên file Kurdistanê bidin ermenîyan. Ermenî ne wek kurdan in, dixebitin û li hember memûrên zalim radibin, mafên xwe diparêzin. Divê kurd jî wek ermenîyan li hember memûrên zalim mafên xwe biparêzin. Ermenî wek kurdan mezlûm in. Divê kurd jî ermenîyan nekujin.¹⁰¹

Di hejmara yezdehan de ev mijar bi heman awayî tê pêşkêş kirin. Evdirehman Bedirxan balê dikişîne ser xîretkêşiya ermenîyan û dibêje ew jî wek we kurdan mezlûm in lê ji bo azadiya xwe, xwe feda dikin.¹⁰² Ji ber nezaniyê hin kurd di kuştina ermenîyan de cih digirin, ew nezanîn ji kurdan re pir xera be. Dixwaze ku alimên kurdan nezanan hişyar bikin û bibêjin ev ne karê we ye, yê qatilan e. Dîsa daxwaz ji kurdan dike ku bi ermenîyên mezlûm re îtîfaqek li hember memûrên zalim ên padîşah dişîne ser wan û ermenîyan, pêk bînin. Ayeta Qur’anê ya ku dibêje kesên alîkariya mezlûman nekin Xweda dê ceza bide wan, wek referansa pêwîstiya alîkariya kurdan bo ermenîyên mezlûm nîşan dide. Bi berdewamî dibêje li cihê ku hûn mecbûr in alîkariya mezlûman bikin, hûn herin wan bikujin gunehê we pir dibe.

Dîsa di hejmara sêzdehan de mijara ermenî û kurdan derbas dibe. Lê vê carê rasterast di nameya ku ji aliyê M. Ş. (ji eşrafên Dîyarbekirê) ve hatiye nivîsîn de heye. Ev nameya ku tê de wek daxwaz hatiye nivîsîn, ji Siltan Evdilhemîdê Duyem re bê pêşkêş kirin; lewma Evdirehman Bedirxan jî wek daxwaznameya şeşemîn ji siltan re pêşkêş kiriye. Lê balkêş e ku di nameyê de navê ermenîyan derbas dibe, di

¹⁰⁰ Dr. Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Cild 4, Çapxaneya Aras, Hewlêr 2010 (r. 131)

¹⁰¹ *Rojnameya Kurdistanê*, Çapa sêyem, Tehran 2006 (r. 36)

¹⁰² Ahmet Alan, *Hetawî Kurd 1913-1914*, Avesta Yayinlari, Stenbol 2017 (r. 118-119-120)

daxwaznameya ji Siltan re hatiye nivîsîn de derbas nabe. Di nameyê de bi piranî li ser zilma memûrên zalim ên ku Siltan dişîne Kurdistanê tê rawestîn. Wek encama vê zilmê tê gotin ku dê Kurdistan vala bibe û dê mosqof jî were Anadolê zêft bike. Eger memûrên rast û adil neyên Kurdistanê, dê kurd jî bibin hevalê ermenîyan, wê bi hev re rê û rêbazên edaletê bixwazin.

Di hejmara çardehan de jî behsa ermenîyan derbas dibe. Ew jî di nameyek ku ji aliyê Mele Salihê Cizîrî ve hatiye nivîsandin de derbas dibe. Helwesta Siltan Evdilhemîd ya li hember kurdan, di nameyê de tê rexnekirin. Wek encam dinivîse ku Siltan Evdilhemîd naxwaze kurd di dibistanan de bixwînin, zana bibin. Lewra dixwaze kurdan li hember ermenîyan bikar bîne. Mele Salihê Cizîrî, di nameyê de dinivîse ku êdî kurd dizanin ermenî mezlûm in, mebesta Siltan jî ew e ku kurdan wehşî bihêle da li hember ermenîyan bikar bîne. Lê dê êdî kurd nebin pêlîstoka wî.

Di hejmara 25an de, bi tirkîya Osmanî, bi sernivîsa “Ji Kurdan re” gotareke berfireh di mijara kurd û ermenîyan de nivîsiye. Meriv kare bibêje ku ev nivîs ya herî bi rêkûpêk e di vê mijarê de. Bi bêjeya “Qîtalan”, hevkuştina di nava kurd û ermenîyan de bi nav dike û bi pîrsa “sedemên van kuştin û talanan ku we kurdan di çavê merivan de tawanbar dike çi ne?” dest pê dike. Di bersiva vê pîrsê de jî dibêje sedem ew e ku ermenî dixwazin ji Osmanîyan veqetin û Kurdistanê bikin bin destê xwe. Di vê riyê de, li Ewropayê çawa dixebitin, li Kurdistanê çeteyan çawa amade dikin, çawa van fikrên xwe dixin hişê hin gundiyên naîf ez bi tevî dizanim.¹⁰³

Di berdewamîya nivîsê de, ji kurdan re dibêje bi tevî vana hemûyan mafê we tune ku hûn beşdarîya vê hevkuştinê bikin. Li gor Evdirehman, esasê vê meselê ew e ku bi navê “Ermenistan”ê ti tişt nayê avakirin. Ger bihata avakirin ji zû de dê bihata avakirin, ne li ser axa kurdan bi tenê belkî li ser axa arnawid û gelek Misilmanên din jî bihata avakirin. Ev ji bo Siltan Evdilhemîd ne derd e. Lê Rûsya bo berjewendiyên xwe ermenîyan bikar tîne. Dîsa bang li kurdan dike, dibêje li cihê ku hûn bikevin nava van hevkuştinan û bibin sedemê kuştin, pelçiqandina û tepeserkirina hin ermenîyên ku di bin bandora fesadan de mane; hûn kurdên ku ji ermenîyan

¹⁰³ *Rojnameya Kurdistanê*, Çapa sêyem, Tehran 2006 (r. 106-107)

mezlûmtir in, li hember memûrên zalim ên hikûmeta navendî têbikoşîn dê bo we çêtir be.

Meriv kare wek encam ji vê nivîsê çend xalan dîyar bike:

- 1) Evdirehman Bedirxan, nijadperestên ermenîyan û xaçperestên Ewropî rexne kirîne.
- 2) Ji kurdan xwestîye li cihê ku bi ermenîyên hatine xapandin re şer bikin, bila bi memûrên zalim ên hikûmeta navendî re şer bikin da zilma li ser xwe rabikin.
- 3) Ji kurdan dixwaze ku bi listikên Siltan Evdilhemîd nexapin. Ew ji fesadên ku hin ermenîyên naîf xapandine re efû derdixe lê ji kesên hêja ku zilma wî rexne dikin re her hêrîş dike.
- 4) Dîsa ji kurdan re dibêje ku Siltan Evdilhemîd ji we re tiştê baş nake, çî başî hebe ancax bi keda we ji we re çê bibe.

Di hejmara bîst û şeşan de, ev mijar bi sernivîsa “Kurd û Ermenî” bêtir hatiye zelal kirin. Di vê nivîsê de rasterast Siltan Evdilhemîd berpîrsîyarê şerê hevkuştinên di nava kurd û ermenîyan de tê pêşkêşkirin. Di nivîsê de, hatîye gotin ku Siltan Evdilhemîd bo domandina berjewendîyên siltanîya xwe bi zilma ku dike re, li gor gotina xwe ya çalexwarî ya “dabeş bike, birêve bibe”, di navbera her du kesên alîkarîya hev dikin an du birayên ku ji hev hes dikin de jî dikare dijminahîyê pêk bîne. Ev jî dibe delîla fesadîya Siltan Evdilhemîd a di navbera kurd û ermenîyên ku berê pir ji hev hes dikirin lê niha ji hev nefret dikin de. Dide zanîn ku ev hevkuştina kurd û ermenîyan jî bi rêya Alayên Hemîdîye hatîye birêxistin. Wek mînak Mistefa Paşayê ji eşîra “Mîran” ku li Diyarbekirê dijîya û Emîn Paşayê ji eşîra Heyderan ku li Wanê dijîya nîşan dide.

Di hejmara 27an de, bi du beşan behsa vê mijarê dike:

Beşa yekem ku bi tirkî ye, li serê beşa kurdî nivîsîye. Ev helwesta bi tirkî sernivîs jî nîşan dide ku êdî piranîya rojnameya Kurdistanê bi navê xwe kurdî ye lê bi piranî tirkî ye. Di vê beşê de pêşîyê balê dikişîne ser xizmeta kurdan û dipirse ey kurdino we ewqas xizmeta tirkan kir we çî qencî dît? Heta niha bes behsa Siltan dikir

lê li virê tirkan wek bîyanîyên pênc sed sal berê hatine dide nasîn û dibêje dev ji xizmeta Siltan û tirkan berdin. Siltanê ku soz daye Rûsyayê dê Kurdistanê pêşkêşê wan bike, li cihê ku hûn bo xwe bixebitin nehêlin Kurdistan bikeve destê mosqof, hûn xwe bi xwe hev dikujîn, jin û zarokên ermenî yên masûm dikujin. Li ser rola Siltan a di vê kuştinê de radiweste: “Ebdulhemîd dibêje ku ‘ermenî neyarên we ne’ we vê xeberê îxfal dike. Ma un nizanin ku Ermenî nikarin neyarîya we bikin! Neyarê we ew Xunkar e ku we hemîya welatê we ve mosqof re wa’ d dike.” Paşê balê dikişîne ser helwesta Şêx Ubeydulahê Nehrî ku daxwaza Siltan Evdilhemîd a kuştina Ermenîyan red kiribû û gotibû ku em îro ermenîyan besebeb bikujin dê rojek hinên din jî me bikujin. Li ser vê dibêje ku tirk ji bêtifaqîya me sûd digirin. Nav me kurdan de hakimên qenc û adil hene, bila ew bibin rêberê me, em ê heta kengê bin destê tirkan de bimînin! Kurdan tu car merivên aciz nekuştine lakîn memûrê tirkan ew xapand ew çû ermenîyên aciz kuştin. Di dawîya vê nivîsê de ji kurdan re banga amadekirina îtîfaqa di nava xwe û ermenîyan de dike. Dibêje ez ê jî bi awakî bêm welat û îsbat bikim ku kuştina ermenîyan bi teşwîqa Siltan Evdilhemîd pêk hatiye.

Beşa duyem a vê hejmarê ku behsa kurd û ermenîyan dike, dîsa wek hejmara 26an bi tirkî bi sernava “Ji Kurdan re” ye. Di destpêka vê nivîsê de pesnê welatperwerî û neteweperwerîyê dide û rexneya çawa bi fesadîya siltan, ermenîyên cîran heta zarok û jinên wan bi destê kurdan têne kuştin dike. Dibêje kesên di vî karê Siltan û memûrên wî yên zalim de cih bigire, dê bibe wek kesên ku ji wan tê nefretkirinê. Balê dikişîne ser kuştina ermenîyan bi destê kurdên nezan û dibêje ev nelayîqê tarîxa başîtiyê ya kurdan e. Mînaka Şêx Ubeydulah a ku li bajarê Wanê di civîna teşwîqkirina kuştina ermenîyan de, li hember fermana Siltan Evdilhemîd radibe, dibêje ‘ev ne rast e, neheqî ye, kesê ku neheqîyê bike, çi siltan çi xelîfe kî dibe bila bibe divê li hember bê rawestin’. Dîsa di dawîya nivîsê de pêşniyaza tifaqa kurdan û ermenîyan dike.

Em dixwazin rola “Alayên Siwarên Hemîdî” di hevkuştina kurd û ermenîyan de derxin ber çavan.¹⁰⁴ Hejmara bîst û heştan bi piranî vê mijarê digire dest. Pêşîyê bi kurdî li ser Alayên Siwarên Hemîdî û girîngîya cihê Kurdistanê radiweste. Balê

¹⁰⁴ Osman Aytar, *Hamidiye Alaylarından Köy Koruculuğuna*, Medya Güneşi Yayınları, İstanbul 1992 (r. 27)

dikişîne ku Kurdistan li ser sînore Îran û Rûsyayê ye. Îranê jî wek Osmanî li ber hilweşînê nîşan dide, lê balê dikişîne ser Rûsyayê ku meyla wê ya dagirkirina Kurdistanê heye bo xwe gihandina deryayên mezin di ser Kurdistanê re. Dibêje ewqas cihê Kurdistanê girîng e, lê Osmanî tu amadekarî bo parastina wê nekirîye. Wek mînak berî her tiştî jibo parastina welat ne rêyên hesin bo trênan çêkirîne ku leşker û çekên giran zû bigihînin qada şer ne jî li Serhedê bingeheşkerî yên xurt avakirîne. Rabûye di sala 1891an¹⁰⁵ de, fermana avakirina ev Alayên Siwarên Hemîdî bi pêşniyaza Zekî Paşa daye ku wek hêzên hêrîşkar pêwîst bin jî pêşîyê divîya hêzên parastina welat bihatana xurtkirin. Piştî vê agahîyê Evdîrehman Bedîrxan angaşt dike ku esas ev Alayên Siwarên Hemîdî bo rê li ber tifaqa ermenî û kurdan bigire, vê hêzê li hember ermenî û kurdên azadîxwaz bikar bîne, hatine avakirin. Jixwe daxwaza Siltan Evdîlhemîd jî ew e ku bêtifaqî têxe nava milletê da li hember zilma wî ranebîn. Îro li Kurdistanê Alayên Siwarên Hemîdî bûne sedem ku welat bibe cihê şerê navxweyî. Şer di navbera sê hêzan de pêk tê. Yek Kurdên Alayên Siwarên Hemîdî, yek ermenî û yek jî kurdên dervayê Alayên Siwarên Hemîdî ne. Kurdistan bûye qada şer. Pirrî ku Alayên Siwarên Hemîdî hêrîşê mal û milkê her kesî dikin, her tişt talan dikin, hemû kurd bo xwe biparêzin dixwazin bikevin nava alayên Siwarên Hemîdî, lê Siltan bo fitne û fesadîyê daxwaza hinekan qebûl nake. Zekî Paşayê ku siwarên Qazaqên Rûs mînak digirt, bo ereban jî Alayên Siwarên Hemîdî pêşniyaz kir, Siltan ew jî qebûl kir. Her çiqasî siwarên Qazaq mînak hatibûn girtin jî lê siwarên Hemîdî wek wan nedihatîn bikaranîn. Rûsyayê bo keşf û agahî girtina ji welatên derdore bikar dihanîn, lê siwarên Hemîdî bo fitne û fesadîya nava welat dihatin bikaranîn.

Di beşa bi tirkî de heman tişt tene nivîsîn. Bes behsa leşkerên Ocaxa Yenîçerîyan a ku ji ciwanên bîyanî dihat pêkanîn û ji ber xerabîya wan a wek siwarên Hemîdî, di sala 1826an de ji aliyê Mahmûdê Duyem ve ji holê hatibû rakirin, tê kirin. Dîsa behsa nerihetîya fermandarên payebilin ên leşkerî jî ji Alayên Siwarên Hemîdî tê kirin. Lê tê gotin ku siltan guhdariya wan jî nekirîye.

Di hejmara bîst û nehan de jî ev mijar bi sernivîsa “Wezîyeta Hazir û Musteqbel a Kurdistanê”, bi kurdî û tirkî tê nivîsîn. Çar xalên hêjayê lêkolînê li ser

¹⁰⁵ Rohat Alakom, *Eski İstanbul Kürtleri*, Weşanên Avesta, Stenbol 1998 (r. 45)

vê mijarê pêşkêş dike. Yek wek helwesta siltan a çewt dide zanîn û ji kurdan daxwaz dike ku divê bi ermenîyên ku li hember zilma siltan radibin re bibin yek û li hember vê helwesta Siltan a ku kurd û ermenîyan bera hev dide, rabin. Eger nebin yek dê kurd û ermenî ji holê bêne rakirin. Xala duyem tawanbarkirina kurdan a bi kuştina ermenîyan e. Wek mînak Garo Sasunî di pirtûka xwe ya bi navê “Hereketên Netewî yên Kurd û Ji Sedsala 15. Heta Roja Me Pêwendîyên Kurd-Ermenîya” de, bi tirkî wiha nivîsiye: “Gerçekten de bize sorarsanız, Ermeni Ulusu’na –hiç olmazsa 19. yüzyıldan itibaren- sürekli olarak hangi halk daha çok zarar vermiştir diye, o zaman “Kürtler’dir” cevabını vermeyecek olan hiçbir Ermeni bulamazsınız.”¹⁰⁶ Ev tawanbarkirin rasterast bo gelê kurd hatîye kirin. Li hember vê tawanbarîyê dibêje eger kurdan bi xwe bixwestana ermenîyan bikuştin çima ewqas sal kurd û ermenî wek bira bi hev re dijîyan. Dide zanîn ku Siltan kurdên nezan li hember ermenîyan bikar tîne. Xala sêyem helwesta hin ermenîyên ku zilma Siltan bi Misilmantîyê ve girêdidin e. Bi vî awayî hemû misilmanên tirk û kurd ji xwe dûr dixînin û kîn, nefretê derdixin holê. Ew jî baş dizanin ku li tu bajarî ji kurdan an tirkan bêtir nînin. Hewldana wan a bo Ermenistaneke serbixwe dijîtiya Misilmantîyê û milletê fedî û şerm e. Eger ji serî de ermenîyan bi kurdan re îtîfaq bikira heta niha dê bigihîştana mafên xwe. Di serî de îngilîzan alîkarî da serhildana ermenîyan bi fikra ku millet hemî beşdar dibe, lê paşê dîtin ku serhildan ne tenê li hember Siltan e, li hember milletê bi xwe ye jî dev ji alîkarîya ermenîyan berdan. Xala çarem helwesta Rûsyayê ye ku dizane tevlihevî û dubendî welatek lawaz dike. Lewra hinek nûkirinên ku Osmanî dixwest bike jî bi hîleyan asteng dikir. Ermenîyên koçî Rûsyayê dikirin radestî Osmanî dikir. Siltan dema zilmê dikir Rûsyayê pesnê wê bi başî dida. Ji balyozên xwe yên bajarên Osmanî dixwest ku bi bertîlan kurdan li dijî ermenîyan teşwîq bikin û ji alîyekî din ve jî ji ermenîyan re digot ku ew di destê Siltan de mezlûm in, divê ew ola ortodoksîyê hilbijêrin da ku Rûsya karibe wan biparêze. Ev karê Rûsyayê ku bi awayek baş nêzîkî miletan dibe heta wan dixwe bindestê xwe, paşê li wan dizivire, tu mafek wan ên neteweyî li holê nahêle. Divê ermenî baş bizanin ku ti carî Rûsya Ermenistanek serbixwe li kêleka xwe naxwaze. Di dawîya nivîsê de Evdirehman Bedirxan ji ermenîyan dixwaze ku bi dewleta Osmanî re li bextewarîya

¹⁰⁶ Garo Sasunî, *Kürt Ulusal Hareketleri ve 15. yüzyıldan Günümüze Ermeni Kürt İlişkileri*, Weşanên Med, Stenbol 1992 (r. 201)

xwe bigerin an na tu bextewarî ji Rûsyayê nabînin. Eger ermenî ji Osmanî veqetin jî dê dîsa dewleta Osmanî bi serê xwe bijî. Bes xemgînîyek ji me re dimîne, ew jî ew e ku ewqas deme ermenî bi me re dijîn û wê niha ji me veqetin.

Di hejmara sihan de ev mijar, di beşên kurdî û tirkî de bi sernivîsa “Li Kurdistanê Esasa Dubendîyê” heye. Ev nivîs bi piranî li ser mîsyonerîya rahibên Jezwîtan rewestîyaye. Di serê vê nivîsê de, behsa xerabîya mîsyonerîya Jezwîtan a li Çînê hatiye kirin. Paşê behsa pişgirîya Fransayê ya ku bi fermî ji mîsyoneran re kirîye dike. Wek mînak li ser vê piştgirîyê, behsa peymana xwedî pênc merc a ku di dehê Mijdarê de, di navbera Fransa û dewleta Osmanî de hatiye îmzekirin dike. Bi taybetî mercê sêyem gelek bandor li ser peywendîyên kurd û ermenîyan dikare bike. Ew jî wiha ye: “Veavakirina hemû dibistan, nexweşxane û cihên din ên di salên 1894, 95, 96an de, dema bûyera ermenîyan de, hilweşîyane an zerar dîtine, divê bê kirin.”¹⁰⁷ Ev bûyerên ku di nava kurd û ermenîyan de çê bûne jî bi xerabîya mîsyoner û Rûsyayê ve girê dide. Wek destpêk jî Peymana Berlînê ya piştî şerê Osmanî-Rûs ê salên 1877-78an nîşan dide. Dibe ku berê kurd û ermenî bi hev re welatê xwe diparastin. Wek mînak di dema Teymûr Leng de, li hember hêrîşa Rûsyayê ya bi ser Kurdistanê ve, tu Misilmanek bi qasî Ermenîyan dibexwe nedaye. Rûsya bo berjewendîyên xwe li hember sepandina Qanûnê Esasî derdikeve. Fransa jî bo berjewendîyên xwe mîsyoneran bikar tîne. Misilman û Xiristîyanan bera hev dide.

7. TÊKILIYÊN EVDIREHMAN BEDIRXANÊ XWEDIYÊ ROJNAMEYÊ Û CEMİYETA ÎTÎHAD Û TERAQİYÊ

Cemiyeta Îtîhad û Terakîyê(CÎT), li gor gelek çavkanîyan¹⁰⁸ bingeha xwe ji Îtîhada (Yekîtiya) Osmanî ya ku ji pênc damezrînerên wê du kes (Îshak Sikûtî û Evdila Cewdet) kurd in, girtîye. Îtîhada Osmanî di sala 1889an de, li Stenbolê ji aliyê Îbrahîm Temoyê Arnawidî¹⁰⁹, Îshak Sikûtîyê Amedî, Abdulah Cewdetê Erebgîrî¹¹⁰,

¹⁰⁷ *Rojnameya Kurdistanê*, Çapa sêyem, Tehran 2006 (r. 125)

¹⁰⁸ M. Şükrü Hanioglu, *Bir Siyasal Düşünür Olarak Doktor Abdullah Cevdet ve Dönemi*, Üçdal Neşriyat, Stenbol 1986 (r. 211); *Bir Siyasal Örgüt Olarak Osmanlı İttihad ve Terakki Cemiyeti ve Jön Türklük (1889-1902)* (r 180)

¹⁰⁹ İbrahim Temo, *İttihad ve Terakki Cemiyeti'nin kurucusu ve 1/1 no'lu üyesi İbrahim Temo'nun İttihad ve Terakki Anıları*, Arba Yayınları, İstanbul 1987 (r. 5)

Mehemed Reşîdê Çerkezê Kafkasî û Huseyînzade Elîyê Bakûyî ve tê damezrandin.

Di sala 1894an de, peywendî bi Ahmed Riza Begê Serokê Jon Tirkî li Parisê re datînin. Navê Îtîhadî Osmanî jî diguherînin, dîkin Cemîyeta Îtîhad û Terakî ya Osmanî.¹¹¹

Rojnameya Osmanî ya ku 1ê Kanûna 1897an dest bi weşanê dike, ji aliyê Îshak Sikûtî ve tê amadekirin û redaktorê wê jî Dr. Abdullah Cewdet e. Li gor agahiyên ku Malmîsanîj daye, di hejmara 20. a rojnameya Osmanî (1898) ku ji aliyê navenda CÎTê ve dihat weşandin, di rûpela heştan de, nivîsek bi sernivîsa “Malbata Bedirxaniyan” cih digire. Di hejmara 22. a rojnameya Osmanî (15ê Cotmeha 1898) de behsa hatina Evdîrehman Bedirxan a Cenêvê tê kirin. Di vê hejmara rojnameyê de tê gotin ku hejmarên şeş û heftan ên rojnameya Kurdistanê di çapxaneyê rojnameya Osmanî de hatine çapkirin.

Ji xwe wek ku me di tabloya weşana rojnameya Kurdistanê de, dîyar kiribû ji hejmara şeşan heta hejmara hejdehan, di binê rojnameya Kurdistanê de hatiye nivîsîn ku li Cenêvê di “Metbea ‘Cem’iyeta Tîfaq û Qencîya Musulmana’ tebi’ bîye”. Meriv kare vê çapxaneyê wek ya Cemîyeta Îtîhad û Terakî jî binirxîne. Dîsa di hejmara 35. a vê rojnameyê (1ê Gulana 1899), rûpela çaran de, nivîsek bi sernavê “Rojnameya Kurdistanê” heye.

Ji dema ku Evdîrehman Bedirxan bûye xwedîyê rojnameya Kurdistanê bi şûn de, êdî rojnameya Kurdistanê jî bi rojnameya Osmanî re li bajarên Ewropayê yên wek Cenêv, London û Folkestonê dertê. Ji vê hevkarîya rojnameya Osmanî ku her dem li bin navê wê Organa weşanê ya Jon Tirkî (Organe de la Jeune Turquie) dihat nivîsîn û rojnameya Kurdistanê jî dîyar e ku Evdîrehman Bedirxan wek kesek çalak di nava Jon Tirkî de dixebite. Li gor Dr. Celîlê Celîl ku ji hejmarek rojnameya Nurdar a Ermenîyan ku di sala 1900î de hatiye weşandin, neqil kiriye, behsa

¹¹⁰ Malmîsanîj, *Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*, Jina Nû Yayınları, Uppsala Mayıs 1986 (r. 12)

¹¹¹ M. Şükrü Hanioğlu, *Bir Siyasal Düşünür Olarak Doktor Abdullah Cevdet ve Dönemi* (r.211); *Bir Siyasal Örgüt Olarak Osmanlı İttihad ve Terakki Cemiyeti ve Jön Türklük 1889-1902* (r. 180)

Evdirehman Bedirxan wek “serokekî bizavî û xebatkar ê tirkên ciwan (Jon Tirk) li derve” tê kirin.¹¹²

Navê rojnameya Kurdistanê, di benda “Jon Turk”a Ansîklopediya Îslamê, di nava kovarên/rojnameyên ku di bin sernavê “Kovarên/rojnameyên ku kêşeyên ûnsûrek diyar a Osmanî tînin ziman” de ne, hatiye nivîsîn. Meriv kare bibêje sedemê nîşandana Rojnameya Kurdistanê di nava rojnameyên Jon Tirkan de ji helwesta Evdirehman Bedirxan tê. Çawa ku gelek caran behsa wî û rojnameya Kurdistanê di rojnameya Osmanî de derbas bûye, wisa wî jî nivîs ji rojnameya Osmanî girtîne. Wek mînak di hejmara 17an de helbestek bi navê “Paris’e Muvâsalat”, bi zimanê tirkî 13 malik e, ji rojnameya Osmanî girtîye.¹¹³ Dîsa di vê hejmarê de nameyek bi înzeya “Bir Kürd”¹¹⁴ heye ku ev nav ji aliyê Evdilah Cewdetê damezrînerê CÎTê ve tê bikar anîn. Di hejmara sihem a rojnameya Kurdistanê de mirina Îshaq Sukûtî bi sernivîsa “Zîya-î Azîm”¹¹⁵ hatiye dayîn. Ev jî dide zanîn ku Evdirehman Bedirxan bi Jon Tirkan re hevkar e.

Di hejmara 31. a rojnameya Kurdistanê de, bi kurdî û bi tirkî rasterast behsa kongreya 1. a CÎTê dike û di derbarê vê kongreya ku ew jî beşdar bûye de agahîyên berfireh dide.¹¹⁶ Piştî van agahîyan em dikarin bibêjin ku Evdirehman Bedirxan jî yek ji endamên CÎTê ye. Bi tevî ku Ahmed Rizayê pêşengê grûba tirkperestan soza piştgirîya rojnameyê dabû Evdirehman Bedirxan, lê di dawîyê de hat dîtin ku ev soz bo xapandinê hatibû dayîn û tu car bi cih nehat.¹¹⁷

¹¹² Celîlê Celîl, 19.yy Sonu-20.yy Başî *Kürt Aydınlanması*, Weşanên Avesta, Stenbol 2001 (r. 30)

¹¹³ *Kurdistan Yekemîn Rojnameya bi Kurdî (1898-1902) Hemû Hejmar [01-31]*, Weşanên J&Jyê çapa taybet, Diyarbekir 2018 (r. 231)

¹¹⁴ Kurdistan (r. 234-235)

¹¹⁵ Kurdistan (r. 461)

¹¹⁶ Kurdistan (kurdî, r. 468-472; tirkî, r. 475-479)

¹¹⁷ Djene Rhys Bajalan, *Jön Kürtler Birinci Dünya Savaşı'ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914)*, Weşanên Avesta, Stenbol 2010 (r. 87)

ENCAM

Di encama vê xebatê de me dît ku ji destpêka weşangerîya kurdî ve zext û zorên li ser berhemên zimanê kurdî her hebûne. Çi pirtûk be wek “El Hedîyetu-el Hemîdiye Fîl-Lugeti-el Kurdîye”, bi tevî ku hatiye dîyarîkirin bo Siltan Evdilhemîd jî, ji vê fişarê rizgar nebûye. Çi jî rojname be, wek Rojnameya Kurdistanê ku ji hejmara yekem ve bi fermana Siltan hatiye qedexekirin.

Di destpêkê de rojnameya Kurdistanê xizmetek baş ji bo klasîkên kurdî yên destxet re kirîye. Bo nimûne Mem û Zîna Ehmedê Xanî ku di wêjeya kurdî de klasîkek bi nav û deng e, beş bi beş hatiye çapkirin.

Xizmetek girîng a dî ku rojnameyê di destpêkê de kirîye beş bi beş dîroka kurdan ji çavkanîyên wek Şerefnameyê çapkirine. Ev jî nîşan dide ku di serî de rojnameya Kurdistanê neteweyî bûye, paşê ketîye nava karên sîyasî.

Em nizanin pêwendîyên Miqdad Mîdhet Bedirxan bi Cemîyeta Îtîhad û Terakkî re, bi taybetî jî bi Evdila Cewdetê ku wek rêberê fikrî yê cemîyetê bû û Îshaq Sikûtîyê ku wek rêberê birêxistênê bû, re hebûn an na. Ev jî mijarek girîng e ku dibe li serê xebat bê kirin.

Dema ku Evdirehman Bedirxan rojnameya Kurdistanê derdixe êdî hevkarîya wî ya bi Cemîyetê re pir zêde ye. Him rojname li çapxaneya Cemîyetê çap dibe him jî nivîsên di rojnameya Osmanî ya Cemîyetê de hatine weşandin di rojnameya Kurdistanê de jî cih digirin.

Cemîyeta Îtîhad û Terakkîyê ne rêxistinek homojen e. Piştî mirina Îshaq Sikûtîyê organîzatorê Cemîyetê, hêza kurdan di nava cemîyetê de kêmkirî dibe. Di Kongreya Azadîxwazên Osmanî ya li Parisê de, Evdirehman Bedirxan bi Ahmed Rizayê ku dê paşê fikra tirkperstiyê derxîne pêşîya Îtîhada Osmanî, re tevdigere.

Him Mîqdad Mîdhet Bedirxan him jî Evdirehman Bedirxan, di rojnameya Kurdistanê de cihek girîng dane peywendîyên kurd û ermenîyan. Li gor serdema ku rojname derdikeve, ev helwesta wan dikare wek wêrekîyek mezin bê nirxandin.



ÇAVKANÎ

ALAKOM, Rohat; *Eski İstanbul Kürtleri (1453-1925)*, Weşanên Avesta, İstanbul 1998

ALAKOM, Rohat, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, Çapa 2. Weşanên Deng, Stenbol 1991

ALAN, Ahmet, *Hetawî Kurd 1913-1914*, Avesta Yayınları, Stenbol 2017

AKPINAR, Alişan, Eugene L. Rogan; *Aşiret Mektep Devlet Osmanlı Devleti 'nde Aşiret Mektebi*, Aram Yayıncılık, Stenbol 2001

AYTAR, Osman, *Hamidiye Alaylarından Köy Koruculuğuna*, Medya Güneşi Yayınları, Stenbol 1992

BAJALAN, Djene Rhys, *Jön Kürtler Birinci Dünya Savaşı'ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1902)*, Avesta Yayınları, İstanbul 2010

BEDLÎSÎ, Şerefxanê, Şerefname, wer. Ziya Avcı, Avesta, Stenbol 2007

BOZASLAN, M. Emin, *Kurdistan, Rojnameya Kurdî ya Pêşîn, 1898-1902*, Cild I-II, Weşanxana Deng, Uppsala 1991

BRUINESSEN, Martîn van, *Kürdolojinin Bahçesinde*, Weşanên Vate, Stenbol 2009

BURKAY, Kemal, *Kürtler ve Kürdistan*, Weşanên Dengê, Çapa 5. Stenbol 2011

CELÎL, Celîlê, *Kürt Aydınlanması*, Avesta Yayınları, İstanbul 2000

CELÎL, Dr. Celîlê, Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan (Di dawîya Sedsala 19an û Destpêka Sedsala 20an de), Weşanên Jîna Nû, Uppsala 1985

ÇETÎN, Mahmut, *Îsyancı Bedirhan Bey'in Yaramaz Çocukları ve Bir Kardeşlik Poetikası* **kart-kurt** sesleri, biyografi.net yayınları, İstanbul 2005

DÊRSÎMÎ, Dr. Beytar Mehmed Nûrî, Kürdistan Tarihinde Dersim/Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim, Weşanên DAMê, Çapa 1. Stenbol Adar 2014

DILGEŞ, Felat (Abdullah Kîran); *Rojnameya Kurdî ya Herî Pêşîn KURDISTAN*, Çapa 2. Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2017

DOST, Jan, Ehmedê Xanî **Mem û Zîn** Şîrove û kurdiya îro, Avesta, Stenbol 2010

FERHO, Medenî, Medya Ziman û Cîvak, Weşanên Do, Stenbol 2015

HANİOĞLU, M. Şükrü, *Bir Siyasal Örgüt Olarak Osmanlı İttihad ve Terakki Cemiyeti ve Jön Türklük (1889-1902)*, İletişim Yayınları, Stenbol 1986

HANİOĞLU, M. Şükrü, **Osmanlı Basını** “Jön Türkler” Maddesi, İslam Ansiklopedisi, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları

HANİOĞLU, M. Şükrü, *Bir Siyasal Düşünür Olarak Doktor Abdullah Cevdet ve Dönemi*, Üçdal Neşriyat, Stenbol 1981

HASANPOUR, Amir, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil (1918-1985)*, Weşanên Avesta, Stenbol 2005

İNCİOĞLU, Yasemin G., Nebahat A. Çomak, *Metin Çözümlemeleri*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul 2009

JWAIDEH, Wadie, *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi*, İletişim Yayınları, Çapa 8. Stenbol 2014

KAFTAN, Dr. Kaws, *19. YY. Bölgesel Kısa Kürt Tarihi Baban Botan Soran*, Weşanên Nûjen, Stenbol 1996

KARADEMİR, Nihat; Sultan Abdülhamid ve Kürtler, Nûbihar, 2014 Stenbol

KAYA, Fetullah; Kürt Basını/Çapemeniya Kurd, Hivda Îletîşîm, Stenbol 2010

KLEIN, Janet, *Hamidiye Alayları İmparatorluğun Sınır Boyları ve Kürt Aşiretleri*, Weşanên Îletîşîmê, Çapa 2. Stenbol 2014

KOYÎ, Hacî Qadirî, Dîwan, edt. Arif Zêrevan, weş. Nefel, Sweden, 2004, r. 85, çapa dijîtal:

http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/haci_qadire_koyi_diwan_02.pdf?NR:79, 16.12.2013.

KURDISTAN, çapa sêyem, Tehran 2006

Kurdistan Press Rojnameya 15 Rojîn, Hejmar: 16/8, 17/9 1987

KUTLAY, Naci: İttihat Terakki ve Kürtler, Weşanên Beybûn, Ankara 1992

KUTLAY, Naci, *Kürtlerde Değişim ve Milliyetçilik*, Weşanên Dipnotê, Çapa 2. Ankara 2013

KUTLAY, Naci, *Osmnalıdan Günümüze Kürtler*, Weşanên Dipnotê, Ankara 2014

Kürt Tarih Dergisi, Hejmar 8, 2013

LÜTFÎ, Ahmed Ramiz, *Emir Bedirhan*, bgst yayınları, İstanbul 2007

MALMÎSANIJ, Yüzyılımızın Başlarında **Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet**, Jîna Nû Yayınları, Uppsala 1986

MALMÎSANIJ, Abdurrahman Bedirhan ve İlk Kürt Gazetesi Kurdistan, Sayı: 17-18, Çiriya Paşî 1992 Spanga Sweden

MALMÎSANIJ, Cızira Botanlı Bedirhaniler/Bedirxaniyên Cizîra Botanî, Çapa sêyem, Avesta, Stenbol 2009

MALMÎSANÎJ, İlk Kürt Gazetesi Kurdistan'ı Yayımlayan **Abdurrahman Bedirhan 1868-1936**, Vate, İstanbul 2011

MARDÎN, Şerif, Jön Türklerin Siyasi Fikirleri 1895-1908, Weşanên Îletîşim, Çapa 21. Stenbol 2017

MEHMÛD HIRORÎ, Dr. Selah Muhemed Selîm, *Malbata Bedirxaniyan Bizava wê ya Siyasî û rewşenbîrî di navbera salên 1900-1950 da*, Weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Duhok 2010

MUKRÎYANÎ, Gîw, Dîwanî Hacî Qadir Koyî, Çapî sêyem, Hewlêr 1969 (r.3)

OZOGLU, Hakan, *Osmanlı'da Kürt Milliyetçiliği-Kimlik, Evrim, Sadakat, Weşanên Îletîşîm, Stenbol 2017*

ÖRS, Orhan, *İttihad ve Terakki Cemiyetinin Kürt Politikası 1908-1914*, Teblîxa bo Sempozyûma Navnetweyî ya Kurdan, Weşanên Zanîngeha Bîngolê, Bîngol 2013

ROJÎ KURD 1913, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Adar 2013

ROJÎ KURD, Weşanên War, 2002 Stenbol

SASUNÎ, Garo; Kürt Ulusal Hareketleri ve 15. Yüzyıldan Günümüze Ermeni Kürt İlişkileri, Med Yayınları, Stenbol 1992

SECADÎ, Eladîn, Mêjûy Edebî Kurd, Çapxaney Marûf, Çapî yekem, Bexda 1952 (r.308)

SOYLU, Kerem, Zend Bihar 2007

SULTAN, Abdülhamit, Siyasî Hatıratım, Dergah Yayınları, Çapa 7., Stenbol Gulan 2010

SÜPHANDAĞ, Kemal, *Büyük Osmanlı Entrikası Hamidiye Alayları*, Weşanxaney Komal, Stenbol 2006

SÜPHANDAĞ, Kemal, Hamidiye Alayları Ağrı Kürt Direnişi ve Zilan Katliamı, Weşanên Perî, Stenbol 2012

ŞEN, M. Emin, **II. Abdülhamit'in Kürt Politikası**, Teblîxa bo Sempozyûma Navnetewî ya Kurdan, Weşanên Zanîngeha Bîngolê, Bingol 2013

TEKÎN, Bülent, **Kürt Sorunu ve Sayılmayan İsyancılar 1514-1919**, çapa 2. Weşanên Dara, Diyarbekir 2017

TEMO, İbrahim, **İttihad ve Terakki Cemiyeti'nin Kurucusu ve 1/1 no'lu üyesi İbrahim Temo'nun İttihad ve Terakki Anıları**, Arba Yayınları, İstanbul 1987

TEWFÎQ, Hogir Tahir, Elîfba Kurdî bi tîpên 'erebî û latînî, peydabûn 1898-1932, Weşanên Spîrêzê, Duhok 2008

TEWFÎQ, Hogir Tahir, **Rola Rojnamegerîya Kurdî di Pêşvebirina Hizra Neteweyîya Kurdî da 1898-1918**, Weşanên Spîrêzê, Duhok 2009

TEWFÎQ, Hogir Tahir, **El-Kurd we'-l Mes'ele el Ermenîye 1877-1920**, Weşanên Dezgehê Aras, Hewlêr 2012

Türkçe Sözlük, TDK. Yayınları, çapa 9. cild 1-2, Ankara 1998

TÜTENGİL, Cavit Orhan, “Yeni Osmanlılar”dan Bu Yana **İngiltere’de Türk Gazeteciliği 1867-1967**, İş Bankası Yayını, İstanbul 2011

VALÎ, Abbas, Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri/Kokên Neteweperweriya Kurd, Avesta, Stenbol 2005

XEZNEDAR, Dr. Marif, Mêjûy Edebî Kurdî, Cild 4, Çapxeneya Aras, Hewlêr 2010

YEKDEŞ, Ömer Faruk ve Servet Erdem, **Tanzimat ve Edebiyat, Osmanlı İstanbulu’nda Modern Edebi Kültür**, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul 2014

YILDIRIM, Kadri, *Xaniyê Duyem Hacî Qadirê Koyî*, Weşanxaneyê Avesta, Stenbol 2016

YILDIZ, Hasan, *Aşiretten Ulusallığa Doğru **Kürtler***, Weşanên Firat-Dicle, Stenbol 1991

YILDIZ, Hasan, 20. Yüzyılın Başlarında *Kürt Siyasası ve **Modernizm***, Weşanên Doz, çapa 2. Stenbol 2006

YUCEL, Muslum, *Kürt Basın Tarihi-tekzip*, Weşanxaneyê Aram, Stenbol 1998

ZAGROSÎ, Aso, *Hecî Qadirê Koyî*, berhema neçapkirî.

ZEKÎ BEG, Mihemed Emîn, ***Dîroka Kurd û Kurdistanê***, Weşanên Avesta, Stenbol 2002

ZEND Kovar, du hejmar, bihar 2007 û zivistan 2014

PÊVEK-I

Tablo-1 Agahîyên Weşana Rojnameyê

Hejmar	Dîroka derketinê	Navê Çapxaneyê	Bajar
1	22.04.1898	El-Hîlal	Qahîre
2	06.05.1898	El-Hîlal	Qahîre
3	20.05.1898	El-Hîlal	Qahîre
4	03.06.1898	Cerîdeya Kurdistanê	Qahîre
5	17.06.1898	Cerîdeya Kurdistanê	Qahîre
6	11.10.1898	Cem'iyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
7	05.11.1898	Cem'iyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
8	01.12.1898	Cem'iyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
9	16.12.1898	Cem'iyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
10	06.01.1899	Cem'iyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
11	10.02.1899	Cem'iyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
12	03.03.1899	Cem'iyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
13	02.04.1899	Cem'iyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
14	20.04.1899	Cem'iyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev

15	05.05.1899	Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
16	06.08.1899	Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
17	28.08.1899	Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
18	04.09.1899	Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Misilmanan	Cenev
19	Agahî nîn e.	Agahî nîn e.	Agahî nîn e.
20	29.12.1899	Nenivîsiye	Qahîre
21	11.01.1900	Nenivîsiye	Qahîre
22	02.02.1900	Hindiye	Qahîre
23	24.02.1900	Hindiye	Qahîre
24	01.09.1900	Nenivîsiye	Londom
25	01.10.1900	Nenivîsiye	Folkstone
26	14.12.1900	Nenivîsiye	Folkstone
27	13.03.1901	Nenivîsiye	Folkstone
28	14.09.1901	Întîqam ¹¹⁸	Folkstone
29	14.10.1901	Întîqam	Folkstone
30	14.03.1902	Întîqam	Cenev
31	14.04.1902	Întîqam	Cenev

¹¹⁸ “Întîqam” navê rojnameya ku ji aliyê Komeleya Tolhildêr a Osmanîyên Nû ve dihat weşandinê ye. Çapxane jî ya vê komeleyê ye. Felat Dilgeş, Kurdistan (r. 57)

PÊVEK-II

عدد ۱۰

سالا عوێ ۱۳۱۵

دو پر ۱

عنوان

جنومده (کردستان) غزنه

صاحب و محوری بدرخان

پاشا زاده عبدالرحمن

هر طبعه ۲۰۰۰ نسخه کردستان

دلات خطات ارسال و رسا طبعه

فرا و فیه نشر و ترمیم اوله چنده

کردستان خازنده هر و همچون

سنگ آینه به لی

۸۰ غره نشر

کردستان داخلده خصوصی

اسیانتله بجایا کوئدر بلور

کردستان

۱۳۱۵

(پازده روزاده جابری نیت خلیه اندن جریده یا کردی به)

کردی تحصیل علوم و قوه انتویق ادر تصایع و ادبیات کردی حای

(لوز بش کونده و نشر اولور کردجه غزنه در)

غزنه ملک سلکته موانق عربیه ترکیه فارسیجه مکتوبتر کردی به بالترجه نشر اولور.

حیی ق کاغذکی ربکه

زمنزه دق سر کاغذی

وها - بیه :

بجو نجل المرحوم بدرخان

پاشا عبدالرحمن بك

هر جلد دو هزار جریه یا

ازی دیکم کردستانی

ده بلاش بدن خلکی

روزا آقیده ۲۰ شعبان ۱۳۱۶ جمعه فی ۲۴ کانون اول سنه ۱۳۱۴

سلطان عبدالحمید خان ثانی حاضر تقریر عر ضحالمدر

بادشاهم

طوبه یی مشکله آورویده بولتی رضای مایه تقریر مخالف اولدیندن
عنه بعضی و عدله بالاضاع در سعادته دعوت اولیوروم. اساساً استعاف
فوقه ناموریت و معانیم اولدی بجه بعضی بدکان شاهانه لربک ارتکاب
ایندکلی مطالباندن طولای حذوق عمومیه ملک تأمین ضعیفه ترک وطن
و ناموریت ایش اولدی بجه مد کور و عدلک غصه ده همین اولیوب
در سعادته عودتک مشرف اولدی بجه اسباب به ر غرضه اوغرامایق ایچون
آخیردن عریضه موریه بوجه زر عرض ادرم. تنویه که :

اولا الشی و بدنجی نوسرولی غزنه مایه عرض اولندی بجه وجهه
اصلا حبلک خان شیخون قبطی بجه بوندی بجه مظهر اولدی بجه توجیهات
سیرای توفیه خلافت مصلحه اسلامییه اشترک ایدن او الهامک جاری
اولان قوودی دولت و ملق عو ائیک درجه سته کتیرمش و علم مایه تقریر
استعافه بر جوق شاهی امیرا اشکده بولش اولدی بجه مرقومک لرتقی
موقع اقداردن انتظامیه مظالم و نناحت بر نتیجه و بر بیکر حقوق مقدسه
خلافتک تعرضدن عافطه سی.

کلیاً باب ضعیفه توفیه خاسیه حبسخانه عمومیه موقوف بولان
انتخامک تکتلی مظلوما و مندوراً حبس ایدلن کیمیلی اوج. کیمیلی

درت سندهن بری موقوف بولان قری حلقه نه ایچون توفیه ابدله کیردن
خبردار اولوب هنوز ایشلری دخی حلقه تودیم ایدلیان مظلومک تحقیق
احوالقریه شوعلی اقباس ایدن ضعیفه نظری حلقه ضعیف اندی حلقه
معامله قانونیهک ابراسی (ابوالهدانک قیوجیسی شیخ صادق دخی موقوفین
میلنده مرکه مرقوم شیخ صادق ابوالهدانک کورمش اولدی بجه بر قل شیمی
خارجیه سولیمیه حلقه تنقیقه بالانماس توفیه ایشلرک و دهعا بر جوق
قیوجی و او شافری بوکی اسبابدن طولای حبس و لی اولمشلردر.

ثانیاً بر جوق مظالم مرتکبکری بولان بدکان شاهانه ملک بلاستنا
حلقه ده معامله قانونیه امراسنه مساعده بولش. از حلقه مکی مایه رویتک
سکرنجی بازار کوی آفتام ساعت اون بر بجه قاضی کوی اسکسند و
جوق حشرات طرفدن این ملک حلقه ده وقوع بولان و عدت بر مجاورک
یاد اکر مکر فریق عیالک تبلیغ ایشلری لاده سینه ملوکانه استالاً امیرا
ایندکلی حشرات مرقومه قاضی کوی بولش. دلو سینه و کد بولش
درست ایدن اعالی حضورده. علناً اعتراف ایشلکری و شو نچا و جریم
مشهوددهن اولوب قانون جزایه ایکی سنه حبس جزاسی مستلزم اولدی
حلقه حشرات مرقومه بوجازدن است ابدله کیری کی اولوقت لوا بولان
مرقوم عیان ایکی کون سوکره لریق لولش و تبلیغ ایشلری حلقه العرض
اراده سینه طولای هیچ بر مؤال توجیه ایدلرک بوجه مرقوم توفیه

LATÎNÎZEKIRINA HEJMARA 10. A KURDISTANÊ

Eded 10

Sala ewilî

Rûper 1

Heçî vê kaxezekî
rêke ji min re, divê
ser kaxizê weha
binivîse:
“Bi xwe necl’ul-
merhûm Bedirxan
Paşa Ebdurrehman
Beg”

Her car du hezar
cerîdeya ez ê rêkim
Kurdistanê, da beleş
bidin xelkê

KURDISTAN

1315

(Pazde rojan carekê têt nivîsandin cerîdeya kurdî ye)
Kürdleri tahsil-i ulûm ve fûnûna teşvik eder nasayih ve
edebiyat-ı Kürdiye hâvî
(on beş günde bir neşrolunur Kürdçe gazetedir)
Gazetenin mesleğine muvafık Arabça, Türkçe, Farsîce
mektublar Kürdçeye bittercûme neşrolunur

Unvan
Genêve’de “Kürdistan”
gazetesi Sahib ve Muhariri
Bedirhan Paşazade
Abdurrahman
Her tebi’da 2000 nûsha
Kurdistan vûlat-ı izamina irsal
ve vesatetleriyle kura kasâbata
neşr-ü tamim olunacaktır

Kürdistan haricinde her yer için
senelik abone bedeli 80 kuruştur
Kürdistan dahilinde hususî
isteyenlere meccanen gönderilir

Roja îne de 20 Şe’banê 1316 – Cum’e fî 24 Kânun-i evvel sene 1315 ¹¹⁹

SULTAN ABDULHAMÎD XAN-I SANÎ HAZRETLERÎNE ARZİHALÎMDİR

Padişahım, tutduğum meslekle Avrupa’da bulunmak, rızay-i humayunlarına muhalif olduğundan bahisle ve bazı vaadlerle bil-itma’ Dersaadet’e davet olunuyorum. Esasen, istihakım fevkînde memuriyet ve maaşım olduğu halde bazı bendegan-ı şahanelerinin irtikap ettikleri mezalimden dolayı hukuk-i ‘umumiyeinin temini zımnında terk-i vatan ve memuriyet etmiş olduğumdan mezkur vaadlerin ‘indimde ehemiyeti olmayıp Dersa’adet’ ‘evdetimin mütevakkıf olduğu esbabı yine bir ğareze uğramamak için açıktan ‘arîza suretiyle bervech-i zîr arz ederim. Şöyle ki:

Evvela, altıncı ve yedinci numaralı gazetemle arz olunduğu vechile asla Haleb’in Xan Şeyxun (Han Şeyhun) kiptilerinden bulunduğu halde mazhar olduğu teveccihat-ı seniyeleri kuvetiyle hilafeti mu’azzama-i İslamiye’ye iştirak eden Ebül Huda’nın cari olan nüfuzdevlet ve milleti mahv etmek derecesine getirmiş ve nam-ı humayunlarına izafetle birçok şenayi’i icra etmekte bulunmuş olduğundan merhumun

¹¹⁹ Li gora tarîxa Mîladî 06 Çile 1899

artık mevki’i iktidardan iskatiyle mezalim ve şena’etine bir netice verilerek hukuki mukaddese-i hilafetin taarruzdan muhafazası.

Saniyen, Bab-ı Zabtiye tevkifhanesiyle hapisane-i ‘umumide mevkuf bulunan eşhasın sülüsani mazlumen ve mağduren hapsedilmiş. Kimisi üç kimisi dört seneden beri mevkuf bulundukları halde, ne için tevkif edildiklerinden haberdar olmayıp henüz işleri dahi Adliye’ye tevdi’ edilmeyen mazlumnin teahhik-i ahvalleriyle şu zulmü ika’ eden Zaptiye Nazırı Halil Şefik Efendi hakkında mu’amele-i kanuniyenin icrası, Ebulhüdanın kapıcısı Şeyh Sadık dahi mevkufın miyanındadır ki merhum Şeyh Sadık Ebulhüdanın görmüş olduğu bir fiil-i şeni’ni harice söylemesiyle Halil Şefik’e bi’l-iltimas tevkif ettirilmiş ve daha birçok kapıcı ve uşakları bu gibi esbabdan dolayı hapis ve nefi olunmuşlardır.

Salisen, birçok mezalim-i mürtekipleri bulunan bendegân-ı şahanenin bi’l-istisna haklarında muamele-i kanuniye icrasına müsaade buyurulması ez-cümle geçen mayıs-ı rûmînin sekizinci Pazar günü akşam saat on bir buçukta Kadıköy İskelesi’nde birçok haşerat tarafından Emin Bey hakkında vukubulunan vahşet ve tecavüzün yaver-i ekreminiz ferik Osman’ın tebliğ ettiği irade-i seniyye-i mülûkanelerine imtisalen icra ettiklerini heşerat-ı merkume, Kadıköy Polis Dairesi’nde ve kendilerini derdest eden ahali huzurunda ‘alenen itiraf ettikleri ve şu tecavüz-i ceraim meşhudeden olup kanunu cezace iki sene hapis cezasını müstelzim olduğu halde haşerat-ı merkume bu cezadan istisna edildikleri gibi ol vakit liva bulunan merhum Osman iki gün sonra ferik olmuş ve tebliğ ettiği salifü’l-arz irade-i seniyyeden dolayı hiçbir sual tevecüh etmeyerek ber vech-i ma’ruz terfi’i rütbe etmiştir ki şu hal değil yalnız İstanbul halkının bütün Avrupa’nın dahi hayret ve nefretini mucib olmuştur. Haşerat-ı merkume el-yevm İstanbul’da olup çakerlerini İstanbul’a celb ettirmek için biraderlerim hakkında bir cinayet irtikab edecekleri Zaptiye Nezareti’ne ihbar olunduğu halde ehemmiyet verilmediğinden merhum Osman ile pâdaş şena’atı olan heşeratın mahkeme-i aidelerine terki.

Rabi’an, bazı memurîn mûte‘allikası tarafından eshabi müracaata tebliğ olunan iradat-ı seniyyenin asl u esası çıkmıyor ki şu hal hilafet-i Osmaniye’nin mahabet ü ‘azametini mahv ve izale ve binaenaleyh bütün Müslümanların hukukunu ihlal etmekte olduğundan ıslahı.

Hamisen, mensubu olduğum Kürd kavm-i necîbini dahi ni‘met-i ma‘arîfden hisse-mend ve istifade etmek ve esasen mücerred ve ehl-i kanaattan olduğumdan Beytû’l-Mâl’e dahi bâr olmamak ve esbab-ı ma‘îşetimi şu vesile-i meşru‘a ile temin edebilmek üzere bir müdetten beri tab‘ u neşrine devam ettiğim iş bu “Kürdistan” Gazetesi’nin hükümet-i seniyenin tensibi vechile Dersaadet’te dahi neşredebilmek üzere imtiyazının ‘uhdeme tevcihi.

Padişahım, iş bu ma‘ruzatımdan dahi ma‘lum-i şahaneleri buyurulacağı vechile birçok esdika ve hayır-hahan-ı millet haklarında birtakım hûnenin ilkaâtıyla reva görülen mezalim-i devlet-i ebed müddet-i Osmaniyelerini ta esasından lezzetan etmekte ve (el- imamu mes’ulün ‘ale’n-nasi ‘an ra‘iyyetihi) hadis-i şerifine nazaran mezalim-i cariyenin mes’uliyeti yalnız mürtekiplerine münhasır kalmayıp zat-ı şahanelerinden dahi sorulacağı der-kâr olmasına mebni hasbe’s-sadaka ahval-i cariyenin sem‘i hümayunlarına isaline mecbur olduğum ma’rûzdur.

BÎSMÎLLAHÎRREHMANÎRREHÎM

Însan mexlûqekî wiha ye ku nikare tenê ‘emir bike. Însan her divê new‘ê xwe re be. Heger nebit wek heywana dimîne. Mirovê tenê bi serê xwe nikare lewazîmatê xwe peyda bikit. Ew cilûcawê em werdigirin, ew tiştên em dixwin, ew çikên em di ‘emilînin, ew xanîyên em lê rûdinin hasilî heqas eşyayên ji me re lazim, yek mirov tu cara tu cîya nikare ji xwe re hasil bike. Lewma heger mirov bivê tenê ‘emir bike divê dereca heywanîyê razî bibe. Ji xeyrê vî mirov muhtacê hevalîya new‘ê xwe ye. Ser vî xeberê ye ku însana her xwe daye hev tu cara wek heywanatê serê çiya de newala de bi rêya de tenê nemaye her bi cemîyetê ‘emir kirîye. Lakîn neqabilê înkâr e ku însana re cemîyet çawa elzem e, hewqas jî cemîyet muhtacê reîs e. Bêserêk tu cem‘îyet tu ciya, li tu dera hasil nabe. Lewma kuderê cem‘îyetek heye mirov dibîne ku wê cem‘îyetê reîsekî heye. Wekî em dikevin malekî em dibînin ku wî malê de bavek dayîkekî zarû hene, navê vana nifûs in, wî malê de em dibînin ku bav reîsê hemîya ye. Çunku bav reîsekî aqil e, ye‘nî ji hemîya laîqtirê reîsîyê ew e. Wekî bav nemîne çunku dayîk ji zarûyê xwe ‘emirtir e, gelektir tecrubekar e serî de xaneyê reîs ew e. Wekî dayîk jî nebit reîsê wî malê birayê mezin e. Tu cara xweh nabe reîsî çunku mêr ji jina aqiltir fêmtir e, hasilî bi her sûret qenctir in. Her birayê mezin dibe reîsî, çunkî ‘elel ekser birayê mezin ji kiçiktir zêdetir dinê dîtiye û serî de hafîye. De vêca em

dibînin ku malkê re reîsek her lazim e. Lew malek du mirov bijî serekek wê heye. Ew her yê ji hemîya laîqtir û çêtir dibe serek heger ne mirovê wê malê be ji hev bela dibin sefil û bedbext dibin. Lakîn ev rîyaset mehdûd e. Bi vî rîyasetê însan nikare xizmeta seadeta xwe bike. Ev ancax ji hewalên malê re kîfayet dike, lakîn mirov wa xaricê malê de jî mi'amele hene. Lewma gelek 'eyala xwe dane hev bîne cem'îyetek mezintir. Vêca wekî se'adeta 'eyalekî mihtacê rîyasetê be mu'înê cem'îyetek mezintir zêdetir muhtacê rîyasetê ye. Ser vî xeberê ye ku her cemîyetê mezin de reîsek heye, hemî îta'etê ji wî re dikin. Vêca binîsbeta fewt û berîya vê cemîyetê reîsê wî namek heye. Heger kiçik be navê wî axa ye, heger meztir be navê wî beg e, heger hê meztir be navê wî padîşah e. De vêca her cemîyetek muhtacê reîs e, lakîn divê ew reîs laîqê wî meqamê xwe bit. Çawa malekî her yê ji hemûya çêtir dibe serek û hemî îta'etê ji wî re dikin, cemîyetek mezin de jî yê bibe serek divê ji hemûya zêdetir xwedî 'eqlû îdrakû xwedî exlaq û 'edaletê be. Wekî serekê malekî mirovek bê exlaq be, mirovên wê malê bedbext û perîşan dibin. Zarûyên wê malê muhtacê biyanîya dibin umrê xwe bi sefaletê dibûrîn. 'Eynen holê wekî reîsê cemîyetek mezin mirovek bedexlaq be, efrad û 'ezayên wê cemîyetê hemî feqîr û sefil dibin, heger ev hal dewam bike, neyar wî welatê zebt dike. Tu tişt destê efradê cemîyetê de namîne, heta dînê wan jî dest wan derkeve, tu namûs û heysîyet ji wan re namîne, mirin ji wî 'emrê gelek qencir e. Lewma efradê cemîyetekî wekî dibînin ku serekê wan mirovê xerab e, divê filhal tifaq bikin wî mirovê ji meqamê rîyasetê bavêjin, heger wa nekin ew hemî ê bêbext bibin, perîşaniya jin zarûyê wan ji wan mesûl e.

Çawa babek an dayîkek mala xwe de zarûyên xwe bi rehm û şevqet xwedan dike, padîshahek jî divê bi wî nezerê fikrit yê bin destê xwe de. Ew mirovê dibe reîsê cemîyetê xweyê qedr û îtîbarê, şayanê îtaatê lakîn bi wî şertî ku heger ew mirovê efradên bin destê xwe re bi edalet mûamele bike. Yê ew mirov kirine padîşah efradên wê cemîyetê ne. Bi wî padîşahî xwedan dikin, efradên bin destê wî de ne. Cemîyetek mihtacê reîs e lakîn ew reîs yanî ew padîşah zêdetir mihtacê efradên bindestê xwe ye. Heger ew efrad xwe jê bidin alîkî destê wî padîşahê de tu fewt namîne, ew jî dibe mirovekî adî, tu îtîbara wî namîne. Lakîn efrad mihtacê reîs, ew reîs mihtacê efrad e. Divê tu car ji edaletê cuda nebe. Heke necawe wekî babek fenkirî mala xwe jin û zarowên wî wê perîşan bibin, welê heger reîs netube/tunebe ew cemîyet perîşan dibe.

De vêca niho reîsê cemîyeta me Evdilhemîd e. Ev e bîst û du sal e padîşahîyê dike yanî ev e bîst û du sal e reîsê cemîyeta misilmana ye. Hinga hatî ser textê heta niho dewleta me her roj zeîftir dibe.

Hinga berî bîst sala bê şerî dewleta Rûsiyayê ew dewleta me, em ji rûsî nekêmtir bîn, lakîn xunkarê me bêsebeb ew qasî misilman rêya boş de hatin kuştin, ew em mexlûbê rûsî bîn. Berî bîst sala quweta dewleta me ser behrê gelek zêde bû. Îro ji wê quwetê tu tişt nemaye. Welatên dî yên dor me fila hemî me'mûr û abadan bîne, welatê me xerabezar e. Hikûmetên wê hemî dewlemend in, mirovên cem'iyeta me hemî jar û feqîr bîne. Ancax ew mitribên dor xunkar tenê dewlemend û mes'ûd in. Lakîn seadeta wan naghê zaroyên wan, çunkî bi vî halî zemanek hindik de neyar ê bîn vî welatî ji dest me bistînin. Berî du sala bê serî dewleta me ew yunanîyê Yunanistan ji Kurdistanê gelek kiçiktir e heta çend salekî ew der hemî bin destê dewleta me de bî lakîn çî ku reîsê dewleta me yanî xunkar ji edaletê ji rêya xwedê û pêxember nîşankirî cuda bî ew zilm li efradê cemîyeta xwe dike dewleta me her zeîf dibî, heta ku yunanîya dest ber xwe helanî, xunkar tirsê hinek esker rêke ser wan teedîb bike lewma ew welat hemî da wan vêca ew yunanên berê çend salekî bin destê me de îstîqlalîya xwe ji îktîfa nekirin rabîn ji dewleta me hin erdên dî xwest. Xunkar dîsa nedivîya esker rêke ser wan vî hin erdê dî bide wan lakîn ji xîreta mileta xwe tirsîya. Gelek esker fêkda rêkir ser hidûdê lakîn emir kir ku bila şerî nekin. Yunanîyan hidûdê xwe tecawizkirin top û tifîngên xwe davêtin ser eskerê me. Esker dihat kuştin. Ew file hinde mîrên misilmana ewên dê û babê wan bi hinde delalî mezinkirin, ewên hinde jin û zarû hêvîya wan, qurbana zilma xunkar dibîn lakîn nedikarin dest ber xwe hilnin çûnkî qumandanê wan emir nedikir. Çûnkî qomandanê wan yanî paşayê wan welê emir ji xunkar setandibîn ew paşa neşî dizanîn ku ev zilme. Lakîn ser îqbala xwe da xunkar paşê nîşan û rutba bide wan zilma xunkar emrê reîs îcra dikirin. Yunaniya gelek ji me girt, heta ku yedê eskerê xwe sebir kir dest ber xwe hilanî nîhayet Xunkar çarnacar şerê razî bîy. Hîvekî de yunan mexlûb bîy. Eman xwest eskerê me şerê de gelek neşikest, lakîn çunku bêçadir, bêcilûcaw û bêcawû bê nan û av bîn, gelek nesaxbîn heta ku pênesaxîyê çilûpênc hezar şehîd bîn, paşê ew erdê eskerê me bişûrê xwe ji yunan stendîye, xunkar dîsa da yunanî. Çunkî mirovên dor xunkar gelek rişwet ji hukmeta yunanîyan standin. Ewan jî serê vê xeberê gotin, xunkar ku heger nûva erdê me standî, nedî yunanîyan paşê dewletê dî

wê bibin ser me textê ji destê te bistînin, xunkar tîrsa hat xapandin goh da wan sûtârên dor xwe, ew erdê pê hinde xwîna şehîdan hatî stendin bilasin bêzehmet dîsa da yunanîya, hasilê paşî ewqasî zehmet zîyan we şehîda me tewfîde nedît. Sebeba vê hemî ji xerabîya reîse. Yanî heta xunkarê me Evdilhemîd e Dewleta meyê her kiçiktir her xerabtir bibe. Heger ev hal dewam bike, paşê çend salekî ne dewlet dimîn ne namûs dimîne. Çikû tirk vî halê dizanin gelek ji wan ji Îstenbolê derketine hatine welatên xerîbîya pê cerîdeyan nesîhetan didin milletên xwe, ez jî pê cerîdeyê ji kurdan re dinivîsim. Heger kurd dest ber xwe hilneynin kurd ê bikevin dest rûsyayê, dîn û namûs ji kurdan re namîne loma ez hêvî dikim mîr û axa û ‘ulema hemî bila xwe bidin hev fikrên çara serê xwe wan memûrînên zalim ji ser xwe rakîn, wan ji welatê xwe derxînin, her edabetê bixwazin, Xwedê jî ho emir dike heke ne ewên dinê û axretê mesûl in.

Mîr Mihemed Bîn Bedîr Beg,

Paşê wefata Bedîr begê lawê wî Mîr Mihemed bî hakim. Sala nehse û heştê û diduwan de wekî sultan Mûradê salis û wezîrê xwe Mistefa paşa rêkir ser Gurcîstanê û Şîrwanê. Ecema şerkî de hicûmê ser Mistefa paşa kirin, Mistefa paşa eskerê xwe ve gelek tehlîkeyê de ma bî lakîn Mîr Mihemed gelek kurda ve gîha hewara wî şerên xweş eceman re kir, çar hezar ji wan girt, wezîrê Mistefa paşa ji tehlîkeyê xelas kir lakîn ew xwe şehîd bî. Ev hîmet û xîreta Mîr Mihemed gelek qenc bî, divê her Misilman efradê cemîyeta xwe re holê be, tifaqî û mi‘awenet û xîret bikin. Çunkî seadeta mirovekî dibe mûcibê seadeta mirovê dî yê ji wî cemîyetê. Loma ew hereketa Mîr Mihemed mistehsene. Çunkî wî demê xunkarê adil bi memûrên dihatin ser Kurdistanê, ji edaletê cuda nedibîn. Lakîn heyf sed heyf ku niho halê nehewê ye. Niho xunkar zalim in memûrîn ew rê dike ser milletê xwe ji wî zalimtir in. Sira wî de mirovên xwedî esilû necabet nîne, hemî bedesl in. Hinek jî wek Ebulhudayê Qîptîyê neseb in. Xunkar bi emrê mitriba hereket dike. Ew memûrên diçin Kurdistanê ekserê ji Ebulhudayê mitrib întîxab dike de vêca amirên ku tene ser we bi întîxaba mitriba bit, mi‘înê welatê we yê zemankî hindik de xerab û perîşan bibe, heyfa min tê wan mîr û axayê kurda re ku beşa’et û xeyret meşhûrê dinyayê ne, ew niho bihîle bin emrê mitriba de mane.

Fîhristê seraxazê kitabê exbar û eş'ar û îş'ar û ne'tê elqab û asar e, di sûretê î'tîraf û îqrara bi'ecz û înkîsarê digel î'tîzara guftarê

286) Saqî! Bike camê asimanî/Raha weku rûhê cawîdanî

287) Da em bigerîn dîmaxê can ter/Yek lehze bi rahê rûhperwer

288) Saqî! Tu birêje camê mîna/Ava ku dikit demîrê bîna

289) Şadab bigêre qelbê mehzûn/medhûş bigêre 'eqlê mecnûn

290) Saqî! Bike kaseya mucewher/Wê şîrê me'sera mutehher

291) Yaqûtê muzab û le'lê seyal/Wê durrê xwoşab û xemrê tellal

292) Durdaneê xwe birêje navê/Ye'nî 'ereqa wekî gulavê

293) Dem dem bide destê meyperestan/Xelqê ku hinek ji dil didestan

294) Da camî dilan bibit miresse'/Bezma terebê bibit musenne'

295) Vî meclisa meyxuran mudamî/Mestane bike ji nûmudamî

296) Mimkin ku ji feydê bînîhayet/Yek qetre bibit li min 'înayet

297) Neş'a qedeha meya mirewweq/Kêfa 'eneba rezê birewneq

298) Ew renga biket di nefsê te'sîr/Hasil bibitin di qelbî teşwîr

299) Ye'nî bikevite canî şewqek/Hetta bigihîte qelbî zewqek

300) Te'sîrê nefes bibit ji bo min/Teşrîhê qefes bibit ji bo min

301) Tesfîyeê dil bibit me hasil/Hev deng bibim digel 'enadil

302) Murxê dilê murde bête perwaz/Bê perde bibit terrane perdaz

303) Dem şubhetê bilbilan binalit/Geh şibhetê 'enadîlan bikalit

304) Ahan ku virê bikit sehergeh/Hemware digel nesîmê hemrah

305) Sed xunceê dil ji ber bi ker bin/Sosin bizeban û baxeber bin

- 306) Bişkoj bibişkivin ji xaran/Xwûnrîz bibin dumê hezaran
- 307) Sorgul bigirîn bi eşqê şebnem/Bilbil bikenîn li rexmê hemdem
- 308) Saqî! Bide min şerabê gulgûn/Bê dengê def û sedayê qanûn
- 309) Da şehne û mihtesib nebînin/Şahî bicivin çu xem nemînin
- 310) Teşwîşi biçin ji qelbê mehzûn/Dîsan bibim ez ji nû dîgergûn
- 311) Mexmûri bibim bikirme lafan/Serxoşi bibim bikem guzafan
- 312) Bê keyf nişîm çu ez bibêjim/ Dîwane bibim durran birêjim
- 313) Bedhali bibim sirran bi der dim/Bê qali ji batinê xeber dim
- 314) Teşbîhê neyî bikim terennum/Tûtîsîfet ez bikim tekellum
- 315) Da keşîf bibin ji min keramat/Meşhûdi bibin li min meqamat
- 316) Şu'be ji meqamê dil bi awaz/Gulgeşt bikin geweşt û şehnaz
- 317) Bê deng ji xewrê dil bi aheng/Sed reng seda bidim wekî çeng
- 318) Manendê rebabê bê kemaçe/Deng bê ji defa me bê tebance
- 319) Zuhre bibihit newayê 'uşşaq/Reqqasi bibit li ewcê neh taq
- 320) Sazê dilê kul bi zîr û bem bit/Sazendeê 'îşqê Zîn Ê Mem bit
- 321) Şerha xemê dil bikim fesane/Zînê û Memî bikim behane

Metbe'a "Cem'îyeta Tifaq û Qencîya Misilmana" tebi' bîye

Wergera nivîsa osmanî bi bal tirkîya îroyîn ve:

SULTAN II. ABDULHAMÎT HAN HAZRETLERİNE DİLEKÇEMDİR

Padişahım,

Mesleğimden dolayı, Avrupa’da bulunmam nedeniyle padişaha muhalif olduğun[m]dan söz edilerek ve bazı sözler verilerek İstanbul’a davet olunuyorum. Hakettiğimin üstünde memuriyetim ve maaşım olduğu halde bazı kullarınızın baskılarından dolayı, halkın özgürlük mücadelesi için ülkeyi ve memuriyeti terketmenin önemi olmayıp İstanbul’a dönmenin başka bir olumsuzluğa meydan vermemesi için aşağıdaki gibi herşeyi açıkça arz ediyorum.

Şöyleki:

Birinci olarak, 6 ve 7 nolu gazetemde arz ettiğim şekilde soyu Halebin Han Şeyhun çingenelerine dayanan, yüksek teveccühünüzün gücüyle Büyük İslam Halifelğine katılan Ebülhuda’nın geçerli olan sözü devlet ve milleti yok etme derecesine getirmiş ve adınızı kullanarak birçok kötülükleri yapmış olduğundan, sözü edilen kişinin artık görevden alınmasıyla bu kötülüklere bir son verilmesiyle Kutsal Hilafet Makamının saldırılardan korunması.

İkinci olarak, hapishanede tutulanların üçte ikisi mazlum ve mağdurdur. Kimisi üç yıldır, kimisi de dört yıldır tutuklandığı halde niçin tutuklandığından haberi bile yoktur. Henüz mahkemeye dahi sevk edilmeyen bu mazlumların durumlarının tatkiyle görülecektir ki bu baskıları yapan İçişleri Bakanı Halil Şefik’in hakkında Kanuni işlemlerin yapılması gerekir. Ebülhuda’nın kapıcısı Şeyh Sadık hakkında dahi, tutukluların bildiği gibi, sözü edilen Şeyh Sadık, Ebülhuda’nın kötülüklerini dışarı sızdırdığı için Halil Şefik’in isteği üzerine tutuklanmış, onun gibi birçok kapıcı ve hizmetkar sudan bahanelerle ya tutuklanmış veya sürgün edilmiştir.

Üçüncü olarak, birçok zulüm yapan kullarınız hakkında istisnasız kanuni işlemlerin yapılması için izin vermeniz. Buna örnek, 8 Mayıs, saat 11.30’da, Kadıköy İskelesinde birçok haşere tarafından saldırıya uğrayan Emin Beye saldırı emrini, sizin görevlendirdiğiniz Osman Paşa’nın verdiğini bu haşere, polis

karakolunda ve onları teslim eden halkın yanında açıkça itiraf etmişlerdir. Osman Paşanın suçu sabit olup iki yıl ceza alması gerekirken, iki gün sonra albaylıktan pašalığa sizin kutsal emrinizle terfi ettirilmiştir. Bu durum, yalnız İstanbul halkının değil, bütün Avrupanın dahi nefretini kazanmış ve tepkisini çekmiştir. Sözü edilen heşeratın, bugün dahi İstanbul da olup, kardeşlerimin canlarını almak istedikleri, güvenlik güçlerine ihbar edildiği halde, önem verilmediğinden Osmanlıya hakaret oluşturduğu halde, mahkemeye çıkarılmadan bırakılmışlar.

Dördüncü olarak, bazı memuriyetle ilgililer tarafından, kutsal hilafet makamına isnad edilenlerin aslı olmadığından, bu durum Osmanlı Hilafetinin muhabetini ve azametini yoketmeyi getirdiğinden dolayı bütün Müsülmanların hukukunu bozmadan düzenlenmesini.

Beşinci olarak, mensubu olduğu şerefli Kurd kavmi dahi eğitimin faydalarından pay sahibi yapılmalıdır. Esasen, saf kanaat sahibi olduğundan, devlet bütçesine yük olmamak için meşru bir yolla geçimimin temini için bu işte bir süreden beri yayımına devam ettiğim bu “Kürdistan” gazetesinin, bağlı olduğum Yüksek Hükümetin uygun görmesiyle İstanbul’da dahi yayımlanmak üzere, imtiyazının bana verilmesini.

Padişahım,

Bu verdiğim bilgiden de anlaşılacağı gibi, takdir edersiniz ki bir çok dost ve hayır sever millet hakkında casusların ortaya attıklarıyla reva görülen baskılardan dolayı, kalıcı olan Osmanlı devleti temellerinden sarsılmaktadır. “Devlet başkanı, korumasındaki insanların can güvenliğinden sorumludur.” Hadisi Şerife göre, yapılan baskılardan yalnız yapanlar değil, doğrusu bizzat padişahın da sorumlu olduğunu sizlere bildirmem gerektiği açıktır.

PÊVEK-III

LATÎNÎZEKIRINA HEJMARA 12. A KURDISTANÊ

Eded 12

Sala ewilî

Rûper 1

Heçî vê kaxezekî
rêke ji min re, divê
ser kaxizê weha
binivîse:

“Bi xwe necl’ul-
erhûm Bedirxan Paşa
Ebdurrehman Beg”

Her car du hezar
cerîdeya ez ê rê kim
Kurdistanê, de beleş
bidin xelkê

KURDISTAN

1315

(Pazde rojan carekê têt nivîsandin cerîdeya kurdî ye)
Kürdleri tahsil-i ulûm ve fûnûna teşvik eder nasayih ve
edebiyat-ı Kürdiyeyi hâvî
(on beş günde bir neşrolunur Kürdçe gazetedir)
Gazetenin mesleğine muvafık Arabça, Türkçe, Farsîce
mektublar Kürdçeye bittercûme neşrolunur

Unvan
Genêve’de “Kürdistan”
gazetesi Sahib ve Muhariri
Bedirhan Paşazade
Abdurrahman

Her tebi’da 2000 nüsha
Kurdistan vûlat-ı izamina irsal
ve vesatetleriyle kura kasâbata
neşr-ü tamim olunacaktır

Kürdistan haricinde her yer için
senelik abone bedeli 80 kuruştur
Kürdistan dahilinde hususî
isteyenlere meccanen gönderilir

Roja Duşemê de 18 Şuwalê sene 1316 – fî 18 Şubat sene 1315 ¹²⁰

BÎSMÎLLAHÎRREHMANÎRREHÎM

Ez ê vê cerîda xwe de behsa Alayê Hemîdiye bikem. Min berî çend rojekî
cerîdekî de xwend ku hin Alayê Hemîdiye ser şuxlekî çûne Urfeyê, xelqê Urfeyê
nexwestine wan û hespên wan xwedan bikin. Kurda gotîye ku em ‘eskerê dewletê ne,
em ser şuxlê dewletê hatine hire lewma divê xwarina me, cehê hespên me, tirkên hire
bidin. Tirka dîsa guh nedaye wan, kurda jî hinek xilên(xelqên) Urfayê dane ber şîr û
tifinga.

¹²⁰ Li gora tarîxa Mîladî 3 Adar 1899

Gelî kurdino heger hun ‘eskerê dewletê ne, çire dewlet we xwedan nake. ‘Eskerên Îstanbulê dor xunkar pê goştê mirîşka tînan xwedankirin. Ma dewlet nikare we xwedan bike, ma ji we re ne fehêt e un diçin ser malê xelqê nan û cehê ji wan dixwazin. Heger un nikarin xwe xwedan bikin un çire ji mala xwe derdikevin, heger xunkar nikare we xwedan bike çire we ji welatê we radike rêdike welatên dî. ‘Eskerê Îstanbulê yê dor serawê hinde naz û ni‘em perwerde dît bî un çire nanek nikarin ji xunkar bistînin. Ji kurda re ne fehte diçin nanê xwe ji biyanîya dixwazin. Kurd bi vî halî menfûrê ‘alem dibin. Dinê hemî seyîsiya wan dike meqseda dewletê jî ew e ku divê bi wî halî li ser dinê qedr û îtibara kurda kêmbike. Mîr û axayên kurda vî halî dibînin li ser îqbalê xwe dengê xwe nakin. Lakîn ev îqbal qerîbuzzewal e. Kurd ê zemanek hindik de wê îqbalê re namûsa xwe jî wenda bikin. Ez her dibêjim, ev e dîsa tekrar dikim, ev wezîfa mihafeza kurda li ser ‘alim û began e. Yê bin destê wan me‘zûr û mu‘af in.

Wera’îş-şai yehmîz-ze’be ‘enha

Fekeyfe îzer-ru’au leha zîabun

Şa’ir vê beyta ‘erebî de dibêje şivan divê pez û dewarê xwe ji gurî mihafeze bike lakîn heger ew şivanên nav kerî de her yekê gurîk (**gurekî**) be halê wî kerîyê çawa be.

Gelî kurdino hikûmet ser miletê de wek şivanekî ye lakîn ev şivan pezê xwe mihafeze nake. Ji hemî ciya hikûmetên neyar hicûmî me dîkin her yekî her roj tiştêkî ji vî kerîyê hildîne hikûmet bi wê jî îktîfa nake memûrên we rê dike ser eqwamên vê miletê ku her yekê ji kerîkî zêdetir zerarê îras dike.

Vêca divê kurd xwe şiyariya xwe bikin heger ne, zemanek hindik de dest kurda de ne dîn dimîne ne namûs.

Xwedê te‘ala kitêba xwe de ferman kiriye (Etî‘ullahe we etî‘urresûle we ûlîl emrî mînkum) belê divê mirov Xwedê re pêxember re mutî‘ be paşê xunkar re jî mutî‘ be lakîn bi wî şertê ku xunkar adîl be. Tu cara Xwedê nabêje îta‘etê ji xunkarê zalim re bikin. Çunkî ev îta‘et mûcibê felaketa miletê dibe. ‘Edaleta Xwedê wî halê qebûl nake. Padîşahêk wê demê dibe ûlul emir heger bi ‘edalet be. Heger padîşah

zalim be divê millet wî padîşahî bi her sûretî ji ser xwe bavêje. Ev heqîqet aşîkar e alimên kurda wê heqîqetê bê şibhe fehim dikin lakîn ser du sebeba kitim dikin yek sebeb ew e ku ji kitma wê heqîqetê îqbala xwe re xizmet dikin sebeba dî jî tirs e. Lakîn este'îzûbîllahî bi her du sûret xeta zêde dikin çunkî 'alim qenc dizanin ku Xwedê te'ala gotîye (We îinne 'ezabî huwel 'ezabul elîm) ew 'alimê ji tirsê wê heqîqetê kitim dikin çawa tirsê Xwedê te'ala texetur nakin. Memûrên ser kurda hemî 'aciz in heger ewan hinek quwet û îqtîdar heye ew jî bi meskeneta kurda hasil dibe heger ne ew tu cara ew nifûzê nikarin li ser kurda îcra bikin lakîn Xwedê te'ala 'alim û qadir e. Bi yek emrê padîşaha divê hemî bê ser bin dike lewma şûna kurdên wê heqîqetê ji tirsê memûra kitim dikin bila tirsê xaliqê mitleq bînin bîra xwe û emrên wî padîşahê 'alemê îcra bikin wê bi dinê û axretê mes'ûd û kamiran bibin. Îqbal jî tehsîla riza Xwedê de ye îqbala heqîqî ew e we îlla halên dî felaket û misîbet in.

REMEZAN

Misilman hemî dizanin ku remezan jî hemî heyvên dî qedirtir e û çîqa misilman hene wê heyvê de rojî digrin û ji menhîyata îctînab dikin ez ê vê cerîdeyê de hinek behsa sera xunkar bikim vê heyvê de çî ehwalên xerîb diborin.

Dor sera xunkar mihafeza nefsa wî re sîh hezar 'esker hene wekî bî remezan her roj demê îftarê hezar 'esker ye'nî tabûrek zabitên xwe ve diçin serayê îftar dikin xunkar jî wan re selama rêdike û her yekê zêrek an du zêr hasil bi nîsbeta rutba xwe îhsan distîne. Gelî kurdino wekî we ev rêzên ha xwend halê xwe feqîriya Kurdistanê û nan û ceh xwestina 'eskerê hemîdiyeyê ji xelqê Êrfeyê bînin bîra xwe. Ev 'eskerê xunkar ser mihafeza xwe dor serayê cemi' kirî ji mîr û axayên we çêtir dixwin û werdigrin. 'Eskerê li ser hudûd singê xwe dide ber top û tîfingên dijminê jibirçîna, ji serma jî bêçadirî nesax dibin gelek jî wan xerîbî de dimirin lakîn milê dî 'eskerê serayê se'adetê de xweyan dibe çunkî ew 'esker memûrê mihafeza rûhê xunkar e. Xunkar nefsa xwe tercîhê ewqas sed hezar misilmana dike. Ev millet hemî qurbana cibanta (civata)? wî dibe. Xeyrî wî 'eskerî seraya xunkar de, mîqdara pênc hezara yawer û tîfingî û xulam û heremê wî hene. Xunkar jî metbexa xwe mala wan hemîya re xwarin rêdike û her yek jî wan her remezan sed du sed sê sed zêrekî îhsan ji xunkar distîne.

Îstanbulê de Ewqas wezîr hene her heyv çihar sed zêra distînin ewqas dewlemend in ku zanin perê xwe li kû serfbikin, me‘emafih ev wezîrên ha jî her remezan diçin îftara xunkar, xunkar paş îftarê her yekî re pênc sed zêra rêdike.

Gelî kurdino, xunkar ewqas perê zêde dide wan mirova neçiku ew xizmetekê ji milletê re dikan lakîn çiku ew mirovên dora wî mirovên welêne her new’ xizmeta dinê ji xunkarê xwe re îfa dikan, xunkar dest wan de ‘aciz maye îqtîdara wî hemî ketiye destbitirên dora wî nav hinde hezar mirovên dor wî yek asîlek necîbek nîne, hemî wek Ebûl Hûda neseb bitrin, hinde perên heyvî li çend hezar mitribkî serf dibin un dizanin ji kû tîn. Ez bêjim we, ev ew pere ne, ewê memûrên hikûmetê tîn xeracê ji we dixwazin, un dibêjin em feqîr in me pere nînin weyaxud un dibêjin berî du roja zebtîyek hat me xeraca xwe da wî me tu perê dî neman ji we ew memûrê zalimê hikûmetê rêkirî ser we dest davêje sitûyê jin û keça we pereyê sitûyê wan de hildike an sitîla we difroşe perê xeracê jê hiltîne, aha ew pereyên xunkar dide wan mitriba holê tehsîl bîne. De vêca pîçik milaheze bikin un çawa dikarin vî halî tehemul bikin ‘aciz û cahilên kurda nikarin vî halî teqdîr bikin lakîn gelî ‘ulemano un çire deng nakin un çire tehlika li dewama vî halî de kurda re nabêjin, ma un nizanin ku heger ev hal dewam bike rojekî ‘eskerê mosqof jî bê dest bavêje sitûwê jin û keçên kurda. Îhtîmal e un ji wan memûrên zalimên ser we ditirsin lewma dengê xwe dernaynin ma un nizanin ji hemîya ‘ezîmtir Xwedê heye û Xwedê te‘lîm û terbîya cahila, cahil tehmîlê ‘alima kirîye. Heger ‘alim wê wezîveyê îfa nekin Xwedê cezayên mezin we‘dkirîye we bîl‘ekis heger wî wezîfeyê îfa bikin Xwedê nî‘em û se‘adetên mezin we‘dkirîye. Çire du roj îqbala vê dinyayê wan heqîqeta li ber çavê we winda dike.

XIRQEÊ SE‘ADET

Xunkar yazdeyê remezanê diçe zîyareta xirqeyê se‘adet. Ev zîyaret salê carekê li wêrê belake mezin e. Çukî xunkar gelek ji kuştina xwe ditirse ew xwe qenc dizane ku ser seyîatên wî millet jê nerazîye. Her wî wehmê de ye ku rojeke yek ê derbekê lêbide. Lewma tu cara ji sera xwe dernakeve ser mêja roja înnê cami‘ek kiçik li pêş miqabilê sera xwe dabînakirin mêja înnê li wê eda dike lakîn ji derê serayê wî heta derê cami‘ê bîst sih gavek hene ew jî bi deh yazdeh hezar ‘eskerên sera wî de tê mihafezekirin ne mimkin e tu kesî şiklê wî bibîne wekî diçe cami‘ê heta mêja xwe

xelas dike rûh lê namîne, mitribên dor wî ji wehma wî wekî camî'ê îstîfade dikin her tirsî didîne bi wî sûretî gelek pera jê distînin weqta ku dibe yazdeyê remezanê zîyareta xirqê se'adet îcab dike lakîn xirqê se'adet dûrê serayê ye riya nîv saetekî heye. Her remezan wekî demê zîyaretê hat xunkar mecbûr e biçe wêderê. Ev zîyaret ji wî re belake mezin e. Berî deh roja karê tedareka mihafeza xwe dike gelek zêde pera îhsana dide xefyeyên xwe. Ji serayê heta mehelê xirqeyê se'adet çar pênc rê hene. Riya tê re biçe her kitim dike paşî 'ereba xwe rêkî re rêdike ew xwe rêke dî re diçe, wê rojê sih hezar 'eskerê seraya xwe hemîya li nava Îstanbulê bela dike. Ewqas tedbîr jî têra wî nakin gelek cara me'azellah te'ala qîrar da xirqetê se'adet bîne li serayê lakîn 'ulema ew hal bihîst hemî rabîn qîyamet rast kirin lewma ji tirsî xwe ji wê qerarê borî.

Gelî kurdino xunkarên berê her li nav welatên xwe de geşt û guzar dikirin, ehwalên mîletê dipirsîn guhê xwe didan şikayetê wan, se'adeta mîletê re xab û raheta xwe terkedikirin. Şerî de li pêşiya 'eskerê xwe bîn tewsî' memalek re her heyata xwe dikirin tehlikeyê de. Lakin vî Xunkarî gelek mitrib dane dore xwe ji şîretên wan der nakeve. Nefsa xwe zêdetir tu tişt ne ber çav e. Mîlet li nik wî ne haizê ehemiyet e. Lewma hingê hatî ser textê her çend salekî de ji milkê qismek dikeve dest neyara de, neyar li ser tirkî gelek xalib bîne, dest dirêjîyê li ser jinê Misilmana dikin. Berî çend rojkî li welatê Aranawida çihar mêrê File cilê jinê Misilmana wergirtin û ketin malekî Misilmana de. Çend mêrên Arnawida ew dît hemyeta wan qebûl nekir ew çihar bilgar girtin da bikujin. Qaimmeqam ew hal bihîst go arnawida wan mirova teslîmê hikûmetê bikin, hikûmet ê ceza wan bide, ewan jî î'tîmad li wê xebera qaimmeqam kir û ew mirov teslîmê hikûmetê kirin lakin qaimmeqam (Ennasu 'ela dînî milûkîhîm) newêrî wan mirova micazat bike, ew mirov berda 'efû kir. Arnawida ew hal bihîst, hemîya dest avêt çekên xwe, dora hikûmetê girtin, ew mirov ji hikûmetê xwestin lakin qaimmeqam ew çihar bilgar kirbî nav cilê 'eskerê tirkî de rêkîrbî qîşla 'eskerî arnawida yek ji wan nav bajêr dît girtin kuştin, ew hal yanî ew xîyanet û rezaleta hikûmeta me mesmû'ê hemî arnawida bî, sed hezar arnawid ji etrafê hicûmê mehelê weq'e kirin, miteserîf û qaimmeqam hemî çûn dor wan rica û îstîrham kirin, gelek îhsan û îkramên Xunkar li mîr û axayên wan re kirin, lakin arnawid sahib hemiyet û xîret in, miteserîf û îhsan û we'dên Xunkar tehqîr kirin, ji fikir û niyeta xwe neborîn, gihan mehelê weq'eyê mehel weq'e metrowêçe ye, niho li

wê derê sed hezar arawid xwey çek li ber derê hikûmetê sekinîne hersê bilgarê dî dixwazin. Aferîn sed aferîn arawida re, em ê kengê kurda jî holê xefûr û sahib hemiyet bibînin. Heger kurd hişyariya xwe nekin belayên holê ji wan re hazirin, bila mintezir bin. Mîsalek mikemel ji we re bêjim:

Cerîdeyên berê de min behsa Girîdê kirbî, eve îro girîd êk carî ji destê hikûmeta me derket, firî, Xunkar Yunanistanê bî waliyê wê derê. Berî çend rojekî walî çû resmûyê, çi qas fileyê wê derê hene walî îstiqbalkirin. Lakin ev îstqbal bi tehqîra Misilmantiyê tezyînkirin, ye'nî kum û şaşikên serê Misilmana de hiltanîn, diqetandin û davêtin erdê, nav bajêr de bi dengê bilind Misilman û pêxemberê me ('eleyhî selat û we selam) seh şetîm kirin. Hin dergên malê Mislima bi gongê şikênandin, ketin nav mala de, dest avêtin jin û zarwên wan Misilman avêtin 'erdê remezanê de şerab rêtin devê wan. Hasilî hingê Xunkarê me yê cebîn û miskîn 'eskerê xwe ji wê derê hilanî heqaret û rezaleta fileyên girîdê li Misilmana dîkin te'rîf û tewsîf nabe. Tu wicdan tehemil nakî. Lakin fesibhanellah Xunkar qet'îyen mitesîr nabe, îro Girîd hobî paş çend salek dî wîlayetin Selanîk û menastirê jî ho bibe îro ve dest pê kiriye.

Gelî kurdino ev hemî ji we re dersê îbret in, miheqeq bizanin ku heger ev meskeneta we dewam bike, ya îro fileyên girîdê li Misilmanê wê derê dîkin 'eskerê mosqof jî li we bike.

EMÎR ŞEREF ÎBNÎ XAN ABDAL

Paş Mîr Mihemed lawê mamê wî Emîr Şeref sala 1055 de bî hakimê Cezîrê.

Nav tarîxên mewcud de behsa hukamên Cezîrê heta sala hezar û pêncî û pêncê heye. Ji wê tarîxê heta zemanê Bedirxan Begî wîqû'at û esamîyeê wan neme'lûm e. Min bihîst ku Kurdistanê nik ciwanmerdekî kitêbek heye li wê kitêbê de hemî silsile mezkûre, min ew kitêb xwest, wekî ket destê min, înşaallah ez wê hingê cerîda xwe de wîqû'at û esamîyeê paş 1055ê jî zikir bikem. Ezê cerîda xwe ya paş vê de behsa babê xwe Bedirxan Begî binivîsim ev silsile hukam bi Bedirxan Begî xitam dibit, li paş wî Cezîrê tu kesî hakimî nekir.

Mebdeê meqale di ne‘ta hakimê Bohtan xuda îqbal, Emîr Zeyneddîn ibn Emîr Ebdal di gel wesfa her du hemşîreê di wî, di sahib cemal Zîn û Sîtî di bê misal.

- 362) Neqqaşê sahîfeê hikayet/Neqqadê sabîqeê riwayet
- 363) Kêşa bi vî terhî resm û ayîn/Lêda bi vî terzî zerb û tezyîn
- 364) Go: padişahêk zemanê sabîq/Rabû di hikûmeta xwe faiq
- 365) Ecnasê milîl mutî’ û munqad/Nesla ‘ereb emîrê ekrad
- 366) Textê wî Cizîr û bext-i mes‘ûd/Tali‘ qewî û meqam-i mehmûd
- 367) Rom û ‘ereb û ‘ecem di ferman/Meşhûr-i bi navê mîrê Buhtan
- 368) Abayê ‘izam û cedd û walid/Mensûb û muselselê di Xalid
- 369) Cebbarê felek ji wî hezerkar/Meslûl-i ji neslê seyfê cebbar
- 370) Zîbendeyê milk û zînê dîn bû/Navê wî emîrî Zeynîdîn bû.
- 371) Mîrî ji wî ra bi zîn muwessef/Zînet ji wî ra bi dîn mu’erref
- 372) Asarê şeca’eta wî şahî/Dagirtî ji mah-i ta bi mahî
- 373) Mahiyyetê wî medarê dinya/Şahiyyetê wî şî’arê ‘uqba
- 374) Muhtacê sexaweta wî Hatem/Mexlûbê şeca’eta wî Ristem
- 375) Hatem ji kemalê hîmmeta wey/Tomarê sexaweta xwe kir tey
- 376) ‘Eql û huner û sexa û meydan/Zebt û neseq û nizam û dîwan
- 377) Dîndarî û dewlet û diyanet/Serdarî û sewlet û siyanet
- 378) Meşhûn-i ji her yekî xezînek/Meknûn-î ji her yekî defînek
- 379) Bê ‘usr-i ji bo wî ra miyesser/Bê xusr-i ji bo wî miqedder
- 380) Enwa’ê newadir û cewahir/Elwanê nefais û zewahir
- 381) Mecmû’eê mimkinatê meqsûd/Wacib kiribûn li nik wî mewcûd

- 382) Hasil bi wî midde'a û metlûb/Wasil bi wî mişteha û mehbûb
- 383) Sehna heremê ji nazenînan/Cennet tijî bû ji hur-i 'înan
- 384) Horî wî di cennetê gelek bûn/Xilman wî di hezretê melek bûn
- 385) Lê zadeê dûdimanê dewlet/Nûbareê bositanê 'iffet
- 386) Şehzade du bûn li nik wî şahî/Xorşîd-i du bûn di (la ubalî)
- 387) Yek serwê riyazê rasitî bû/Wê navê bi rasitî Sitî bû
- 388) Ya dî ji dil û hinavê mîr bû/Wê nav-i ji nîsfê navê mîr bû
- 389) Rawî wehe gote min mi'emma/Ew hûr-i bi navê Zîn misemma
- 390) Yek zêde şîrîn ziyade mehbûb/Yek rûhê qulûb û hûrê meqlûb
- 391) Yek esmer û ya duwê zerî bû/Yek horî û ya duwê perî bû
- 392) Ew hûr û perî di bêbedel bûn/Lewra ku nûra (Lem yezel) bûn
- 393) Husna ruxê wan çu kes nedî bû/Zîra ji cemalê sermedî bû
- 394) Leb le'l û semen 'izar û gulrux/Rewneqşikenê putanê Xullux
- 395) Zulfeyn-i misalê tayê sunbul/Xeddeyn-i ji rengê rûyê sorgul
- 396) Ew sorgul û sunbulê di azad/Bişkuftî li qeddê serw û şimşad
- 397) Sorgul ji xwe da li ser rehistî/Sunbul bi xwe pêkve daheristî
- 398) Husna xetê rux ji xettê Yaqût/Çaha zeqenê ji sihrê Harût
- 399) Goya kiribû ji mişk-i bêzî/Remmalê felek nuqat-i rêzî
- 400) Xal û nuqet û beyaz û humre/Beyt û hecer û tewaf û 'umre
- 401) Ebrû ji kemanê qewsê eflak/Mujgan bi guman ji sehmê semmak

Metbe'a "Cem'iyeta Tifaq û Qenciya Misilmana" tebi' bîye

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
İNTİHAL RAPORU

Tez Başlığı Rojnameya Kurdistanê 1892-1902: Analîza Naverokê

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 151 sayfalık kısmına ilişkin 26/12./2018 tarihinde tez danışmanım tarafından *turnitin* adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dahil % 3

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça hariç

Alıntılar dahil

5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar

Açıklamalar

Mardin Artuklu Üniversitesi TURNITIN adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Ahmet KAN

Öğrenci No: 10711018

26.12.2018

Programı: Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Statüsü: Yüksek Lisans

Danışman Onayı
Onayı

A.B.D. Başkanı



T.C

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

KÜRDİSTAN GAZETESİ (1898-1902)

İÇERİK ANALİZİ

AHMET KAN

10711018

Mardin 2018